# PEYAMA kurd

Hejmar 48 | 05.08.2005

Kurdish weekly newspaper


## Heykel Mansur Şemûn:

# „Keldaniyên Kurdistanê hemû Kurd in“



Rûpel 8-9


**Prensîbên jiyanek pozîtîf** - Rûpel 2

**Hey hawar ji zilma jinan!.** Rûpel 3

**Kurd li hemberî asîmîlasyonê bê helwest in** Rûpel 4

**Serhildana rojhelata Kurdistanê** Rûpel 10

**Şaheserek ji bajarê Diyarbekirê: Xana Delîlan** Rûpel 12

**Al-Anfal „Bi navê Allah, Baas û Saddam“** Rûpel 14

**Albumî Mîkaîl Aslan o newe veciya: Miraz** Rûpel 16

**Mêr jinên çawa tercîh dikin?** Rûpel 13





D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1,70 EUR

4 196577 401503 48


# GELO KÛRSÊN ZIMANÊ KURDÎ JIBO GIRTINÊ HATIN VEKIRIN?..



Rûpel 6-7

# Sahneyek ji “Lîstika Mezin”: Sewr

Îngîlizan projeya Mustafa Kemal bi sê operasyonan biser xistin.

- Operasyona yêkê derxistina ordiya Grêkiyan (Yewnan) ji Egeyê bû.
- Operasyona didoyan, derîgirtina “Meclîsî Mebûsan” bû
- Îngilîzan derba mirinê bi Sewrê (operasyona sisêyan) lê dan

Rûpel 5

# RTÜK‘a Kurdan liser kar e

Kurd ji Tirkan fêrbûn: Kurdistan TV 24 seetan hat girtin




www.kurd.org

Kurtenûçe

## Sira zewaca bextewar: Hêviya kêm

**PK** - Di zewacê de kirina hêviyên zêde sedemê bedbextiyê ye

Sira zewaca bextewar kêm girtina hêviya ye. Pêwendî, ragihandin û efûkirin jî di riya bextewariyê de pêşniyarên giranbuha ne.

Pisporên Zanîngehên Ohio û Florida li ser 82 paran (jin û mêr) 4 salan rapirsîn kirin.

Li gora encamekê kesên ku di zewacê de ji jin an mêrê xwe hêviyên mezin dikin, di demek kurt de pergî rastiya tên û heyel şikestî dibin.

Lê kesên ku li gel hêviyên mezin jî dikarin efûbikin û xweşbîn bin di jiyana zewacê de zêde naêşin.

Serokê tîma rapirsînê Prof. James McNulty encamê weha dinirxîne: " Gava ku hêviyên mezin ji jin an mêrê we hebin bextewarî bi jêhatîbûna we ve girêdayî ye. Ger hêviyên we mezin bin û ew pêk nehatin jî hûn karibin bi xweşbînî li rewşê binerin, hûnê bextewar bimînin."

## Wê însan di bin avê de wek masiyan bin

**PK** - Ligor nûçeyek înternetê di livescience.com de mûcîdekî Îsraîlî sîstemek ku însan karibe di bin avê de wek masiyan hilmê bistîne îcad kir. Îsraîliyê bi navê Alan Îzhar-Bodner hewaya di avê de tesbît kir û mekanîzmayek afirand ku îmkana însan karibe di bin avê de bikarbîne û wek masiyan hilmê bistîne dide mirov.

Di nûçeyê de tê ragihandin ku ji dema însên dest bi avjeniyê kiriye, liser pirsa di bin avê de çawa dikare hilmê bistîne, fikirîye. Her wiha nûçe eşkere dike ku yekem nivîskarê xeyalê zanistî Jules Verne di pirtûka xwe ya bi navê „Di bin deryayan de 20 hezar ferseng" de ev mijar aniye rojevê.

## Meditasyon qeweta mejî xurt dike



**PK** - Lêkolînvanên Zanângeha Wisconsinê li Amerika ispat kirin ku meditasyon qeweta mejî xurt dike. Di lêkolînê de 10 kesên ku nû dest bi meditasyonê kirine û grûbek temenê wan li dora 45 salî û 10-50 saet meditasyon kirine hat miqayese kirin. Di encamêde hat dîtin ku di mejiyê hosteyên meditasyonê de di pêlên tîrêjên gamma de zêdebûnek mezin çêbûye. Pispor li ser wê fikrê ne ku ger bê xwestin, ev dikare mejî wek psîkolojîk jî bê guherandin.

# Prensîbên jiyanek pozîtîf

Ramana pozîtîf, şêweyek ramanêye ku tesîrek erênî li ser jiyana mirov dike; ev raman ji gotina"tu tiştekî êdî ez karibim bikim nemaye" bawer nake û rê nade fikirên ku dikare mirov bêhêvî û bêteqet bihêle.

Hûn mirovekî/a bextewar in? Eger hûn dibêjin "na" divê ku hûn pêşniyarên li jêr bixwînin.

Divê hûn zanibin ku hêza peyvên ji devê we derdikeve ji texmîna we bêtir bi qewet in. Bi hilbijartina peyvên rast hûn baweriya xwe ya bi xwe xuya dikin û dihêlin ku kesên li himber we, wek ku hûn dixwazin, we nas bikin. Gava ku hûn diaxifin eger peyvên xirab hilbijêrin wê gavê hûnê bibin sebeb ku mirov we weha nasbike û hîn di destpêkê de di derê wan de li himber we hikmênpêşîn biafire. Biceribînin. Her sibe gava hûn diçin ber neynikê çi ji xwe re dibêjin? Niha dev ji xwendina Peyama Kurd berdin û biçin ber neynikê li xwe binêrin û sê peyvên bê bîra we binivîsînin. Sê peyvên ku we di derheqa xwe de nivîsansin nirxandina we bi xwe ye. We xwe bi evînî, birêzî û xweşbînî binav kir an heqaret li xwe kir û xwe piçûk kir? Ger bersîva we negatîv be carek din biceribînin. Vê carê xwe ji bîr bikin û bifikirin ku hevalekî/a we yî/ya hûn bêtir jê hez dikin li himber we ye.



Bi heval/a xwe re hûn çawa diaxifin weha bi xwe re bipeyivin û peyvên ku ew ji we re muhîm e û di jiyana we de xwedî cîhekî taybetiye bikar bînin. Hûn ê xwe çêtir his bikin.

### Ne şexsî bin!

Tenê yek kes we ji nêzîk de û ji herkesî bêtir nas dike; ew kes hûn bi xwe ne. Ji ber vê yekê rexneyên ji aliyê kesên din li we tên kirin zêde cidî negirin. Tenê hûn dikarin xwe bi awayekî rast îfade bikin ku derdor we rast fêm bike.

### Biceribînin.

Dev ji, bi pîvanên kesên din darizandina xwe, berdin. Berê 5 taybetiyên xwe yên pozîtîf binivîsînin. Wek nimûne ez nivîskarekî baş im, dê/bavekî baş im, di karê xwe de biberketî me, xweş futbolê dileyizim.. hwd.

Em ferz bikin ku we nivîsand ku futbolîstekî baş in. Lê antrenorê we weha nafikire û zêde li ser we hesabê xwe nake. Bila baweriya we neşikê, ev hilbijartin natê wateya ku hûn futbolîstekî nebaş in. Tenê antrenorê we weha difikire û dibe ku neheq be. Loma gava ku li gora we neheqiyek li we hat kirin bêhêvî û bihêrs nekevin; ji karê xwe sar nebin û çêtir û zêdetir bixebitin.

### Her ya çêtirîn bikin!

Hewl bidin ku di her şert û mercan de ya çêtirîn bikin û piştre encam çi dibe bila bibe qet poşman nebin. Ger hûn ji sedî 100 xwe bidin karekî, bila tu gumana we tunebe ku hûnê di encamê de biserkevin.

Biceribînin. Ya di futbolê de ya di jiyana we ya evîndariyê de ferq nake. Ji xwe bipirsin: "Çi ji destê min hat min kir?" Ger bersîva we "erê" be hewl bidin ku hîn jî çêtir bikin. Di kîja mijarê de hûn dixwazin biserkevin ji xwe re planeke bi sê merhale çêkin.

Hedefên we çiqasî mezin bin hûnê bibînin ku qeweta we jî wê her zêde be. Wê ev jî bibe sebeb ku hûn zewqê ji karê xwe bistînin. Çimkî wê gavê him hûnê biserkevin û him jî xwe bi kesî re miqeyese nekin. Ji bîrnekin ku berberê we yê herî mezin hûn bi xwe ne.

# Li elametên diyabetê miqate bin

**PK** - Nexweşiya şekir li dinyê sal bi sal zêdetir dibe. Ji her sê kesan nexweşek bê ku hay ji cidiyeta nexweşiya wî hebe wek ku tu tişteq neqewimîbe jiyana xwe didomîne.

Glîkoza (şekir) ku bi miqtarek zêde di damarên nexweşên diyabetê de heye dibe sedema hişkiya damar û nahêle ku xwîn qasî pêwîste biçe qelb, ev jî dibe sedema qrîza qelb û mirinên kardiyak ku bi derbekê tê.

Li gel vê telûkê ji her sê nexweşan yek kes bê ku zanibe di bin rîskek wiha de ye jiyana xwe didomîne.

### Nexweşiya şekir çiye?

Diyabet, ango bi nave xwe yê din nexweşiya şekir, ji ber ku pankreas têra xwe insulîn çênake an ji ber ku insulin ji aliyê bedena mirov qasî ku



pêwîste bikar nayê anîn derdikeve hole. Dr. Oxana Palajchenko elametên nexweşiya şekir û nikteyên ku dive nexweşên şekir lê miqatebin wiha bi rêz dike.

### Elametên nexweşiya şekir

*Gelekî û zû birçîbûn*
*Bi awayekî zêde xwestika*

*Di dest û lingan de xur*

### Qaîdeyên divê lê bên miqatekirin

Her sal çavên xwe bidin kontrolkirin

Di her sê mehan carekê de tahlîla îdrara xwe bikin

Di her şeş mehan carekê de miayeneya qelb û damar bibin

Ger nexweşiyên sinir bi we re peyda bûbe, serî li dixtorekî bidin

Dest û lingên xwe kontrol bikin û ger nexweşiyek peyda bû serî li dermatologekî bibin

Ger tu du canî be (bi halekî be) an dixwaze bibe bi dixtorê xwe re bişewire

Cigarê nekişînin û ji alkolê dûr bikevin

Ger piştî hemû tedbîran tu hizûrê nabîne, serî li psîkologekî bide.

*xwarina şêraniyê*
*Kilo stendin û gelek av vexwarin*
*Zuhabûna dev*
*Zû westandin*
*Ji nişka ve jar bûn (kilo dan)*
*Bilindbûna tansiyonê*
*Bi zahmetî kewandina birînên çerm*
*Zêde derketina destavê*
*Zuhabûna çerm*

Xwedî û Damezrênerê Rojnamevê: Ednan Zeki Berpirsiyar: Fadıl Özçelik, Hêvidar Zaxo, Loqman Baran Ayaz, Veysi Dê Berdevk Mamoste, Sînor, Mistefa Çewtayê, Nizar Peyama Kurd Verlag Car, Şerbilkan Koçer, Silêmanê Aldirmaz, Pîrozmal, Rêgan Dêrik, Vîndî Favgo

Navnîşan: Peyama Kurd Tyrnich-Mann-Str. 22, 53111 Bonn / Germany

Fax: +49 (0228) 18 00 634 +49 (0228) 18 00 655 Faks: +49 (0228) 18 00 656

www.peyama-kurd.com info@peyama-kurd.com

Çêbû: Peyama Kurd ewe rojnameyê dişêne, ku nivîsên jê re yên şandin, kurt bike. Ew ji alîyê rêzimên û nasnivîsîne de di nirxandinê de bi serbestiyeke berfireh de azad e. Berhemên ku ji bo Peyama Kurdê yên şandin heke li cihekî din hatibin weşandin, nayên çapkirin.

# Li Amedê besteniya sorkirî



PK - Li Amedê besteniyek (Dondurma) ku di zeyta 200 dereceyî de tê sor kirin hat çêkirin.

Di kelkela germa havînê de besteniya di zeytê de sorkirî bala Amediyan dikşîne. Ligor agahdariyan tahma vê besteniya nû li xweşiya Amedîyan çûye.

Gava bestenî sar e hinek gûzên Hindî û piştre sosek taybetî lê dibe ku bi vê sosê helandina bestenî tê astengkirin. Besteniya ku 5 deqîqeyan di nav zeyta sor de tê sorkirin û bi sosek din tê xwarin.

Mûcidê vê besteniyê xwediya Gurme Restoran Selma Sevinc vê sira xwe bi kesî re parve nake û dibêje: "Gava em ji mişteriyên xwe yên ku ji besteniya me ne agahdarin û dipirsin, 'Hûn besteniyek sorkirî lê sar naxwazin?' şaş dimînin."

Selma Sevinc eşkere dike ku divê besteniya wê di nav 3 deqiqeyan de bê xwarin.

## Li Amedê kişandina esrarê daket kolanan



PK - Li Kurdistana Bakur kirîn-firotin û kişandina esrarê êdî ji dizîtiyê derket. Bi taybetî li Amedê wek bajarekî kozmopolît ku ji gelek herêman her cûr mirov lê dijî esrar êdî li park û kolanan tê bidestxistin.

Li Amedê, Ruhayê, Mêrdînê, Batman û Wanê û li gelek herêmên mayin temenê esrarkêşan daket heta 12-15 salan. Esrarkişandina zarokekî 12-15 salî kesî şaş nake.

Zarok tenê bi kişandina esrarê jî namînin. Wexta bê pere dimînin ya diziyê dikin ya çentê jinan ji piyên wan direvînin.

Ligel fihûşê kişandina madeyên narkotîkê jî roj bi roj li Kurdistana bakur zêde dibe û wek birînek civakî girstir dibe.

## Îskeleta pisîka li Wanê 2 hezar û 700 saliye

PK - Li Wanê îskeleta pisîka ku sala buhurî li navenda aboriya Qraliyeta Ûrartu Kela Anzafê de hat dîtin 2 hezar û 700 salî derket.

Arkeologên Enstîtuya Arkeolojî ya Avrasya girêdayî Zanîngeha Istenbûlê bi serokatiya Prof. Dr. Oktay Belli ev 15 sale ku li kelaya berî zayînê bi 800 salî ji aliyê Qralê Ûrartû Menua ve hatiye çêkirin kolanan (vedan) dikin.

Prof. Belli ragihand ku di kolanên xwe de heta nuha gelek çekên parastinê û amûretên (malzeme) çandiniyê derxistine û sala bihurî jî 4 metre di bin erdê de îskeletek pisîkekê derxistine.

Bellî eşkere kir ku piştî vekolînê diyar bûye ku temenê îskeletê 2 hezar û 700 sal e.

# Hey hawar ji zilma jinan!..

*Zilma jinan mêr gîhandin hev*

Dinya ser û bin dibe. Heta nuha jinên ji mêr, bav û birayên xwe zilm didîn gazind dikirin û rêxistin damezirandin.

Li Wanê li dorî 300 mêrên ku ji jinên xwe tahdeya madî û manewî dibînin gihaştin hevdu û jibo parastina mafên xwe biryara damezirandina komeleyek mêrên mexdûrên jinên xwe stendin.

Bi rêberiya Borsaya ticaretê ya Wanê (BTW) 300 mêr hewl didin ku saziyek mêrên mexdûrên jinên xwe damezirînin.

Jiber vê hewldana xwe serokê BTWê Feridun Irak ragihand ku armanca wan ne berhevdana jin û mêran e, lê ew dixwazin ku pirsgirêkan çareser bikin.

Komelaya mêrên tahdeyê ji destê jinên xwe dikşînin wê di meha Îlonê de vebe.

# Ji Belediya Wêranşarê bultenek bi Kurdî



PK - Belediya Wêranşarê bultenek metane bi Kurdî û Tirkî diweşîne.

Serokê Belediyê Emrullah Cin ragihand ku li Wêranşarê ji sedî 80 nifûsê bi Kurdî diaxifin û jiber vê jî wan pêwist dîne ku bultena wan bi Kurdî jî be ku gel bêtir di derbarê xebatên wan de xwedî agahdar bin.

Wek ku tê zanîn Emrullah Cin ev cara duyeme ku ji lîsteya DEHAPê tê hilbijartin.

# Di televîzyonê de reklamên bi Kurdî

PK - Li Amedê Televîzyona Gün TV dest bi reklamên bi zimanê Kurdî kir.

Reklama dikanek „Romans" ku cilan bi xwe didrû û bi xwe difroşe weha ye: „Her cure qumaş lewendî, şal û şapikên xerzanî, cil û bergên folklorik, werin em we bixemilînin'

Gün TV berê jî reklama heftenameyekê û pirtûkekê bi Kurdî kiribû.

Berpirsê giştî yê Gün TV Cemal Dogan eşkere kir ku ligor daxwazan ewê weşandina reklamên bi Kurdî her berdewam bikin.



**Panaroma**

**Dilbixwîn Dara**

# Merheba

Berî vê bi çend rojan min kak Ahmet Zeki Okçuoglu li NAVENDê dît. Ez nû ji Kurdistanê hatibûm û min dîtin û têbiniyên xwe dihanîn ziman. Kak Ahmet gazin ji min kirin û got: "Tu çima ji Peyama Kurd re nanivisînî? Em dixwazin di rûpelên rojnameyê de nivîsên te, navê te bibînin..."

Bi serê ziman be jî min sozek da.

Li ser daxwaza kak Ahmet û li gora derfetên xwe her cara ku îmkan çêbûn ezê hewl bidim binivisînim.

Ev demeke ez ji rojname, kovar û weşanên din yên kurdî re nanivisînim. AVESTA saatên zêde ji dema min dibe. Min pir bi xwe re mijûl dike. Ev pênc salin min ew weke barekî, li ser milê xwe hilgirtiye û birêve dibim. Hêvî dikim bi vê xebatê me sûdek li rojnamegeriya kurdî kiribe.

Ez Peyama Kurd jî weke rojnameya xwe dibînim. Her roja înê li pêşiya deriyê rojnamefiroşanim û wê dikirim, dixwînim û heya bi xaçepirsan çareser dikim û ji bîr nakim ku çavekî li Fatê jî bigerînim. Ji hejmara yekê de wê dişopînim.

Li gora ku ez dibînim, Peyama Kurd qels û xizan dest pê kir, hema bêjin kesek bi xwe nehesand, weke ku weşaneke korsan be. Bi dehan rojnamevan û nivîskarên Kurd li Ewropa hene, hem jî yên ku bi kurdî dinivisînin û bi hesreta derxistina rojnameyeke bi kurdî ne, lê belê me bi gavavêtina yekemîn ya rojnameyê re ew kes nedîtin, ez jî di nav de.

Rojname bi rojnamevan, nivîskar û peyamnêrên xwe rojname ye, ev hîm tune bin, rojname kulek dimîne. Min bi xwe gelek caran ji xwe dipirsî, „em çima di vê rojnameyê de tune ne? Em, ew kesên ku bi rojan gazî dikin: Haho... Hawar... ka rojnameyeke kurdî bidin me..!"

Di navbera me û xwedî û birêvebirên Peyama Kurd de germahiyek nebû munasebet.

Û wê destpêka bêdeng nikaribû rewşenbîr û rojnamevanên Kurd li dora Peyama Kurd bicivîne, ji ber vê yekê heya demekê ew weke keseki kulek li ser lingekî û li aliyeki meşiya.

Bêyî ku ji bîr bikim, hatina kak Ahmet Zeki Okçuoglu ji bo rojnameyê, û edîtoriya wî hêviyekê dide mirov, ku wê ev rojname bikaribe gavên xurt ber bi weşaneke serbixwe û profesyonel ve bavêje, eger ku em rojnamevanên Kurd û xwediyên Peyama Kurd piştgiriya wî bikin. Li gora ku ez dibihîsim û dibînim ew bi îdîayeke mezin hatiye ser vî karî û ewê hemû derfet û taqetên xwe yên birêvebirinê ji bo pêşxistina vê rojnameyê seferber bike. Jixwe ji roja ku ew hatiye mirov guhertineke baş di naverok, rûpelsazî û manşêtên wê de dibîne.

Bi hêviya ku Peyama Kurd bikaribe roleke hîn aktîv û çalak di rêveçûna rojnamegeriya kurdî de bilîze û bixêrhatina rojnamevan û nivîskarên ku dûr mane bike.

Min xwest bi riya vê nivîsê merhebayekê li we bikim.

Heya careke din



Nejdet Buldan

# MIN ÇI DÎT Û ÇI NEDÎT??

Eve yanzde salin ez li Elmanya me. Min pasaportek ya penaberan (iltica) yê hey. Bi gotineke dî bê welatim û bê nasname. Li 26 welatan gerîyam. Li parlamento, dêr, rojname, wezaret, zanîngeh, televîzyon, radîyo, panel, konferans û sendîkayan da axaftvan bûm. Li meş, hevdîtin, komel, geşt û seyran, behî û dawetan da beşdarvan....

Heke rojekê yêkî/ê pirsa min kir ku li van welat û hinde salan da te çi dît, bersiva min dê çi bit? An jî ez bi xwe pirsa xwe bikem ka min çi dît, çi ne dît? Ez neşêm bêjim, gelek dirêje. Belê ez dikarim qala hindek tiştên min nedîtî bikem. An jî, vêderê û cîhê ez jê hatî (bakurê Kurdistanê û Tirkîyê) bideme ber hev, miqayese bikem.

Ne bi gotin, ne bi nivîskî gef, heqaret û tehdîtên dewletê û dewletan min nedîtin. Belê, kes û sazîyên liser navê Kurdan, bi hemu şêweyan dilê xwe li min hîn kirin.

Heta niha, ji lêsuwarbûn û jêderkeftina balefiran zêdetir, kesî nasname ji min nexwestîye.

Çi caran polês nehatine mala min. Tenê carekê dema hêzeke Kurdan gef li min kir, du polêsên sivîl hatin gotine min em dixwazîn parastina te bikeyn, ew jî min qebûl nekir.

Nêzîk heşt salanin ez, li wan welatane erebê dihajom, kesî pirsa ehlîyetê ji min nekirîye.

Zarokên min diçûne dibistanan û hêj jî diçin. Kesî ji wan sirûda serxwebûna vî welatî nexwendîye û nizanin.

Di cure cure babetên sîpor û pêşbirkan da, wekî taxim û wekî kesên hemwelatîyên Elmanya, serkeftin çêdibin. Lê, min nedîtîye û ne bîhîstîye di pîrozbahîyan da, kesek hatîye kuştin an jî birîndar kirin.

Ma vê dewletê, çi qehreman an jî sazumankarên xwe ninin? Bêguman, dîroka wana bi şer, bi damezirandina serxwebûnê teji ye. Ji edepxaneyan heta meqamên bilind, wêne û peykerên sazûmankarên vê dewletê min nedîtine. (Li hindek meydan û mûzexane xariç)

Gelo ew dewlete bê leşker e? Na, xwudana hêzek gelek xurt û teknîkek bilind e. Belê li sûkan, rojname û di televîzyonan da nînin. Desthilatîya dewletê danînin. Ji serokwezîr heta hemwelatîyan, min nebîhîstîye kesî pesna leşkerê xwe daye.

Ma Serokkomar, serokwezîr, wezir an jî generalên wana qet nagerin? Sedan sed ew jî digerin, ji miqam û baregahên xwe derdikevin. Belê min nedîtîye, jibo wan rê bêne girtin, wîte wîta sirenên erebeyên ewlekerîya wan nehatine guhê min.

Ma ev welate bê pez, bê beraz, bê mirîşk, bê hesp û mahîn, bê çêl û golik e?. Bêguman ne tenê ew heyvanene, gelek cins heywanên dî jî hene. Belê, hemu li govên rêk û pêk da, di bin bandora bispor û beytaran da ne. Tenê se, mişk û kêtikên (pişîk) perwerde kirî mirov dikare bibînit.

Dibêjin tenê li Elmanya 40 milyon erebeyên cure cure hene. Belê qorne lêdan, dûte dût çi nîn e.

Mirov dikare van pirsane dirêj biket. Belê hewce nîn e.

# Kurd li hemberî asîmîlasyonê bê helwest in

**Fadil Özçelik**

Di 3ê mehê de rojnameya Zaman ji Anqerê bi îmzeya Ibrahim Asalioglu nûçeyek ‚balkêş' weşand.

Ligor vê nûçeyê Wezareta Perwerdeya Milî ya Tirkiyê li Kurdistanê dest bi projeya dibistanên guhêzbar (portatîf, seyar) dike.

Bi vê projeyê dewleta Tirk dixwaze gav bi gav bide dû zarokên Kurdan yên ku ji gundên wan derxistibû, derdixe û berê wan dide bajaran.

Projeya dibistanên guhêzbar wê îsal destpêbike û sal bi sal ligor pêwistiyan zêde bibe.

Jibo sala 2005-2006an dibistanên guhêzbar wê li bajarên Kurdistanê an li çend bajarên rojavayê Tirkiyê li taxên Kurdan bên damezirandin.

Heta nuha liser van bajaran biryar hatiye stendin: Diyarbekir, Mersin, Adana, Antep, Urfa, Batman, Wan, Istenbûl, Îzmîr, Antalya û Kocaelî.

Serokê daîreya tesîsan Prof. Dr. Abdussamet Arslan armanca vê projeyê weha dinirxîne: „Em li gundan dibistanan çêdikin lê gundî koç dikin. Dibistana wir vala dimîne. Li derek din gundî vedigerin gundê xwe lê li wir dibistan nîne. Bi vê projeyê hemwelatî biçe ku wê dibistana wî jî pê re here."

Diyare ku dewleta Tirk ne ku tenê haziriya beşdarbûna Yekitiya Ewrûpa bike, ew projeyên çûyina ezmanan jî bike dev ji siyaseta xwe ya windakirina Kurdan bernade.

Di vê mijarê de siyaseta Tirkan ya 100 sal berê û ya piştî 100 salan eynî wek xwe maye.

Ji nuha û 100 sal berê jibo Alayên Hemîdiye Evdilhemîd weha digot: "Li Rûmelî û bi taybetî li Enedoliyê ferze ku em Tirkayetiyê bi qewet bikin û berî her tiştî jî şert e ku em Kurdên di nava xwe de bistirînin û ji xwe re bikin mal."

Ku ev axaftina padîşahê Osmanî nêt û armanca Dibîstanên Eşîran ku hema piştî sazkirina alayên Hemîdiye hatin damezirandin jî eşkere dike.

Di mektebên êşîretan de yek ji dirûşmeya ku bêtir bi ciwanên Kurd re didan





qîrandin, "Padîşahê min tu her bijî" bû.

Û îro bi dibistanên xwe yên guhêzbar bi bihayiya îhlalkirina norm û pîvanên hiqûqî, mirovî û ehlaqî hêvî dike ku zarokên Kurd yên ji dayik dibe, bi Kurdî diaxife, bi Kurdî xewn û heyalan dibîne bi dirûşmeyên, "Ez Tirkim" perçe perçe bike.

## Zanîngeha Firoke

Berî sala 1917an Rûsyaya Çar, di salên şerê cîhanê yê duyem de faşîstên Alman û piştre vê carê Rûsên Komunîst jiyan li Polonya kirin jehr.

Dagirkirin û înkara salên dirêj Poloniyên ku bi welatparêziya xwe tên naskirin fêrî dîtina rê û metodên xwe parastinê kirin.

Zanîngeha firoke mûcîdek mûcîzeyî bû.

Polonî jibo xwe ji xezeba Rûsan biparêzin derzên xwe her carê li malek cuda dikirin. Navê "firandinê" jiber vê yekê ye.

Di sinifên zanîngeha ku ji malekê difiriya maleke din mamosteyên zanîngehan bê ku pereyekî bigirin ciwanên welatê xwe perwerde dikirin. Jiber netêrkirina mamosteyan xwendevanên sinifên bilind jî diketin dersên sinifên ji xwe jêrtir û wan jî li wir mamostetî dikirin.

Ev sîstema ku mirov ji xwe re heyran dihêle encama îradeya welatparêziya Poloniyan bû.

Û berdêla xwendinê jî girtin, lêdan, êşkence û sirgûnkirina Sîbîryayê bû. Rûsyaya çar ev kar cidî distend. Çimkî jibo wan pirtûkek bi zimanê Polonî di çenteyê keçik an lawikekî ciwan de ji berxwedarekî çekdar bêtir bi telûke bû.

Ji sedî 70 xwendevanên Zanîngeha firoke keçik bûn. Ji van 3 hezar kesan di navbera salên 1883-1905an de ji fizîkê heta dîrokê dîplome wergirtin.

Yek ji van xwendevanan Marie Curie bû ango jina ku li dinyê cara yekem xelata Nobelê wergirt. Marie Curie di derbarê rojên xwendevaniya xwe ya bin erdê û Zanîngeha difirî de weha digot: "Koma ku min di nav de cîh digirt baş dizanîbû ku pêşeroja welatê me bi hewldanên me yên jibo bilindkirina sewiyeya entellektuelî û qeweta moralê ve girêdayî ye. Her yekê/î ji me wê çi çêtir zanîbû fêrî yên din bikira."

Di şerê yekem yê cîhanî de dagirkerên Rûs muhtacî alîkarîya Poloniya ma. Jiber vê yekê di sala 1916an de destûr da ku Zanîngeha firoke di çarçoveya çanda Polonî de perwerdeyiya xwe berdewam bike.

Polonya di 11ê Çiriya paşîn a 1918an de serxwebûna xwe îlan kir.

Gava di sala 1939an de Polonya ji aliyê faşîstên Alman ve hat dagirkirin Zanîngeha firoke xwe carek din bera bin erdê da. Polonî êdî bêtir xwedî tecrube bûn, bi çend salekî be jî tahma serxebûnê stendibûn û qet ne bi nêtbûn ku piştî Rûsan vê carê jî welatê xwe ji Almanan re bikin parî.

Di sala 1942an de, di bin zilma faşîstan de tam 1.5 milyon zarokên Polonî bi dizî xwendina xwe dom dikirin. Di sala 1944an de hejmara xwendevanên Zanîngeha difirî 10 hezar bû.

Di van salên dijwar de yek ji xwendevanên ku di odeyên dizî de nasnameya xwe ya milî ango Polonî diparast Papa John Paul bû.

Kurd û asimilasyon

Belê berî 100 salan û piştî 100 salan siyaseta Tirkîzekirinê her li dijî gelê Kurd hat meşandin. Carna ev siyaset bi dibistanên eşîran, carna bi dibistanên herêmî yên qijleyî (yatili bolge okulu) û carna bi dibîstanên guhêzbar ve hat meşandin.

Gelo siyaset û dezgehên ku bi îdiayên guherandina jiyana gelê Kurd di alanan de xuya dikin li dijî asîmîlasyonê heta nuha kîjan çare afirandine?

# Sahneyek ji "Lîstika Mezin": Sewr

**Ahmed Zeki Okçuoğlu**

Diroka tirkan li ser derewan hatiye avakirin. Tê gotin ku piştî şerê cîhanê yê 1. rojavayiyan xwestin bi peymana Sewrê hebûna tirkan ji holê rakin. Lê neteweparêzên tirkan li Anatoliyayê di bin serokatiya Mustafa Kemal de bûn yek û li dijî rojavayiyan derketin û ew jî bêgav man ku Sewrê şûn ve bikşînin û peymana Lozanê bipejirînin.

Lê rastiyên dîrokê piştgiriya vê îddîayê nakin. Peymana Mondrosê yek ji van rastiyên dirokê ye. Dema meriv peymana Mondrosê dixwîne, dibîne ku çarçoveya Lozanê di vê peymanê de hatiye danîn. Bi ser de jî, Mondros bi darêzorê(!) bi îngîlizan nehatiye pejirandin.

Dema ku îngîlîzan peymana Mondrosê pejirandibûn, Osmanî/Tirkan bêqeyd û şert xwe teslîmî Îngîlizan kiribûn. Bi gotineke din 'tirkan' Mondros nedabûn ber îngîlîzan, lê îngîlîzan ew dabûn ber 'tirkan'. Heta, Osmanî/tirk li benda peymanek ji wê xirabtir jî bûn. Dema Îngîlîzan peymana Mondrosê dabûn ber wan, 'tirk' mabûn heyirî. Ne bi tenê Xelîfe, Mustafa Kemal jî pesna peymanê dida. Mustafa Kemal bi vê jî nedima ew wekî mucîzeyekê nîşan dida. Lê jibo ku kemalî piştre Lozanê wekî serketineke xwe nîşan bidin, ew bi tenê wek peymaneke agirbestê nîşan dan.

Heke em vegerin serî, dikarin bêjin ku piştî şerê cîhanê yê yekê, ne du lê belê sê peyman hatin îmzekirin: Mondros, Sewr û Lozan. İngîliz bi Sewrê ji Mondrosê dûr ketin. Lê bi Lozanê cardin vegeriyan ser Mondrosê.

İngîliz çima ji Mondrosê gav şunve avêtin û Sewr dan ber Osmaniyan/Tirkan?.. Bersîva vê pirsê jî ev e:

Rêvebiriya dewleta Osmanî di destê du hêzan de bû: Seray û îttîhadî. Kemalî serayê wek hevkarê îngîlîzan nîşan didin, lê ev ne rast e. İngîliz li dijî herduyan jî bûn. Îngîlîzan dixwest wekî hemû xanedaniyên Dewletên Îtilafê (Elmaniya, Nemsa, Macarîstan, Bulgarîstan), xanedaniya Osmanî jî rakin û rêvebiriya wan bikin komarî (cumhûrî). Ji bilî vê yekê, padîşahê Osmanî di heman demî de Xelîfe bû û di dema şer de (derveyî Elmanan) fermana kuştina xiristiyanan derxistibû.

Digel vê, Îngîlîz ne li dijî neteweparêziya tirkan/ittihadiyan bûn, jiber ku serokatiya ittihadiyan di şer de hevkariya Elmanan kiribû, rojavayiyan dixwestin serokatiya îttîhadîyan biguhêrin û alîgirên xwe têxin ciyê wan. Berendamê wan jî Mustafa Kemal bû. (Heke di cîhana îslamî de jibo xelîfetiyê berxwedanek çêbana wê Îngîlîzan Mustafa Kemal bikirana xelîfe jî).


Lord Curzon

Dîroka tirkan berovajî vê yekê binivîse jî dîsa rastiyên dîrokê nîşan didin ku Mustafa Kemal ne jibo dijberiya îngîlizan çûbû Kurdistanê û Anatolyayê, ew ji bo pêkanîna wê planê ji aliyê îngîlîzan ve ji bo wan deran hatibû şandin. Lê pêkanîna projeyê ne ewqas hêsan bû.

Xanedaniya Osmanî (Seray) dewlet avakiribû û xudanê dewletê bû. Di heman demê de xelîfetiya dînê îslamê jî di destê padîşah de bû. Hêza serokatiya îttihadiyan jî ji Serayê ne kêmtir bû. Neteweparêziya tirkan û Partiya İttihadê bi destê wan hatibû afirandin. Îngîlizan projeya Mustafa Kemal bi sê operasyonan biser xistin.

Operasyona yêkê derxistina ordiya Grêkiyan (Yewnan) ji Egeyê bû. Qaşo Grêkiyan Ege dagir kiribûn û qaşo tirk jî li dijî dagirkeriyê şerê rizgariyê dabûn. Lê di rastiya xwe de ne dagirkerek hebû ne jî şerekî netewî. Her tişt senaryoya Îngîlîzan bû. Dema Mustafa Kemal wekî xelaskerekî ber bi Samsûnê ve hatibû birêkirin, artêşa Grêkiyan jî pê li Îzmîrê kiribû.

Bi vê listika leşkerî du encam hatin bidestxistin: Ya yekê, berê neteweparêziya tirkan ji rojavayiyan ber bi Grêkiyan ve hat guhertin. Ya didoyan, jibo ku neteweparêzên tirkan li dora Mustafa Kemal kombikin, dijminek netewî yê sexte hat çêkirin.

Hinek dîroknivîs dibêjin, Grêkî ji aliyê îngîlîzan ve hatin xapandin, lê ev jî ne rast e. Grêkiyan, li beramberî lîztikek leşkerî, 12 giravê Egeyê bidest xistin.

Operasyona didoyan, derîgirtina "Meclîsî Mebûsan" bû. Di derîgirtina Meclîsî Mebûsan de Îngîlizan îttîhadiyên tund bendî kirin û ew sirgûnî girava Maltayê kirin. Yên ku dizanibûn ku astengiyan li ber Mustafa Kemal dernaxînin dest nedan wan û jibo ku herin Angora (Ankara) rê liber wan vekirî hiştin. Bi saya vê yekê jî Mustafa Kemal li Angorayê Meclîs vekir û meşrûîyeta rêvebiriya dewletê ji destê Îstenbolê derket, ket destê Angorayê.

Îngilîzan derba mirinê bi Sewrê (operasyona sisiyan) lê dan. Dîroka tirkan û rojavayiyan Padîşah û hikûmeta wî wek destxetkirê pelga îxanetê (peymana Sewrê) û Mustafa Kemal jî wek destxetkirê pelga welatparêziyê (peymana Lozanê) binav dikin. Piştî Lozanê, Padişah û Xelîfe Vahdeddîn (ku heta berî çend salan jî kesî newêrî bû destê xwe dirêjî mûyê wî bike) bi keştiyeke îngîlizan bi zorê canê xwe wekî xayinekî xilas kir.

"Mana Sewrê ji bo Kurdan çi ye?" em bersîva vê pirsê jî bihêlin ji bo nivîsa xwe ya hefta pêşiya me.


Sultan Vahdettin


Kemal Atatürk

www.arsiv.org



**birayetî**

**Bayram Ayaz**

## PDK-Bakur: Çil sal Kurdayetî -IV-

# PDK-Bakur divê çi bike?

Destpêkê çend gotin liser rewşa tevgera welatparêz a li bakurê welatê me...

Van bîst salên dawî mixabin Pkkê mohra xwe li tevgera bakur da. Hêzên dî margînal man, tesîra wan kêm bû.

A. Öcalan bi hêviyên Kurdan leyizt û liser tevgera Kurd bazirganî kir. Berî girtina xwe hevaltiya hin dewletên herêmî yên din dikir, piştî girtinê bi temamî xwe spart dewleta Tirk û bû hevkarê generalên Kemalîst. Hin hêzên herêmî û navnetewî ji şerê pkkê bi têra xwe îstîfadê wergirtin. Lê tevgera Kurd û gel ji kiryarên Öcalan zerar û ziyanek mezin dît. Tiştê herî xerab di nav Kurdan de bêhêvîtî peyda bû. Dewleta Tirk û Kurdên imralicî îro rewşa "kelaxekî" bi serê tevgera Kurd anîne. Ew bi rêkûpêk êrîşê Kurdewariyê û Kurdistanîtiyê dikin. Hevkariya Öcalan ligel dewleta Tirk di singê tevgera Kurd de xencerek e. Destikê vê xencerê jî di nav lepên generalên Tirk de ye.

Dema ku em van nêrînan dinivîsin, carna hinek Kurd xwe aciz dikin. Hinek jî dibêjin êdî bes e. Belê em jî ji dubarekirina van nêrînan êdî bêzar bûne. Lê xeter mezin e! Ev kesên aciz dibin, an hay ji vê xeterê nînin, an jî dixwazin ev "xencer" hêj zêdetir dil û cegera Kurdewariyê û Kurdistanîtîyê bidirrîne. Di vê mijarê de tevgera bakur û heta yek bi yek her Kurdek dilsoz pêwiste serê xwe zelal bike. Pirsa imraliyê ne pirsek navxweyî ya tevgera Kurd e, ev parçeyek ji planên qirêj û êrîşker yên dewleta Tirk e. Helbet em dizanin ku bi hezaran Kurdên welatparêz hêj li dora vê "rêxistinê" ne. Em naxwazin dijminahiya van xuşk û birayên xwe bikin. Em dixwazin liser zemînek Kurdayetiyê û Kurdistanîtiyê bi bîr û hizrên demokrat destên xwe dirêjî hevdu bikin. Jibo vê yekê divê em bi milmilane plan û leyiztikên dewleta Tirk têkbidin.

Nivê rojeva tevgera Kurd li bakur ev mijar e û hêj çend salên dî jî wê ev rojev bimîne. Çareseriya vê pirsê hêzbûna Dewleta Kurdistanê û geşbûna rih û tevgera Kurdewar û Kurdistanî ye. PDK-Bakur wek serkaniyek Kurdayetiyê û Kurdistanîtiyê pêwiste jibo xelkê dora Pkkyîyan bibe hêlînek starê ku ew bikarin xwe lê bigrin, pêve werin û bi dermanê bireweriya Kurdistanîtiyê birînên xwe bikewînin. PDK-Bakur divê "mezin" bifikire û dilfireh be.

Doza Kurd û Kurdistanê helbet ne tenê pirsa Pkkê ye. Mijara sereke ya bakurê Kurdistanê guherîna paradîgmaya tevgera Kurd e. Ev guherîn bi merc û hoyên navnetewî û herêmê ve girêdayî rûda û berdewam e. Pkk û gelek rêxistinên me yên dî alet û amûrên dema "şerê sar" bûn. Ew dem êdî derbas bû, paradîgmayên wê demê jî tên guherîn. Emerîkîyan, Ewrûpiyan û Rusan A. Öcalan paket kirin û teslîmî dewleta Tirk kirin. Rola Emerîka helbet rola esasî bû. Emerîkiyan dixwestin ku dewleta Tirk bi riyekî îcabî çareseriyan jibo pirsa Kurd bibîne. Lê wisa nebû. Öcalan ji roja hat girtin pêve xwe avêt dawa Tirkan. Dewleta Tirk jî şûna ku jibo çareseriya pirsa Kurd gavan bavêje, benikê Öcalan xiste nav destê xwe û xwest carek dî Kurdan bixapîne. Dewleta Tirk statûkoparêzî dike, bi otoriterîzma oligarşîk-kemalîst ve girêdayî ma û de facto bû dijberê guherînên global li Rojhilata navîn. Di encamê de Öcalan û desthilatdariya Kemalîst bûn "hevalên" hev. Birêvebirê Tirk bi paradîgmaya xwe kevnare (Kemalist cumhuriyetçilik) ve girêdayî man û ji nav Kurdan jî ji xwe re tebeqeyek nû û hevkar peyda kirin, wezîfeya serkêşiya vê tebeqê jî dan A. Öcalan. Riya dewleta Kemalîst û Öcalan diyar e. Hêzên demokrat rasteqîn yên Tirk û tevgera Kurd her yek ji aliyê xwe ve divê di zûtirîn demê de paradîgmayên xwe nû û zelal bikin. Ev kar helbet karê hemî tevgerên Kurdistanî ye, lê berpirsiyariya PDK-Bakur di vê babetê de dîrokî ye. Jiber ku "mohra paradîgmaya nû" di destê wê de ye. PDK-Bakur pêwist e bi her Kurdê dilsoz re bi hevre paradîgmaya nû binexşîne û xwe bike partiya vê paradîgmayê. Eger PDK-Bakur bikare ji bin vî karî rabe, wê dîrok heqê wê bide û li me rûgeş be. Eger nikaribe, helbet wê hinek dî vî barî hildin. Jibo ku PDK-Bakur bikare van erkan bicîh bike, divê serê her tiştî der û şibakên xwe li ber bandor û leyiztikên dewleta Tirk baş bigre, lê derê xwe ji Kurdistanperweran re veke. Rewşenbîr û siyasetvanên Kurdistanî jî divê hinek dilnizm bin û rola xwe bilîzin. Xalên dî yên erkên netewî li bakurê welat divê di çarçoveya paradîgmaya nû de, muşterek bê guftûgo kirin. Divê em li "aqlê muşterek" bigerin û bibînin.

# Gelo kûrsên zimanê Kurdî ji bo girtinê hatin vekirin?



**Hêvîdar Zana**

Di demekê de ku Tirkiyê meseleya endametiya Ewrûpayê ji xwe re kiribû pirsgirêka man û nemanê, gelek kevirên bingehîn yên makezagona xwe jî kirin mijara gotûbêjê. Dewleta Tirk di çarçoveya yasayên hemahengiya li gel Yekîtiya Ewrûpayê de, makezagona xwe ya ku di dema 12 Îlonê de ji aliyê generalan ve hatibû nivîsandin, careke din di ber çavan re derbas kir û hinek guhertinên seranser têde çêkirin.

Yek ji xalên ku pêwîst bû di makezagonê de were guhertin, xala 42. bû. Ev xal di derbarê mafê fêrbûn û perwerdebûnê de ye. Lê belê ew ji xeynî zimanê Tirkî, tu zimanên din weke zimanê perwerde û fêrbûnê napejirîne. Yasa wiha dibêje, "Di saziyên perwerdeyî de, ji xeynî zimanê Tirkî, nabe ku tu zimanên din weke zimanê zikmakî bi hemwelatiyên Tirkiyê bê xwendin".

Makezagon dixwaze bibêje, li Tirkiyê ji xeynî zimanê Tirkî meşrûîyeta tu zimanî tune ye û herkesê ku hemwelatiyê Komara Tirkiyê ye, pêwîste bi zimanê Tirkî perwerde bibe. Ji ber vê yekê jî li Tirkiyê di warê perwerdeyî de, ji xeynî Tirkî hemû zimanên din qedexe ne.

Di temamê dîroka Komara Tirkiyê de, bikaranîna zimanê Kurdî, ne bi tenê li saziyên perwerdeyê, lê li xelkê Kurd bixwe jî hatiye qedexe kirin.




Li gel gotûbêja li ser kêmnetew û mafên kêmnetewan, mijara zimanên zikmakî jî ji aliyê Yekîtiya ewrûpayê ve, li ser Tirkiyê hat ferz kirin. Komîsyona Ewrûpayê, di raporên xwe yên pêşniyaran de gelek caran doza guhertina xala 42. ya makezagonê li Tirkiyê kir. Lê belê rayedarên dewletê, li şûna guhertineke bingehîn, hinek xalên bêxêr guhertin ku tu bandora wan li ser xala 42 çênebe.

Di dema çêbûna van guhertinan de Kurdan çi dikir û çi dixwestin? Jixwe mebesta vê nivîsarê jî bersivandina vê pirsê ye.

Dema ku li Tirkiyê gotûbêjeke dijwar li ser mafên kêmnetewan û mijara zimanên zikmakî dihat kirin, piraniya Kurdên Bakur yên li derdora PKK û rêxistinên girêdayî wê, serê xwe li ser pirsa "gelo Kurd netew in lê kêmnetew in" diêşandin. Li gora serokê PKK Abdullah Ocalan, Kurd ne netew bûn û ne jî kêmnetew, bi gotineke din ew ne tiştek bûn, ji ber vê yekê jî pêwîst nedikir ku mirov doza mafên netewan yan jî kêmnetewan bike. Jixwe ji bo fêrbûna zimanê Kurdî jî Ocalan di hevdîtineke

**Berdewam rûpel 7**

xwe de ji parêzerên xwe re dibêje, "Li hêviya dewletê nemînin ku di vî alî de gavan bavêje, hûn dikarin li gundan odeyên xwendinê çêbikin û li wir xelkê fêrî zimanê Kurdî bikin". Armanca van gotin û pêşniyaran ew bû ku Kurd di wê pêvajoya hesas de wan daxwazên xwe yên rewa li ser dewleta Tirk û Yekîtiya Ewrûpayê ferz nekin û zimanê Kurdî di makezagona Tirkiyê de weke zimanekî fermî neyê pejirandin. Ji bo vê yekê, wê demê çi ji destê PKK û HADEPê hat, kirin. Li şûna ku xelkê ji bo wergirtina mafê perwerdebûna bi zimanê zikmakî derxin kolanan û bi kampanyayên îmzeyan dengê xwe bigihînin Yekîtiya Ewrûpayê, wan xelk ji bo ku zimanê Kurdî di dibistanan de bibe derseke bijarte (seçmeli ders) derxistin kolanan û bi vê armancê bi hezaran îmze kom kirin. Hiştin ku bi hezaran xwendekarên zanîngehan ji bo vê armancê berê xwe bidin birêvebiriyên zanîngehan û heman dozê li wan bikin, "Bela fêrbûna zimanê Kurdî li dibistanan bibe derseke bijarte".

Daxwazên Kurdan yên wê demê, bûn sedema dudiliya gelek aliyan. PKK û HADEPê, Dewleta Tirk ji tengasiyeke mezin xelas kirin. Herkes li hêviyê bû ku Kurd bi yekdengî doza fermîbûna zimanê xwe bikin, çûna dibistanan û xwendina bi zimanê Tirkî protesto bikin û heta ku vî mafî di makezagonê de misoger nekin, ew nehêlin ku zarokên wan gava xwe bavêjin dibistanên dewletê. Lê belê tiştê ku hat kirin berevajî vê yekê bû. Ji bo ku ew pêvajo bi hêsanî di ser Tirkiyê re derbas be, wan bi fikra "odeyên xwendinê" dest pê kirin. Dema dîtin ku "odeyên xwendinê" di nava gel de cî negirt, îcar behsa "dersa bijarte" kirin. Li beramberî rexneyên gelek rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd, PKK û HADEP ji ser ya xwe nehatin xwar û di encamê de ew ji daxwaza ku "Divê fêrbûna zimanê Kurdî li dibistanan bibe zimanekî bijarte" jî hatin xwarê û li vekirina kûrsên ziman yên taybetî sekinîn. Ango, wê zimanê Kurdî, weke zimanê Inglîzî û Almanî bi Kurdan bidin xwendin.

Dewleta Tirk, hilmeke rehet wergirt. Lê Kurdan jî derfeteke dîrokî wenda kirin.

Yekemîn kûrsên zimanê Kurdî, li gora şert û şirûtên dewletê di Nîsana



sala 2004an de dest pê kirin. Kurd, bi pereyan fêrî zimanê xwe dibûn û sertîfîkaya ku werdigirtin jî, weke perçeyek kaxeza bêsûd di destê wan de dima.

Di vê navberê de, tu hewldaneke berbiçav ji aliyê hêzên Kurdan ve ji bo fermîbûna zimanê Kurdî nehat kirin.

Piştî ku mijar ji rojevê derket û sar bû, hefteya borî wan kesên ku kûrsên zimanê Kurdî vekiribûn, daxuyaniya girtina wan li gel sedemên wê ji bo çapemeniyê ragihandin û ew rûpel girtin. Kûrsên li Amed, Batman,Wan, Stenbol, Edene, Ruha, Qoser û Bazîdê (kûrsa Bazîdê hîna venebûbû) hatin girtin. Di daxuyaniya çapemeniyê de, li ser navê midûrên kûrsên zimanê Kurdî, birêvebirê kûrsa Amedê, Silêman Yilmaz axivî û got ku, êdî li Tirkiyê pêvajoya kûrsên zimanê Kurdî qediyaye. Li gora Yilmaz, kûrsên zimanê Kurdî destpêkê bala xelkê kişandine, lê piştre ew balkêşî her ku çûye lawaz bûye. Di daxuyaniyê de behsa çewisandin û astengiyên ku dewletê derxistine yan derdixe nayê kirin, lê gazincên pirsgirêkên aborî dibe û bêwatebûna sertîfîkayê jî weke sedemeke bingehîn ya rawestandina kûrsan derdikeve pêş.

Tiştê herî balkêş di daxuyaniyê de ew bû ku midûrên kûrsan gotinên ku berî du salan ji aliyê gelek kesan ve hatibûn gotin, lê bûbûn qûrbana armancên siyasî û pêk nehatibûn jî anîn ziman. Ew di nava axaftina xwe de li ser pêwîstiya perwerdebûna bi zimanê zikmakî jî rawestiyan. Midûrên kûrsan dan zanîn ku pêwîstiya Kurdan bi fêrbûna zimanê Kurdî tune ye, pêwîstiya wan bi perwerdebûna bi zimanê zikmakî heye.

Lê belê pêwîste were zanîn ku di temamê vê pêvajoyê de, PKK, HADEPê û alîgirên wan (midûrên kûrsan jî di nav de), ziyaneke mezin dan helwestên fermîkirina zimanê Kurdî û bûn amûrê siyaseteke bigemar. Bi van kiryarên xwe ew bûn destbirakê siyaseta dewletê û ev yek ji dewletê re îsbat kirin, "Hûn mafê vekirina kûrsan bidin me û xwe ji Yekîtiya Ewrûpa xelas bikin, girtina wan jî li me".

Li vir çend pirsên ku pêwîste ji aliyê vê derdorê ve werin bersivandin hene, yek: "We ji bo çi di wê pêvajoya hesas de, li şûna mafê perwerdebûna bi zimanê zikmakî, doza mafê vekirina kûrsên ziman kir û we raya giştî bi pirsên bê wate re mijûl kir. Kîjan hêz li piştê siyasetê bû?".

Dido: "We ji bo çi xwendekarên zanîngehan û gel, ne ji bo daxwaza perwerdebûna bi zimanê zikmakî, lê ji bo ku fêrbûna zimanê Kurdî li dibistanan bibe "dersa bijarte" derxist kolanan û îmze bi wan dan kom kirin?".

Sê: "Kûrsên ku we bixwe vekiribûn, çima we ji nişkê ve bi hev re girtin, we fermana vekirin û girtina wan ji kê wergirt?.

Heger bersiva van pirsan bi durustî neyê dayîn, wê encama vê kampanya nû jî bibe weke ya vekirina kûrsan.



**Baran Hemze**

# Têkveçûn berdewame

Birastî tu Kurdek naxwaze vê sernivîsê bikarbîne, lê mixabin divê em bi tundî rewşa xwe binirxînin û wîsa bikaribin bibin bersîvek baş.

Gelek caran liser rewşa bakurê Kurdistanê nirxandinên cûrbecûr çêbûn. Bi dehan kesan di nivîsên xwe de behsa têkçûna hereka Kurd li bakurê Kurdistanê anîn zimên. Di baweriya min de yê gelek carên din jî bên nivîsandin.

Jiber ku, têkçûna tekoşîna hereka Kurd li bakurê Kurdistanê her berdewam dike, wer xuya dike dê demek dirêj ev rewşa xirap hîn dom bike. Gelo di wê texmê de rêxistinên Kurdistanî çi dikin? Dikarin çareseriyekê bibînin an na! Bi raya min hereka Kurd ji çaresîyê gelek dûr e, jiber çi; hereka Kurd piştî têkçûna şerê çekdarî li hundirê welêt nekarîbû bersîvek xurt derxîne.

Em dikarin di vî warî de gelek sedeman bêjin, zexta devleta Tirk, zexta PKK ê û gelek tiştên din... Gelo ev sedema dikarin bibin argumentên me? Çikas rastîya vî tiştî heye? Sedemên sereke evin an rêxistin bi xwe astengek mezin e?

Divê em carek din vê mijarê gengeşî bikin. Pirsgirêka sereke eve ka rêxistin rola xwe ya xebatê dilizîn an na? Dikarin xwe nûjen bikin an na?

Bi nerîna min rêxistinên bakurê welatê me hîn gelek ji realîta tekoşînê dûrin, mentalîta wan hîn a dema şerê sar e. Tucar ew li xwe mikur nayên, herdem rêxistinek rêkûpêk in û her gotinên wan rast in, ji yek û niva xwe jî nayên xwar. Dikarin bêjin em her rastin û divê herkes li dora me kom bibin. Lê gelek caran ji pirsgirêka gelê Kurdistanê dûrin jiber ku ne di nava gel dene!!

Heya rêxsitinên bakurê welatê me lixwe mikur neyên, tucar nikarin rîya tekoşînê carek din vekin. Di hemî deman de " ne bi fermî" qala têkçûnê dikin lê di praktîkê de ev tişt tucar cîh nabîne û her nerînên kevn didine pêşîya milletê Kurd. Jiber vê yekê jî rêxistin nikarin bibin bersiv. Dema mirov li derdora xwe mêze dike dibîne ku gelek kadirên kevn ku di nava tevgera netawa kurd de bi salan ked û zehmetiya wan heye, bêzar û bê teqet manin.

Bêteqetîya wan jî ji pirsgirêkên rêxistinan ne cuda ne, bi salan ked kirin lê encamek jê negirtin. Dem hat guhertin lê ew nehatin guhertin, ew herdem rast bûn lê felekê ji wan re xirab anîyê. Doh serkêşîya rêxistinan dikirin lê îro dijmintîya karê rêxistinî dikin! Gelo li kuderê dinê civatek bê rêxistin bi serketîye?

Li hundirê welêt ne di warê xebata legal ne jî di derbarê xebata rêxistinî de tiştek berbiçav tuneye, her rêxistin ji alîyekî de li bilûra xwe dixe. Perçebûna tevgera Kurd bi her awayî berdevam dike, hem di nava xwe de hem jî di raya giştî de. Çareserî çiye? Di serî de divê rêxistinên Kurdistanî bersiva xwe bidin, an birastî wek rêxistin karbikin an navê rêxistinan ji ser xwe rakin.

Gelek kom dibêjin em rêxistinin, lê birastî li hundirê welêt kesek wan nasnake. Dema tu behsa hinek koman dikî dibên ma birastî tiştek wîsa heye?

Belê her dezgeh divê rola xwe bilîzin û ji qama xwe meztir jî gotinan nekin. Bi endamên kevn tevgera Kurd naçe serî, endamên kevn nikarin bibin bersîv. Tiştên hatine ceribandin carek din nayê ceribandin! Divê em carek din rêxistina xwe ji nûve ava bikin , ana gorê rastîya welatê me û dinê bi bernameyek realîst kar bikin ev xala yekem e.

Xala duyemîn, divê rêxistinên bakurê welatê me jibo xebata bi rêxistinên din re vekirî bin. Dem dem dibihîzim ku her yek ji alîyê xwe de qala xebata hevbeş û enîyekê dikin. Ev gengeşî di çarçova semîner an civînan de dimînin. Rîya enîyek an tevxebatekê gelek vekirîye. Divê rêxistin yekser pêşnîyarên xwe ji rêxistinên din re bibin û bikaribin encamekê jê derxinîn.

Ez ne di wê bawerîyê deme ku şertên rêxistinan kêmin an li hundirê welêt tuneye. Wê gavê ji her demê zêdetir îmkan û şertên me hene. Bayê azadîyê gelek bi qiwete û ne tenê bakurê welatê me lê her alîyê welatê me dihejîne. Pêşewayên milletê Kurd divê hinek bedelan bidin ber çavên xwe û wîsa kar bikin. Tutişt bê bedel nabe û bisernakeve. Hêvîdarim em bi karibin encamekê gelek baş ji wan netîcan bigrin. Di serî de divê PDK-Bakur

liser vî tiştî bisekine û bibe destpêka bersiva pirsgirêkên heyî.

www.serxwebun.org

## Heykel Mansur Şemûn

# „Keldaniyên Kurdistanê hemû Kurd in“



Heykel Mansur Şemûn di 15.12.1938an de li bajarê Akrayê ji dayik bû. Di sala 1961an de li Kurdistanê lîse qedand. Bi Partiya Komunist dest bi siyasetê kir. Dûvre bû endamê Partiya Demakrata Kurdistan. Piştî ku şoreşa Kurdistanê têk çû di sala 1976an de li Almanya bi cîh bû. Bavê du kur û sê keçan e. Çar zarokên wî li Almanyayê Zanîngeh qedandine, yek jê hîna xwendina xwe dom dike.

***Peyama Kurd: Kek Heykel te di nava Partiya Komunîst de dest bi siyasetê kir. Tu çend salan di nava Partiya Komunîst de mayî?***

Di 16 saliya xwe de bûm endamê Partiya Komunîst. 16 salan jî tê de mam. Di 73an de, hevkariya wan li gel rejîma Baas çêbû. Min ew yek wek xiyanetê dît û jê cûda bûm.

***Tu ji Akrê ye. Akrê bajarekî Kurdistanê ye û tu Kurdekî Xirîstiyanî. Akrê jî weke hemû bajarên Kurdistanê cihekî pirolî ye. Tu dikarî di vê derbarê de çi ji me re bibêjî?***

Akre, bajarekî kevnar e. Sê ol tê de hene. Piraniya bajêr misilman in. Piştre xirîstiyan tên, piştre jî cihû. Heta 1950î wiha bû. Xirîstiyanan xwe Kurd didîtin û gelek xebat jî dikirin. Pir pêşmergeyên xirîstiyan hebûn ji Akrê. Yek ji wan şehîd bû, navê wî Hanna Awdîş bû. Bi carekê 37 pêşmergeyên xirîstiyan ji aliyê artêşa Sûrî ve hatin kuştin. Bi nêzikahî 2 hezar pêşmergeyên xirîstiyan hebûn.

P.K Di nava Akrê de, çiqas cihû, çiqas misilman û çiqas xirîstiyan hebûn?

Li navenda Akrê 70 malên filehan hebûn. 480 malên cihûyan bûn. Li navenda Akrê cihû ji filehan pirtir bûn. Yê din jî misilman bûn, wê demê 2000 heta 2500 malê misilmanan hebûn.

***Niha çend cihû û xirîstiyan li Akrê hene?***

Cihû çûn. Di sala 1950 û sala 1978an de çûn Îsraîlê. Fileh heta sala 1961ê jî mabûn. Di destpêka Şoreşa Îlonê de caş ketin nava wan û hemû derketin çûn Mûsilê, Hewlêrê û Bexdayê. Qismek jî çûn Silêmaniyê. Lê bi piranî çûn derve. Ez bixwe yek ji wan im.

***Wextekî komeke cihûyan ji bo xwepêşandaneke kulturî hatibûn Bonnê. We got ku ew bi eslê xwe Kurd bûne, stranên Kurdî gotine û govendên Kurdî gerandine...***

Ew bi navê Kurdan hatibûn vir. Ji Başûrê Kurdistanê bûn û li Îsraîlê diman. Partiyê ji min xwest ku ez biçim binerim ka rewşa wan çiye û ji bo çi hatine. Em jî çûn cem wan. Ez û malbata xwe û malbata hevalekî din jî. 8 jin û 8 mêr bûn. Hemû bi cilkên Kurdî, çoxik û dahol û zirnê ketin hundir. Dema xwe pêşkêş kirin gotin em Kurdên Kurdistana Iraqê ne û li Îsraîlê dimînin. Piştî ku pêşkêşiya wan xelas bû, ez çûm hundir cem wan û em axivîn. Ez bi wan re bi Aramî û Kurdî axivîm. Dema dîtin ez Kurdim gelekî kêfa wan hat. Dema ku zanîn ku ez fileh im, ew hîn bêhtir kêfxweş bûn. Rondik ji çavên wan hatin xwarê. Yekser behsa Barzanî kirin û gotin, "Serok Barzanî ji bo me hemî tişt e." Gotin, "Heger niha Kurdistan di bin serokatiya Barzanî de azad bibe, em yek deqeyê li Îsraîlê namînin." Ew ji min û bavê min Kurdtir bûn. Du kes li gel wan bûn, ew ji wan herdû kesan ditirsiyan. Dema ku ew kes diketin hundir, wan axaftin diguhert û tiştekî din digotin. Mosad bûn. Gelekî ji wan ditirsiyan. Gotin, "Di sala 1978an de radyoyê behsa mirina Mele Mistefa Barzanî kir, em wê demê li Amerîkayê bûn û me sê rojan zad nexist devê xwe û em derneketin ser sehnê. Lê piştre em pê hesiyan ku nûçeyeke derew e û propagandaya Beesiyan e. Îcar me xwarin xwar û em derketine ser sehnê û weke ku em careke din hatibin dinyayê em kêfxweş bûn". Kurdên Sindorê, Duhokê, Amediyê, Şêxan û Zaxoyê bûn.

***Niha çend mal li Akrê hene, li gora texmîna te?***

Ez nizanim. Lê qismek ji gundiyan hatine. Ez dizanim ku Serok Mesûd erd daye wan. 3000 metreyên çargoşe dane wan ji bo ku ew dêrekê ji xwe re ava bikin.

***Di cîhana îslamê de, herdemê di navbera misilman û cihûyan de, misilman û xirîstiyanan de nakokî hene, herdemê bêhizûrî heye, lê li herêma Barzan û herêma di bin desthilatiya Barzaniyan de, tu ferq di navbera misilman û xirîstiyan, misilman û cihûyan de tunebûye, sedema wê çiye?***

Adet û baweriya wê malê wisa ne. Ew tim piştgiriya miletê hejar û zeîf dikin û wan diparêzin. Parastina filehan dikin, ya cihûyan dikin, ya êzîdiyan dikin û qebûl nakin kesek zirarê bide wan. Dema ku Serok Barzanî li Rûsya bû, li Akrê ji me re digotin "kafir". Piştî Mele Mistefa hat, ev tişt nema.

***Yanî malbata Barzanî li wir mêzêna civakê bû. Dema ku hukum li herêmê dikirin hemû ol bi hev re bi biratî dijiyan û dema ku hukmê wan zeîf dibû jî ew mêzên xerab dibû?***

Sînema hatibû herêmê. Em çûn sînemê. Cihû jî hatibûn, em 2 fileh bûn û 2 misilman. Kamil û Ezîz û ez û Hebîb. Ez biçûk bûm û gopalek di destê min de bû. Min ew berovajî girt destê xwe û li nîvê serê yê cihû da û em reviyan. Lê niha dema tê bîra min, ez xwe pir sûcdar dibînim, min çawa li birayê xwe daye. Bes cûdahiya diyanetê di navbera min û wî de heye, lê em bira ne, em Kurd in.

Dawid Xocaxino û Îshaq Xocaxino hebûn. Li Akrê serokê cihûyan bûn. Ji du malbatan bûn; mala Îdo û mala Xocaxino. Mala Xocaxino pir dewlemend bûn û eşrafê cihûyan bûn. Malbata din hinekî oldar bûn. Baş nayê bîra min lê ez bawer dikim mamostayên kenîsê ji mala Îdo bûn. Ev herdû malbat, girêdayê mala Barzanî bûn. Di wê demê de diçûn Barzan û dihatin û heger Barzanî jî bihata Akrê, diçû mala wan. Pêwendiyeke xurt di navbera wan de hebû û ez bawer dikim heta niha jî heye. Cihû û fileh hemû hez ji mala Barzanî dikin.

Partî di sala 58an de li Akrê hat damezirandin. Navê meqerê wan Xebat bû. Ew meqer li Akrê navçe bû. 7 endamên wê hebûn. Berpirsyarê wê Haşim Akreyî bû. 4 misilman bûn û 3 fileh bûn. Yek ji wan navê wî Cemo bû. Dema ku li ser riya meqer jê dihat pirsîn ka ew bi ku ve diçe, wî digot "Ez diçim mala Meryem Anayê". Digotnê kuro tu çi dibêjî, wî digot, "Meqer Meryem ana ye". Wî hewqasî hez jê dikir û hezkirina wî ji bo Barzanî bû. Fileh hemû li aliyê Barzanî bûn. Cihû jî her wisa.

***Gelek malbatên Kurd yên naskirî hene. Lê hinek taybetmendiyên Barzaniyan hene, pir cuda ne. Tu li ser van taybetmendiyan çi dibêjî?***

Barzaniyan tucaran zor li kesî nekirine, kes nekuştine. Heta niha qedexe ye ku li wir heywan jî werin kuştin. Şêx Mihemed Xalid ferman da ku nabe kes kewan, teyr û tilûran û maran bikuje. Bi tenê nêçîra masiyan serbeste. Ji ber ku pir zêde dibin.

Demokrasiyeke mezin di nava Barzaniyan de heye. Dema ku keç û xortekî hev direvandin, heger ku bi dilê keçê bûya, ew xwedî li wan derdiketin, mal û xwarin didan wan, heta ku malbatên wan dihatin û doza wan çareser dikirin. Lê heger keçikê bigota ez bi zorê hatime revandin, wan ev yek qebûl nedikir, keçik jê distendin û ew feleqe dikirin.

Di nava wan de, ji ber çi sedemê dibe bela bibe, kuştina mirovan qedexe ye. Bavê min 16

www.kurdi.org

salan di nava wan de dikandar bû. Wî digot, "Ji bo ku pêdiviyên dikanê bikirim, ez tim bi pereyên mezin diketim ser rê,. Tu mirovî tu carî doza tiştekî li min nekir û min aciz nekir". Heger li nava hinek eşîrên din bûya, wê ew destvala vegeriyana, dihate şelandin. Lê di nava Barzaniyan de ne şelandin û ne jî dizî hebû. Bavê min digot, "Me tiştên xwe li bin darekê datanîn û dadiketin gundên Barzanan, li vegerê me didît ku tiştên me hîna li cihê xwe mane û her ew ji wir nehatine livandin.

***Di derbarê Keldaniyan de fikrên cuda cuda hene. Hinek dibêjin, Keldanî bi tenê oleke, hinek jî dibêjin ew neteweyeke?***

Ez Kurdim. Kurdekî Xirîstiyan û Keldanî. Keldanî li başûrê Îraqê bûn, Babil û Hemorabî Keldanî ne. Keldanî duvre bûn xirîstîyan û navê Keldanî wekî mezhebekî Xirîstîyaniyê hatiye binav kirin. Diyaneta xirîstiyaniyê destpêkê de hat başûrê Îraqê. Ew berî me bûne fileh. Em piştî wan û li ser rêka wan bûne fileh. Keldaniyên Kurdistanê, ne ji Babîl hatine, Kurd in.

Dibêjine me, Keldan-Katolîk. Berê herkesî digot em Kurd in, kesî berê nedigot ez Keldan im. Digotin ez fileh im, ez Kurd im. Li ser deriyê Patrîarka babil nivîsîye, " Patrîarka Babil ya mezheba Keldanî". Keldan ne netewe ye. Niha 85 milyon Keldan li alemê heye. Her yek ji neteweki ye. Li Çînê jî hene, zerik in û çavên wan kişiyayî ne. Li Hindê jî hene, li ser riya Keldaniyê bûne xirîstiyan. Dibêjin taîfe, yanî rêka îbadetê, ne gotine, qewmiya Keldanî.

***Keldanî bi kîjan zimanî dipeyvin?***

Bi Aramî dipeyivin. Wan ev ziman ji dêrê wergirtine. Ev ne zimanê zikmakî ye. Incîla yekemîn bi vî zimanî hatiye nivîsîn. Di wî wextî de nivîsîna Aramî hebû. Piştî xetên bizmarî, xetên Aramî derketine. Me zimanê Aramî ji dêrê wergirtiye. Em dibêjin em bi filehî diaxivin, em nabêjin Aramî. Ji ber ku Quran bi zimanê Erebî hatiye nivîsîn, gelek milet ji bo vê yekê bûn Ereb, zimanê xwe hiştin û bi erebî axivîn. Wek Cezaîr, Somal, Berber, Misrî, Sûrî û gelekên din. Erebên eslî Yemenî û Cizîrî ne, ew jî nîvê wê ne hemî. Hinek ji Xelîcîyan Keldanî ne. Li wir bûn misilman û bûn Ereb.

Miletê Kurd, bi eslê xwe Zerdeştî ye. Yên ku niha cihûne, fileh in, misilmanin, tev de berê Zerdeştî bûn. Dema ku Mûsa pêxember hat, qismek ji wan bûn cihû. Îsa pêxember hat, qismekî mezintir bûn xirîstiyan. Piştre îslam hat û bi zorê




hat. Wê demê jî beşekî mezin ji cihû, xirîstiyan û zerdeştiyan bûn misilman. Li Îraqê, Keldan û Aşûrî û yên din jî bûn Ereb. Niha jî qismek ji wan xwe Ereb dibînin. Bakurê Efrîqa hemû Berber bûn, Cezayîr, Tûnis, Libya û yên din, tev Berber bûn lê bûn Ereb.

***Baasî û rêberên Îraqê yên Ereb, ji bo rûxandina şoreşa Kurdan, dest avêtin hemû rê û rêbazan, xwestin Kurdan û hinek grûbên din berdin hev. Xwest xirîstiyanan li dijî Kurdan bikar bîne?***

Partiya Baas gelekî hewl da ku Kurdan ji hev perçe bike. Xirîstiyan jî li aliyekî, xwestin misilmanan perçe bikin.

Saddam serekê olan dikirîn. Yek ji wan Metranê Akrê bû. Navê wî Endrawis bû. Ji xelkê Eradinê bû. Ew bixwe endamê partiyê bû. Di nava komîteya aştiyê de temsîla partiyê dikir. Em 6 kes xwendevan bûn û Komunîst bûn. Wî şand pey me û got, "Hûn çima dibin Komunîst, ew li dijî diyanetê ye, werin bibin partî". Piştî vê yekê, di sala 1971ê de dema ku danûstendin li gel hikûmetê dihat kirin, ew çû cem Barzanî û got, " We heqê xwe bir, ka heqê min". Barzanî got, "Matran efendî ewê me biriye bila ji bo we be". Ew aciz bû û lêxist çû Bexdayê. Li wir dest pê kir bibêje ku fileh ne Kurd in. Wî digot fileh Suryanî ne, Ereb in. Wî li wir mehê 7 hezar dînar ji hikûmetê werdigirtin û karê istîxbaratî dikir.

***Avabûna dewleta federal ya Kurdistanê ji bo xiristiyanan bû destpêka jiyanek nuh. Di Kurdistanê de xiristiyan bi qasî misilmanan azad in. Tu caran dewletên îslamî ne hiştine dêr bên ava kirin. Li Kurdistanê dewlet bi xwe dêran ava dike, ne wisa ye?***

Belê. Barzanî di vî alî de gelekî pêşketî ne. Ew tu ferqê naxin nava diyanetan de. Li cem wan Kurd Kurd e, dixwaze misilman be, dixwaze cihû û fileh be, dixwaze êzîdî be. Li Barzan gundekî xirîstiyanan heye, Bêdiyal. Mesûd Barzanî ji bo xebatkarên ku çûne avakirina herêma Barzan gotiye, "Berî hertiştî gundê Bêdiyal ava bikin". Roja din Kak Nêçîrvan nefsa gotinê dûbare kiriye û gotiye, "Lazime ew gund destpêkê were avakirin".

Di parlamentoya Kurdistanê de, endamên filehan hene. Li Bexdayê jî wezîrekî xirîstiyan heye. Heger ne ji vê azadiyê ba, wê zimanê Aramî wenda bûba. Rejîma Baas dibistanên taybetî yên zimanên Aramî kiribûn dersên fêrkirina Quranê. Bi zorê Quran bi filehan didan xwendin.

***Vegera Mistefa Barzanî ya ji Rûsya tê bîra te?***

Tê bîra min, ew li otêla Semîramîs dima û heta sê mehan jî alem diçû bixêrhatina wî. Ji Besra û heta devera dawîn ya Kurdistanê, xelk diçûn cem wî û bixêrhatina wî dikirin. Ji Evdilkerîm Qasim bêtir qîmet didît. Komunîst hebûn, Bees hebû û hinek rêxistinên biçûk jî hebûn, lê qedr û qîmetê Partiyê û Barzanî li gel Ereban ji yê tevan bêtir bû. Ereban gelekî jê hez dikir. Wê demê xwestin Barzanî bikin sekreterê fexrî yê Komunîstê Iraqê, lê wî qebûl nekir. Dema çûn ev pêşniyar ji wî re kirin, wî got, "Min hîna mala xwe ava nekiriye, kengî min mala xwe ava kir, wê demê ezê destê xwe dirêjî cîranên xwe bikim". Wî bi uslûbekî gelekî ciwan bersiva daxwaza wan da.

Di sala 1971an de mezintirîn xwepêşandan çêbû. 2 milyon kes tê de beşdar bûn. Heta niha tiştekî wiha nebûye li Iraqê û tu zanî çi digotin, "Bijî Kurd û Kurdistan, Mele Mistefayê Barzan". Ev dirûşmeya wan bû.

***Di dîroka tu netewan de misilman û xirîstiyan ji bo doza netewa xwe nehatine cem hev û li hemberî dijminên xwe di eniyekê de şer nekirine. Yek ji taybetmendiyên Barzanî jî ewe ku kurdên xirîstiyan û misilman di eniyekê de aniye cem hev.***

Siyaseta Barzanî ji roja yekê de komkirina Kurdan bû. Ji pale û cotyaran bigre, heta bi rewşenbîr û xwendekaran, tev anîn cem hev. Hemû olên cûda li hev kom kirin. Di tu şoreşan de tiştekî wiha nebûye. Barzaniyê nemir digot, yekbûna milet, xelasiya netewa Kurd e. Wî tu cudahî nedixist navbera olan de. Îro jî mala Barzanî li ser vî prensbê dimeşe.

***Mele Mistefa Barzanî her li pêş bû û pêşengiya pêşmergeyên xwe dikir. Wî temamê mirovên xwe û zarokên xwe jî xistibûn nava şer, wek nimûne Mesûd Barzanî û Idrîs Barzanî di nava şer de çêbûn û di nava şer de mezin bûn û perwerde bûn?***

Serok Barzanî rêberekî bê emsal e. Bixwe pêşmerge bû û bixwe serok bû. Kurên wî pêşmerge bûn. Tu serokekî ev tişt nekiriye. Serok her li dereke dûr rûniştine û alem şandine kuştinê. Lê Barzanî her li pêş bû. Ji ber vê yekê milet jê hez dikir û bawerî pê dianî. Wî Kurdayetî dikir. Wî ev milet bi alemê da naskirin û îsbat kir. Ev destketin hemû bi xebata wî bûne. Wî 54 salan xebat kir û rojekê negot ez westiya me, bese. Niha kurê wî jî her wê xetê didomîne.

Serok Barzanî xwediyê soza xwe bû, xwediyê deynê xwe bû. Dema wî tiştek bigota, wî her bi cî dianî û ji bîr nedikir. Ew tucaran ji ser soza xwe daneketiye. Ne tê bîra min û ne jî kalkê min bûye şahid ku wî sozeke xwe negirtibe. Di şoreşa 46an de, milet çû li gel Barzanî şoreş kir û piştre jî çûn Rûsya. Bavê min li Bilê 16 salan dikandar bû. Hinek deynê wî li wan pêşmergeyan bû, ewên ku çûbûne Rûsya. Yek ji wan rehmetiyê Mam Eshed bû. Rojekê ji roja dema ku ez telebe bûm, min xwest ez pirtûkên xwe têxim çenteyekî bavê xwe. Wî hinek defter di wî çenteyî de diparastin. Min xwest ew vala bike. Min got ev çi ne, bavê min got, "Ev deynin li ser Barzaniyan, lê ew niha çûne Rûsya. Dema ku vegeriyan, heger ez amede bim wê bidin min, heger ez neamade bım wê bidin te û heger tu jî ne amade bî wê bidin zarokên te". Min jî got, "Kero nemire heta bihar bê". Wê demê ew li ber min rawestiya û şeqamek li min da. Wî got, "Heger tu careke din vê gotinê bikî ezê te ji malê derînim".

Di sala 59an de Barzanî vegeriyan û deynê xwe li bavê min vegerandin. Vê yekê bandoreke mezin li min kir û min bawerî da wê malbatê.

**Hevpeyvîn:**
**Ahmet Zeki Okçuoglu**



# Bêaqiliya Tirkan, tespîta Azîz Nesîn û dijayetiya Amerîkayê

**Ömer Özmen**

Li gor rasyonelên demokrasîyê û pîvanên hiqûqê; di nirxandinên civakî de, darizandinên kollektîf ne durustin. Lê mixabin, civata Tirk, ji alîyê sistema xwe ya otoriter ve hatîye qada nexwesiya civakî.Polîtîka dij Kurdayetîyê, nijadperestî, boranên aborî, sistema perwerdebunê ya totalîter, liser psikolojîya civata Tirk tehribatên girîng afirandîye.

Serokê navenda Lêkolîna Genetik ya Leipzigê Prf.Wolkmaar Weiss, liser zarokê Alman û Tirkan lêkolinek cêkirîye. Ligor vê lêkolînê; zeka ya zarokên Tirk, ji sedî panzdeh prosent paşde ye. Di derheqê vê lêkolînê de, di medya Tirkan de reaksiyonên nîjadperestî derketin holê.Di hinek rojname û kanalên televîzyonan de,ji gelên Alman re heqaret hat kirin.( Wek,kanalên televizyona Mesaj û Meltem de-29.-07-2005)

Xwenîşandana van reaksîyonên tûj, carek din, tespîta nivîskar Azîz Nesin anîbu rojevê.Tê zanin Azîz Nesin, gotîbu; „Civata Tirk, ji sedî 65 prosent "ehmeqe". Jibo vê tespîtê, Azîz Nesîn di dadgehê de hat darizandin. Dema, ji dadgehê derket, di televizyona ATV ê de, bi rêvebiriya Prof.Dogu Ergil, beşdarî bernameyekê bû. Di vi bernamê de, Nesîn got „ligor delîlên ku min pêşkêşî dadgehê kir, hejmara ehmeqan derket 80 prosentî û bi birya-ra dadgehê jî hat tescîlkirin."

Demek berê ajansa BBC yê, li Tirkîyê lêpirsînek (ankêtek) cêkir. Ligor vî lêpirsînê jî, gelên Tirk ji sedî 85 prosent dijminatîya Amerîkanîyan dikin. Mîrov dikare bêje ku, di nav van her sê nîşangehan de pêwendîyek diyalektîk heye.Hejmara prosenta tespîta Azîz Nesîn û BBC yê nêzê hev in.Tistekî balkêşe: dema di şerê sar de,Amerîkanîyan piştgirîya dewletên totalîter û otorîter dikirîn. Wê demê, di hemî cihanê de, dijatîya Amerîkayê, polîtikayek meşrû dihat pêşwazîkirin. Lê gelemperîya civata Tirk ne li dij Amerîkanyan bûn. Partîyên alîgirê Amerikayê, tim desthilatdar bûn. Hêzên cep, yên ku li dij Amerikayê radiwestîyan tim marjînal bûn.Tucari nedibûn desthilatdar.Ji civata Tirk jî referans nedigirtin. Kingê ku,şerê sar qedîya,Amerîkanîyan dev ji alikarîya dewletên totalîter berdan û dest avêtin demokratîzekirina herêmê. Gelemperîya gelên Tirk bûn dijminê Amerîkayê. Di nav hêzên çepgir, îslamîperest, faşist û Kemalistan de, wê demê hevgirtin hat sazkirin. Destkeftinên basûrê Kurdistanê pêlavên Tirkan berovajî xist lingên wan. Ol û iman û ideolojîyên civata Tirk jî da guhertin.

Bêguman ev hewildanên civata Tirk,teqabûlê nexweşîyên psîkolojîk dike.

# Di heftiya derbazbûyî de.. Serhildana rojhelata Kurdistanê



**Rapor: Silêmanê Alîxan**



Ev nêzî mehekêye gelê Kurd li rojhelata Kurdistanê serhildaye û libêrxwe dide. Komara îslamî jî naxwaze dawiyê bi karên xwe yên nemirovane bîne, loma her roja ku derbaz dibe dengên nerazîbûnê ji bajarên rojhelata Kurdistanê bilind dibin û meş û xwepêşandan zêde dibin.

Li roja 30.7.2005an li beramber bîroya Ostandar (walî) yê bajarê "Sine", nêzî 500 kesan ji xelkê bajêr civiyan. Ev xelk ji aliyê hêzên komara îslamî ve hatin dorpêçkirin, lê wan bi bilindkirina posteran û gotina dirûşmên siyasî li dijî dagîrkeran, piştevaniya xwe ji xelkê serhildayê bajarê Mehabad û bajêrên din yên rojhelata Kurdistanê re ragihandin. Piştre çend kesek ji wan xwepêşanderan bi Ostandarî re rûniştin û daxwazkirin ku ew kesên hatine zîndanîkirin bi zûtirîn dem bên azadkirin û herweha wan ji Ostadnarî re eşkere kirin ku eger ev daxwaziyên wan bi cî nehatin, ewê xwepêşandan û nerazîbûnên xwe bi şêweyên cor bi cor berdewam bikin. Herwesa li rojên dûv de jî berxwedana xelkê bajarê Sine berdewam bû û di encama pevçûnên dinavbera xelkê û hêzên hikumetê de, bi dehan hatin girtin û dinav wan de (Rûya Teloyî, Madih Ehmedî, Îclal Qewamî û Azad Zemanî) ku ji parêzvanên mafên mirov û civaka medenîne, herwusa çendîn kes birîndar bûn û bêtiriya wan birîndaran jî di malên xwe de mane û nikarin herin nexweşxaneyan. Helbet wepêşanderan jî çendîn esker birîndar kirin û çendîn tirombêl, amîr (alet) û baregehên hikumeta îslamî sotin.

Li bajarê "Bane" piştî ku xelkê bajêr (CD) yên şehîdkirina Şiwane Qadirî dîtin, ku têde diyar dibe bi çi şêweyî ew hatibû şehîdkirin, li roja 30/7/2005an bi hizaran xelk dâketin nav cade û kulanên bajêr û bi gotina Sirûda nîştîmanî „Ey Reqîb" û bilindkirina ala pîroza Kurdistanê, piştevaniya xwe ji xelkê bajarên din yên serhildayî re diyarkirin û tawanên komara îslamî protestokirin. Li gelek ciyan jî di navbera xwepêşanderan û hêzên komara îslamî de pevçûn çêbûn û di encam de çend kes ji hêzên komara îslamî birîndarbûn û çar Kurd jî şehîdketin û 100 kes jî hatin girtin, her di van deman de komara îslamî eskerê xwe li ser çiyayên derdora bajarên Kurdistanê zêde kirin.

Dîsan jibo piştevanîkirina birayên xwe yên bajarên din, xelkê bajarê "Dîwandere" dest da xwepîşandanan û pevçûn di navbera xelkê û hêzên ewlekariyê de çêbûn û di encam de xelkekî zor birîndarbûn û gelek jî hatin girtin.

Li roja 2/8/2005an xelkê Kurdperwerê bajarê Merîwan jibo cara çendemîn nerazîbûna xwe nîşandan û dikan û bazarên xwe girtin û ji biliya hêzên leşkeriyên komara îslamî tukes liser cade û kulanên bajar ne bû, li asmanê bajêr jî helîkopterên leşkerî hebûn.

Li roja 3/8/2005an xelkê şerefmendê bajarê Seqiz jî serîhilda û pevçûnên dijwar di navbera xelkê serhildayî û hêzên rijêma îslamî li hemû cade û kulanên bajêr çêbûn û helîkopterên leşkirî yên hikumetê li asmanê bajêr digeriyan, di van pevçûnan de bi dehan hawlatî şehîd û birîndarketin û bêtirî sedan jî hatin zîndanîkirin û bi dehan kes ji hêzên ewlekariyê jî birîndar bûn.

Herwusa li heftiya derbazbûyî, li devera Nawîxan a girêdayî bajarê Şino yê rojhelata Kurdistanê, jibo tolvekirina şehîd Şiwane gropek xortên Kurdên qehreman, 4 efserên hêzên hikumetê kuştin.

Ji aliyek din ve komara îslamî agehdariyek di kovara "Pirto sexin" de weşandiye û dibêje; "jibo parastina xwe û hikumeta îslamî ewê leşkerê "îstişhadî", wate xwekujî pêk bînin û ew kesên ku amadene û dixwazin bi karên xwekujî rabibin navên xwe dinivîsin. Dîsan li roja 3.7.2005an serokê nû yê komara îslamî Ehmedî Nejad yê tundrew, bi şêweyekî fermî dest bi karê xwe kir, ev jî mumkîne di navbera Kurdistaniyan û hêzên komara îslamî de bibe sedema zêdebûna xwepîşandan û pevçûnan, çonkî wek tê zanîn serokê nû bawerî bi dialogê nîne û helwesta wî ya dijminatiya doza Kurd diyare.

Jiber van bûyerên nû yên rojhelata Kurdistanê, Komîteya Navendî ya Komeleyê daxwaz ji hemû partî, rêkxiraw û xelkê şerefmendê Kurdistanê dike ku li roja yekşembî 7.8.2005an hemû bi hevre mangirtinek gîştî bi rêvebibin û hemû dikan, bazar, kargeh, qutabxane, zanîngeh û ciyên karkirinê bigirin.

## Leşkerê Tirkan Zaxo bombebaran dike!

**PK** - Di jimare ya 101 ya roja çiwarşembiya derbazbûyî ya rojnameya "Evro" ku li bajarê Duhok derdikeve, hatiye eşkerekirin ku leşkerê tirkan çendîn caran kargehek li devera Şînava ya girêdayî bajarê Zaxo, bombebaran kiriye û cara dawiyê li roja 28/7/2005 jibo demê du demjimêran, ev dever hat bombebaran kirin, di encam de ziyaneke maddî ya mezin bi kargehê ket û xwediyê kargehê neçar bû ji wir barkir, lê rojnameyê diyarnekirye ka helwesta hikumeta Kurdistanê beramber vê kiryara leşkerê tirk çi bû!.

## Qutabiyên Kurdistanê dixwazin dîn ji dewletê cuda be!

**PK** - Ji aliyek din ve Liqa Zanîngeha Duhok ya "Yekîtiya Qutabiyên Kurdistanê" jibo cudakirina "dînî ji dewletê" di destûra bingehîna dewleta Îraqa fedral de, heweke komkirina îmzeyan destpêkiriye û ta niha bi sedan îmze kom kirine û di xwazin di dawiyê de van îmzeyan bidin parlemena Kurdistanê.

## Jinekolog, mêrekolog, dînekolog. Prof. Dr. Fatê Were Civatê



**Şêxbat**

***Rojbaş Hevala Fatê,***

***Min cara pêşî nivîsandina te li cem hevaleki oqumîs kir. Jiber ku hemu bi***

***Kurdîye kêfa min zêde nehat. Ya hewlel wella, yaho ev çi tiştin hûn dikin, qey hûn dixwazin pîlanê hinek camêran sabotaj bikin? Tirkî zimanekî zengîn, xweş û moderne û hemu Kurd anlamîş dikin. Hûn çima bi zimanekî wilo zor û kevin yazmîş dikin? Neyse hevala Fatê, çi işê te di nav wan bolüciyan de heye? Divê em hinekî kontaqt bi tere qûrmîş bikin, hinekî siyasî exîtim bidin te da çavên te vebin! Lê dîsa jî kêfa min pir ji şiretên te re tê. Ji vê yekê ez bi dizî rojnama we almîş dikim da heval nebînin. Îcar biner ez çi difikirim. Ev alçakên li dora serokê netewî wî anlamîs nakin.***

***Jiber vê yekê jî emrê wî xelet tênin cîh. Yeke wek te jîr û xwedî tecrûbe li kêleka serokê me pêwiste. Ezê vê ji serok re pêşniyar bikim. Ma tu dibe çi?***

***Ger serok ban te bike tu amadeyî biçî wir?***

**Yurtsever Heval /Almanya**

Lao Yurtsevmezo hey agir bi malê keto rebbî, ma qey ez nizanim go fesadên wek te ava serê min dikelînin loo! Îşê we karê we hûn dixwazin min û hevalan berdin hev newlo! Kuro oxlim, ez jî zanim Tirkî zimanekî dewlemend û xweşe kurê kerê! Ji sedî 25 Kurdîye, ji sedî 25 Erebîye, ji sedî 25 Farisiye, ji sedî 15 gotinên înternasyonal in û ji sedî 10 jî zimanê Kûçikan e! Ma ka zimanê ji vî zimanî xweştir hêê! Te go sabotaj? Çima lao ma ez Kenan Ewren im go hefsar têxim stuyê xelkê û sabotajan bikim bêbext! Yan jî ma ez dewleta kûr im go xulamên xwe bera nav Kurdan dim û sabotajan bikim bêwîjdan! Te go alçak-malçak li dora serokê te hene û wî fêmnakin? Nalo! Halla halla! Ê lao wele ez wî tiştî nizanim ha, ew maye liser bextê û serokê. A baş tu ji Dogu Perînçûk û Yalçin Kûçik bipirse ew bêhtir zanin. Yan jî ji Mehmûd Şakşak û Emîn Çolajan bipirse. Te go tê min pêşniyarî serokê xwe bikî?Weylao, weylao! Lao Yurtsevmezo, kero, ma çûna wir hevqasî rehete oxlim! Mane berê divê ez herim Şamê, dûre Yûnan, Îtalya, Rûsya û talî ez xwe Kenya deynim. Bêje serokê xwe heger balafira Cavît Çaglar ji min re rê bikin dibe go ez liser çûna Îmralî bifikirim. Yan jî tiyara Îbrahîm Acises jî dibe haa!!

***

Fatê xanim, berastî derdim zor e, na***dzanim çon bilêm. Nawî min Ebû Mûsa El Zirtarî ye. Min îslamîstêki zor çak we çalakem we bo xudanî gewre hemiş roj serî 10 Kurdekan dibirim, qurban dekem bo yezdanî pak. Êste min dilêm "ê me serî wan Kurdekan dibirin belam bo goştî ew kafirane naxwon kaka!? Min dixwazim fetwayekî zor çak derêxim we xwardinî goştî Kurdekan helal bekem. Ê tu wek dînekolog dilê çî bo ew pêşniyazî min? Le benda bersivî tû me!***

**Mûsa El Zirtarî / Şam**

Ya Ebû Mûsa El Zertarî, ker kurê ew ker, serbirdinî 10 Kurdekan kêm e kaka, ê min dilêm hemîş roj serî 100 Kurdekan bibire! Belam jibîr neçêt ke serî Tirk we Erebekan le serî Kurdekan gewretir we çaktir e. Herku tu serî yêk Kurdekan jêkird, legel wî jî serî 10 Tirk we Erebekan bibire ke xêrî tû zortir bibîtin kaka. Heger kû tu le beramber serî yek Kurdekan serî 10 Tirk we Erebekan bibirî, min bawerim ke tû dê yekser biçî cennetekan. Meseleyî xwardinî goştî Kurdekan jî berastî êste natwanim tu biryarek bidem. Çunkî, ê min goştî Tirkekan, Erebekan, masiyekan, berxekan, berazekan xwardime belam ta êste le bîrim çûyî ke goştî Kurdekan bixom. Ê min wek Dînekolog le bo tû pêşniyaz dekem ke berî her şitik goştî Tirkekanî kafir bixwon we fetwayêkî derêxin we bêjitin "xwardinî goştî Tirkekan helal e!" ☒ we berî Kurdekan, bi goştî Tirkekan dest be xwardinî goşt biken we piştre ême pêkve dadinişin we biryarek îslamî werdigirin.Baş niye kaka!?

*fate@peyama-kurd.com*

## Çengelpirs

| Perdax, peyale | | Sûtetî, serserîtî | Gotinek ecêbmayînê | | Hacet, amûr | | Urf û adet | | Nîjada Kurdan | Mecal, dûrayî | Xezal |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Xwediyê wêneyê jêrê | | | | | | | Paytextê Îtalyayê | | | | |
| Tobekirin | | | | | | | | | Ne baş, ne xerap | | |
| | | | | | Devok | | Organ, beşên laş | Lêborîn | | | |
| Zerzewatek, vekirî | | | Gopal | Ava ku xwe ji zinaran berdide xwarê | | | | | | | Tîpa dehemîn |
| Serbestî | | | | | | Xeyîdî, acizbû | | | | | |
| | | | | Teknîka şewqê | | | | Cahil, nexwendî | | | |
| Navekî zilaman | Şîp, ketina berfê | Personel, xebatkar | | | | | | | | | |
| | | | Teref, hêl | | Xwedê nenas | | | | | | |
| Dengê qewirandina kûçik | | Serbest | | | | | Di alfabê de tîpa herî dawî | | | | |
| Kesê paleyê dike | | | | | Rêxistina jibo rizgarkirina welatê Baskê | | | | | | |
| Ezbet, klan | | | | | Xwarinek sereke | | | | | | |



## Remildank



**Beran** (21.03-20.04)
Hûn Karin his û xwestekên dilê xwe ji hezkiriya/yê xwe'te bêjin û hevjiyana xwe bighînin konaxek bilindtir. Hûn Karin bi hevre bernameyên pêşerojê çêkin.



**Gamêş** (21.04-20.05)
Hûn bifikirin di mala xwe de hin guhertinan çêkin lê lez nekin, berê lêbikolin. Berî hûn biryarekê bidin berê baş biponijin.



**Cêwî** (21.05-21.06)
Vê heftê xwe ji alkol û xwarinên bi tewaş bi dûr bixin. Bi hesûdî û dudilî nêzîki bûyeran nebin. Hûnê bixwazin ji derûdorê bi dûr kevin.



**Kevjal** (22.06-22.07)
Dibe ku hinek nûçe we têxin nav derd û mitalan, lê di bin bandore wan de nemînin. Hûn karin beşdarî hin şahî û ahengan bibin.



**Şêr** (23.07-22.08)
Hûnê têkevin nava ramanên nûjenî û bê aram hûnê bixwazin wan têxin jiyanê. Lez nekin, proje û ramanên xwe bi sereki zelal têxin jiyanê.



**Simbil** (23.08-22.09)
Hûn di derna afirmendiyê de ne û hûnê bixwazin îro tiştên cûrbecûr biafirînin, Lê bi aram bin û zêde lez nekin. Navbera xwe û hezkiriya/yê xwe xirab nekin.



**Mêzên** (23.09-22.10)
Wê têkiliyên we û hevalên we têkûztir bibin. Pirsgirêkên navbera xwe û hezkiriya/yê xwe kûr nekin û hewl bidin ku wan careser bikin.



**Dûpişk** (23.10-21.11)
Dibe ku hûn îro nûçeyên nexêr bibihîzin û serê we tevlihev bibe. Fikir û ramana xwe zelaltir bikin û xwe aciz nekin. Bêyî ku hûn rastiyê zanibin biryarên xelet nedin.



**Kevan** (22.11-21.12)
Hin nûçeyên ku hûn îro bigrin wê kêfa we bîne çi. Hûn Karin bi xebatên çandî û civakî dakevin û bi wan moralê xwe bilind bikin. Têkevin nav civat û saziyên nû.



**Kovî** (22.12-19.01)
Fersendên ku dikevin destên we baş bikarbînin. Hûnê bixwazin rewşa xwe a civakî bilind bikin. Têkiliyên xwe bi dostên xwe yên dûr qut nekin.



**Satil** (20.01-18.02)
Wê pêşniyazên baş ji we re bên û dibe ku hûn têkevin heyecanê. Hûn bi tevger û livbaziyên xwe yên sempatik bala der û dorê dikşînin ser xwe.



**Masî** (19.02-20.03)
Li his û vîn'a (îrada) xwe xwedî derkevin, dudilî nebin. Hewl bidin ku bi xweşî û ahengî nêzîkê hezkirî û dostên xwe bibin.

## Pêkenok

### REŞIK

10 reşik (zencî, ebîd) ji girtîxanê direvin. Bi rê de lempakê bi sêhr dibînin. Lempê vedikin, ji lempê Cin'ek derdikeve û ji wan re dibêje: Her yekê daxwazekê ji min bikin, ezê bi cîh bînim. Bi dorê her neh reşikî gotin:

*- Me spî bike, em dixwazin spî bibin.*

Reşikê deh (10) an dest bi ken kir, ji kena li erdê gevizî û ji Cin re got:

*- Ez jî dixwazim tu wan dîsa reş bikî, wan reş bike!..*

Ê Cin daxwaza wî anî cîh û ew dîsa reş kirin.

www.arsiv

# Şaheserek ji bajarê Diyarbekirê:

# Xana Delîlan

Gava meriv ji deriyê Mêrdînê dikeve hindur li destê rastê avaniyek heye. Ev avanî di hîcrî 934 (Mîladî 1527-1528) an de çêbûye. Ev avanî di dewlemendiya dîroka Kurdistanê de şaheserek e. Navê wê yê rastî "Xana Husrev Paşa ye". Jiber ku demên berê Heciyên ku ji welatên Îslamî dixwestin di ser Kurdistanê re biçin Hecê, dihatin li vê Xanê komdibûn û jiber vê jî di nava xelkê de navê "Xana Delîlan" lê hatiye kirin.






Ji hola li himberî vê avaniyê re jî "Xerabeyên Heciyan" tê gotin. Di pirtûka Ewliya Çelebî de ew wek "Xana Bazirganan" derbas dibe. Ewliya Çelebî di pirtûka xwe de pir pesnê Xana Bazirganan dide û methê wê dike.

Xana ku îro li holek fireh belavbûye ji kevirên şehkirî yên reş û spî, kevirên moloz û ji tûxla hatiye avakirin. Ev kevir ligor pîvan û dereca avaniyê li ciyên cûrbecûr hatine bicîhkirin. Wek beşê ku li kolanê dinere, beşê axur jî ji qatekê lê beşê navendî ji du qatan pêktê û beşê herî balkêş beşê ketina hindur e ku ji kevirên reş û spî hatiye xemilandin. Ji derveyî wê, di beşê jêrîn de dikkanên ku ji kevirên toloz hatine xemilandin bala mirov dikşînin. Ev dikkan ji ber beşê axur berdewam dikin. A.Gabrîel di pêşkêşkirina plana xwe de ev dikkan nîşan nedane. Di beşê navendî de, liser her dikanekê pencereyek odeyên xanê vedibe. Ev pencere tenê li cepha pêşî venebûne lê herweha seranserê xanê dorpêçane. Xan, bi bordurên (neqş û tenikdîwarê kêleken zikê xênî) geometrîk hatiye xemilandin û meriv di deriyekî xweşhunerî de dikeve hindurê xanê û piştre merin dihihê mekanek berfireh. Rewakên duqatî ku ji kevirên tûxla hatine çêkirin û niha hatine sewaxkirin, wek beşekî serbixwe derdikevin holê. Ev rewş di herdu qatan de jî tên dîtin.

Di ketina hindur de li herdu kêlekan nêrdewan hatine çêkirin û meriv bi wan nêrdewanan derdikeve qata diduyan. Jiber ku di qata diduyan û pêde rêza rewakan rabûran (xelas) dibe, êdî di rêza kevirên reş û spî de cepheyek berfireh derdikeve holê. Bi taybet, di beşê ketina hindur de di çarçoweyên çarkoşeyî de hêmenên nivîsên kufî hatibe bicîhkirin.

Piştî rewakên ku liser du stûnên qalind hatine çêkirin



Amadekar: Mehmet Çetîntaş

odeyên xanê hene. Ji xeynî nişteyên biçûk ên dîwaran, li derveyî deriyên ku ji rewakan re vedibin, pencereyên vekirî hene. Ode, bi tonozên mirêkî (eynik) hatine xemilandin û bi deriyên kûrane berê xwe didin rewakê.

Di beşê diduyan ê xanê de axur û embar hene û meriv bi riya odeya kul i hêla başûr hatiye çêkirin desbasî wan dibe. Bi taybet ev riya ketinê nehatiye ser zimên û ji aliyekî de riya ketina axur û embarê mekana fireh a li pişt xwe veşartiye. Ronahiya axur û embarê tenê bi riya şewqa penceran dikeve hindur. Jiber ku ev pencere yeko yeko tên vekirin hindurê wê hinekî tarî ye. Nefên di navbera kemberên rojhilat û rojava de bi tolozên dergûşî hatine xemilandin. Xana Delîlan bi şikl û şemalê xwe û bi şaheseriya xwe ve şema û îmarvaniya rojhilata navîn berûpêş dike. Ev mîmarî û neqşên ku bi kevirên reş û spî hatine xemilandin di Kurdistanê de hinek ji nûjeniyên nû ne. Xana Delîlan jî wek gellek şaheserên dîrokî yên Kurdistanê li beramberî felaketek mezin e. Xana Delîlan bûye qurbana Dewleta kolonyalîsta xwînmija Tirk û dewleta kolonyalîsta Tirk jî bi navê restorasyonê şaheserî û dîrokbuhayiya Xana Delîlan ji holê radike û dixwaze bi vî awayî ji xwe re bike mal.



www.ersi.org

# Mêr jinên çawa tercîh dikin?

**Li gora rapirsîneke li Britaniya hat kirin, mêr, jinên ji xwe kêmtir zekî tercîh dikin.**

Li gora xebateke hevbeş ya Zanîngehên Bristol, Edinburgh, Aberdeen û Glasgow jinên zekî ji bo parastina zewaca xwe dikevin nav hewldanek giran.

Zanyaran li ser 900 jin û mêran lêkolinek li dar xistin. Jinên ku ji 10 saliya xwe heta 40 salîya xwe hatin şopandin raxistin ber çavan ku, zarokên keçik yên IQ ya wan bilind û xwendinek biserketî kirine di jiyana xwe ya zewacê de têkdiçin.

***Grafîka mêran berevajî ye***

Zanyar radigihînin ku grafîka mêran tam berevajîya jinan e. Mêrên di jiyana zewacê de biserketî ne, ji % 88 di karê xwe de jî biserketî ne û perê baş qezenc dikin.

***Li Britaniya ji 5 jinan 1 jin xwe dilkêş (cazip) dibîne***

Encamên lêkolînek din ya ku dîsa li Britaniya çê bû derxist h[illegible]lê ku li vî welatî ji her 5 jinan tenê 1 jin xwe dilkêş dibîne.

Li gora anketên ku ji al[illegible]ê London School of Economics û Z[illegible]ingeha Harvard bi 3 hezar û 200 jinan re hatine kirin, ji % 50 jin difikirin ku di jiyanê de şansa serketina jinên dilkêş ji yên din gelekî bêtir e.

***Jinên Brezîlî xwe „harîqe“ dibînin***

Li gora lêkolînek din ku li Amerîka, Kanada, Îtaliya, Fransa, Hollanda, Portekîz, Arjantîn û Brezilya hatiye kirin, eşkere kir ku bêtirîn jinê sifeta „Harîqe“ layiqî xwe dibînin jinên Brezîlî ne.

Li Brezilya ji her 100 jinan 6 jin xwe „bêqisûr“ dibînin.




Navenda Zelal:
Trink-Zel (Köln)
Tel.:0221 376 24 05

**Bayiyên Zelal**

**AKCAN GmbH**
*Hamburg*
*Tel.: 040 723 402 96*

**LIZA GmbH**
*Berlin*
*Tel.: 030 390 380 30*

**ESD Softdrink Gmb**
*Mannheim*
*Tel.: 0621 318 76 70*

**TRINK-ZEL II**
*Düsseldorf*
*Tel.: 0211 49 62 150*

**CAN GETRÄNKE**
*Essen*
*Tel.: 0201 289 74 17-18*

**TRINK-SEM**
*Dortmund*
*Tel.: 0231 981 86 23*

**HARRAN GmbH**
*Fellbach*
*Tel.: 0711 592 08 64*

**CHAPLIN GETRÄNKE**
*Bremen*
*Tel.: 0421 691 96 78*

**EURO-FRESH-FOOD GbR**
*Erfurt*
*Tel.: 0361 26 27 516*

**TRINK-ZELI**
*Köln*
*Tel.: 0221 977 63 11*

**NERGIZ**
*Tel.: 02562 22 168*

## Sînema bi Coelho hesiya



**PK** - Sînemavan hîn nû bi pirtûkên nivîskarê bi nav û deng Paulo Coelho hesiyan. Pirtûkên Coelho Sîmyager, Yanzdeh deqîqe, Veronica dixwaze bimire û Çiyayê pêncem ji aliye rejîsorên cuda tên kişandin.

Pirtûka Coelho Sîmyager ku nivîskar bi vê pirtûka xwe li seranserê dinyê hat naskirin di vê salê de wê bibe film û derkeve ber temaşevanan.

Ji aliyê din ve "Veronîka dixwaze bimire" êdî ji aliyê Japonan ve hatiye kişandin û wê di Festivala Cinema ya Tokyo de di Çiriya Pêşîn de pêşkêşî temaşevanan bibe.

Coelho di pirtûka xwe ya Yanzdeh deqîqe de liser bingehê kevntirîn pîşe (meslek) dinyê çîroka evînekê bi xwendevanê xwe re dide xwendin.

Çiyayê pêncem liser jiyana Elyas pêxember e.

## Ji destnivîsara Lennon re 1.4 milyon dolar

**PK** - Destnivîsara strana "All You Need is Love" ya bestekarê Brîtanî û endamê grûba efsanewî Beatlesê John Lennon bi 1.4 milyon dolarî hat firotin.

Organîzatoran ragihandin ku teksta Lennon gava di sala 1967an de Beatles derketibû programek televîzyonê bikar anîbû, li Londonê bi 1.4 milyon dolarî hat firotin.

John Lennon di sala 1980an de di 40 saliya xwe de li New Yorkê hatibû kuştin.

# Al-Anfal

## „Bi navê Allah, Baas û Saddam"
## Filmek dokumêntar liser şerê ku Baasa Iraqê li dijî gelê Kurd kir .




**PK** - Derhênerê Kurdistanî Mano Xelîl, karê wêneyî û dengî ji bo filmê xwe ê dokumêntar „ Al-Anfal : bi nevê Allah, Baas û Saddam" bi dawî anî.

Derhêner Mano Xelîl du salan û bi qasî 3 hezar seatan li ser vî filmî xebitî.

Ev film şanî dide, ku rejima Baas a Saddam bi rengeki resmi, terora dewletê û qetlîam li dijî miletê Kurd tanî.

Filmê Al-Anfal ji produksiona derhêner û alîkariya televizîona Swîsra, qenalê zimanê Elmanî ye.

Film jibo zimanên Elmanî, Inglîzî û Fransî hatiye wergerandin.

Şerê bi navê Al-Anfal ku Saddam Huseyîn li dijî miletê Kurd li Kurdistana başûr di salên 1988 an û vir de pêkani, bu sebeb ku bêhtir ji 182 hezar mirovên Kurd, jin û zar û kal, hatin kustin û bi deh hezaran gundî bi saxî hatin binerd kirin, yan jî hatin wêrankirin û ew şandine deşta iraqê ku ji tîna û birçîna mirine.

Saddam Huseyîn di sala 1987an de, kur-amê xwe Ali Hasan Al-Majid ( ku navê wî ne tenê li cem Kurdan, lê li nav dinyayê wek Ali Kîmiyawî hate nas kirin ) kire hakimdarê yekemin ê Kurdistanê. Ev mucrimê bê exlaq navê surta 8 a Quranê ku bi navê Al-Anfale, navê vê suretê li şerê xwe yê li dijî miletê Kurd kir. Ev sura quranê di dema Pêximberê Eraban Muhamed de hatibu û liser mesela talankirina mal û milkên gawiran daxive. Ali Hasan Majid, xwe weke pêximber Muhamed binav kir û miletê Kurd weke Gawiran da xuyanî kirin. Eskerên Îraqê mal û milkên Kurdan li xwe par dikirin, zar, zêc û zilamên wan jî kujtin. Ne tenê ev, lê generalên Baasî ên muxaberatên Seddam û generalên eskerî keçên Kurd ên ciwan lixwe behr dikirin û grupek ji wan jinan jibo Gazîno û merqesên welatê Misrê hatin şandin, ku heta roja îro kes nizane çi bi serê wan keçan hat.

Film her ku bi taybetî liser şerê Al-Anfal disekine, hevpeyvîn û bi sedan dokumentê rêjîma Baas ku kujtin bi rengekî resmi bikartanî, lê ji alîkî din ve hinekî liser mesela zindanan û praktikên Baasê li zindanan û herweha liser qirkirina miletê Kurd li Helebçe jî diaxive.

Mesaja filmê Al-Anfal ne tenê dîrokê ji nûvre vegerîne, lê liser hêviya miletê Kurd disekine, ku ev miletê bi sedhezaran şehîd dane tucarî namre û heqê xwe ji dijminên xwe re nahêle.

Ji alîki din ve, film dixwaze mesajek din bide miletên azad û serbixwe, ev mesaj jî eve: pişti şerê cîhanê ê duemîn Nazî li Elmanya qedexe bû û weke partîyek terorîst û heta roja îro hat binavkirin. Lê mixabin Nazî cihekî xwe ê xweş li Iraq û Suriyê dît lê bi navek din, partiya Baas a Erebî a Sosîalîst.

Erê partiya Baas a Îraqê têk çû, lê li welatê Suriyê her Baasî liser hikum in, û ji wan jî tê û ne dûre, ku rojekê ew jî şerekî bi navê Al-Anfal li dijî miletê Kurd bikin.

Fîlm ji destpêka meha nehan (Îlon) ve, dikeve festîwalên filman û di televîziona Swîsri a zimanê Elmani de tê weşandin.

**Jibo Beşdarbûna premiyêra film:**
*Film wê roja 25.9.2005an roja yekşemê seat li 20.00an li bajarê Bern a Swisrî bê nişan dan.*
***Adrêsa Têatro eve:***
***Schlachthaus Theater***
***Rathausgasse 22***
***Bern - Schweiz***

# RTÜK'a Kurdan liser kar e

Kurd ji Tirkan fêrbûn: Kurdistan TV 24 Seetan hat girtin




# Göç-Der a Wanê: operasyon wê rê liber pêlek nû ya koçberiyê vekin

**PK** - Komeleya Çand û Alîkariya bi Koçberan re GOÇ-DER, hişyar kir ku operasyonên li Kurdistanê dijwar dibin, wê rê liber pêlek nû ya koçberiyê vekin. Komek ji endamê GOÇ-DER a Wanê, liber Navenda Kar ya Şaredariyê hate cem hev û di derbarê operasyonên artêşa Tirk ên ku di demên dawî de birfireh dibin de daxuyaniyek da.

Liser navê komê Seroka GOÇ-DER a Wanê Carolînê Camgoz ragihand ku bi operasyonan re, daristanên li Dêrsim, Colemerg, Amed û Şirnaxê hatine şewitandin.

Camgoz ku bal kişand ser agahiyan dibêje, "di operasyonan de çekên kimyevî tên bikaranîn" û xwest, di serî de Neteweyên Yekbûyî hemû saziyên pêwendîdar yên navnetewî bikevin nava liv û tevgerê.

Camgoz di dewama daxuyaniyê de destnîşan kir, ku operasyonên li Kurdistanê zêde dibin, wê rê liber pêlek nû ya koçberiyê vekin.

Çareseriya aştiyane ya di navbera IRA û Îngîlistanê de ji aliyê Camgoz ve hat bibîrxistin û hat xwestin, ku di çareseriya pirsgirêka Kurd de jî pêvajoyek diyalogê destpêbike.

IHD ya Çewlikê jî jibo ku şert û merc bê amadekirin, di serî de AKP bang li hemû partiyên siyasî û rayedaran kir, ku berpirsiyariyên xwe bicîh binin.

www.kurdi.org

# Dêrsimij Çemî Mûnzûr ser barajan nêwazenî

**Dêrsim** - Endamî hereketa awe û herr nêwazenî Çemî Mûnzûr ser baraj virazî. No rid ra înan zerrê mamekî de yew şîyayiş viraşt. Nê kesanî ke na çalakiya protesto viraşt xo eşt awê Mûnzûr. Awe Mûnzûr no wext de sey cemêd a. Înan yew per ra xo eşt myanî awe, per bîn ra zi eşkirakerdişî çapamenî kerd vila. Înan va ;"Dewlet wazena bi projeyanî barajan Mûnzûr bênate ra wedaro, no kerdinê dewlet verba huquq o".



150 endamî hereketa awe û çeman ê Tuncelî serî Çarşuyê binerd ê belediya de amê piyeser û hetî Çemî Mûnzûr a şî. Înan rayer ser yew per ra trampet cîna, per bîn ra zi diruşmê sey "Destî ke erziyenî Mûnzûr ê biyerî şikitiş", " Ata holdînga qetilkar Dêrsim ra defib", qêrayî. Na grub kiştê "Pirto Asinin" de resayî Çemî Mûnzûr. Îta de bi name na grub Ebukat Özgür Ulaş Kaplan qisêkerd. Özgür Ulaş Kaplan, dolê Mûnzûrî 21 kanûne 1971 de sey parka mîlî amebî qebul kerdiş va û qisêkerdişî xo îna rûmna: „ Gorê nê qanûnî gereka na dol biyero querikerdiş. La nika dewlet wazena bi projeyanî barajan dolê Mûnzûr bixeripno. Qet yew faydê aborî nê projêyan çîno. Bi nê barajan bi desan dewî biyerî veng kerdiş û îna Dêrsim bi temamî biyero bê însankerdiş".

Ebukat Kaplan nika yew problema zaf muhîm zi xebatê cigerayişî zerdana va û no derheq de zi vînayê xo îna ardî ziwan: „ Şîrketê Rio Tinto û taşeronî ey AMDL û Yamaş bi sîyanurî Dêrsim de gêrenî zerdan. Nê şîrketan semedî gêrayişî zerdana bi seyan donum erd kîra kerdo. Înan çimî xo verdayî Dêrsima, wazenî Dêrsim xirabe bikerî, la kar biyarî karî xo ser. Eger nê şîrketî zerdan vînî, nê zerdan îta de bi sîyanura myanî herr ra vecenî. No qede zehîr kenî miyanî awê ma û herrê ma. Penî nê de zi hin Dêrsim de insanî nêşkenî biciwî. Ê wazenî heqî ciwiyayişî ma, ma dest ra bigirî".

# Çolîg de yew awahiya gird viraziyena



**Çolîg** - Waharî karo Çolîgij Ahmet Dursun mehlayî Karşiyaka de yew awahiyo gird virazeno. 13 henzar 500 metrekare yew ca de 6 henzar 500 metre kare awahî yena viraştiş. Înan re yew sahaya haliyin a. Na saha 1600 metre kare ya. Projê na awahî almanya de viraziyayo û piyerê malzemî ey Ewropa ra ameyo. Na saha haliyin him semedî zimistana, him zi semdî amnana. Çîmenî saha çîmeno raştîn o.

Na awayhiyê eynî wext de sey dibistanî spor zi biyero karardiş. Hendê 100 şagirt eşkenî îta de qideqide spor bimusî. Îta de malimî spor zi kar bikerî.

Yew awahiya bîn zi hewşe konferans û spor a. Na awahî zi pê teknolojiya Japonya ameya viraştiş. Piyerê na awahî pê konsorsiyûmî asina viraziyaya û te de hewşî wêr, şano, konsêr û konferansan estî.

Waharî na awahî Ahmed Dursun no derheq de îna vûno: " Na awahî tirkiye de yew tênа ya. Ez zaf kêfweşa ke mi yew awahiya înayin Çolîg de viraşt. Wext ke na awahî qediyay, îta de 100 kes eşkeno kar bikero. Mi hêverî waşt na awahî yew bajaro gird de virazî, la cuwa pey mi qerarî bedilna. Hol aya ya ke mi na awahî welatî xo de viraşt. Bi no hawa him çehreyî Çolîg ê sosyal bêdilyeno, him zi însananî ma re îmkanî kar abenî. Ma wazenî diyarî derê Çabaxçor de tênа dar ra yew Cafe- Restaurant virazi".

Yew parçê na awahî sahaya haliyin bî a û xortî Çolllîg te de futball kaykenî.

# Kasetî Seîd Altûn, „Axlê Zekê" veciya



**PK** - Hûnermendo Çoligij Seîd Altun yewna kasetî dêran vet. Namê no kasetî Seîd Altun „Axlê Zekê" yo.

Sêid Altûn seranî 1970 de dest karî muzîk kerd, la ey o wext hêna zaf tirkî vatiyen. Seîd Altûn nê serranî peyinan dest ci kerd kirdkî dêran vûno.

Kasetî „Axlê Zekê" kasetî çaharino ke Seîd Altûn tênа kirdkî dêran wineno. Seîd Altûn sey ê kasetanî bînan no kasetî xo de zi him dêranî Çolîg wineno, him zi dêrî ke ey bi xo viraştî wineno.

Seîd Altûn derheqî kasetî „ Axlê Zekê" de îna vûno. „ No kasetî mi zi sey ê bînan her ca de yeno ruetiş. Ma her ca de afîş dard kerdî. Ez na xebatê xo de zi bi îdîa ya, ez bawer kena ke no kaset zi hol biyero ruetiş. Semedî alaqaya ke şarî ma nîşan dûno, ez nika re înan re spas kena".



Selim Çürükkaya

## Gulê Mi

Çend roj verî cînî mi yew nuşte nuşt, ez wazena nê şima re bi kirdkî binusî.

- „Aşmê temmuz de mi rojnameyî wênd, înan qalê kiştişi yew însan kerdiyen.

Wext ke mi ê wênd, ti ûmeya mi vîr. Ez kota myanî girey awka bêbin. Kî vûno ke ez ha cad xeniqyena, destî mi hê recifyenî. Lingî mi hê darmaley yew bînan geyrenî. Ez nêwkena nefes bigir. Aqil mi, mi serre de niyo. Qelbî mi hedî dûno pirye, ez bena sey sexoşan. Bi vateyo ke nika modayo, ti vûnî qey tsûnamî dawo mi re.

Ez vizêr rayer de biya, varan varaynî, miyanî daran tarî bi, ez tênа biya. Serre 1992 aşmê temmuz amê mi vîr. Ez Düsselderf de biya, mi eşnawit ke ti remnaya. O wext ti yew palka de xebitiyayn. Yew rojo germ de çahar qetilkar ûme verî berî to, înan ti eşt yew texsiya sipî û berd. Tênа yew qicî to diy. Ê însanî bîn sey heywanan, sey qilan, sey daran, sey merdan bê veng mendî. Babî to tersa, dadî to şî to Mûnzûr û Dûzgûn Baba ra persay. 22 rojî cuwa pey qican erd de yew dest diy. Înan no dest girot kaşkerd, leşê to leşê to pa amê. Qican xeber da muhtar. Piyerê heskerdê to şî nêweşxane. Çew to nêsinasna gulê mi. Çimkî ê zaliman çermê serrê to serkerdib, ê çimî to yê rind vêtib, zincê to, gueşî to ti ra kêrdib, pê yew la ti qeniqnab.

Çêw to nêsinasna gulê mi, dadî to şemûkê lingê to, zûmay ma zi didananî to ra to sinasna.

Ez zaf çinay re qehriyay ti zûna, gulê mi? Ê zaliman o bend ke pê ti xeniqnabi, o bend, gijikî to ûyew gueşarê to kerd yew tore û dadî to re va:

Xalê înan wedar

Dadî ma ê girotî, şî sukê xarpiyet, kincî vêv ernay, ard dayi to ra. Dadî ma destî ti xene kêrd û to o qede vist mezel.

Ah gulê mi, welatî ma de hama zi însan yenî kiştiş. Hama zi kes nêzano qetilkat kam î. Hama zi kes qetilkaran nêtepişeno. Hama zi dadî, babî, wayî û birayî bermenî.

Ez na aşm ra hes nêkena gulê mi. Na aşm de mi Xeyrî, Akîf, Kemal û Alî kerd vîn. Halî mi pers mekir, ez hol niya. Ez qlibyaya yew awa bêbin re. Ez ha xeniqyena. Destî mi hê recifyenî, lingî mi hê decenî, nefês mi nêvecyeno. Qelbî mi ho nêxebityeno, ez sey serxoşana, ez sey nêweşana , gulê mi"

Aysel Çürükkaya

www.arsiv.com

# Albumî Mîkaîl Aslan o newe veciya: Miraz



Yew mude cuwa ver hozan Mîkaîl Aslan bi nameyî " Miraz" yew albumî muzîk vet. No albumî hîreyin ê Mîkaîl Aslan o. Mîkaîl Aslan cuwa ver zi bi nameyî "Agerayiş" û " Kilitê Kou" di albumî vetib.

Albumî "Miraz" tirkiye de fîrmaya kalan Muzîk vet. Eşkirakerdişî çapamenî ke kalan Muzîk kerdo vila, semedî name dayişî no albuma îna yeno nuştiş: „ Ma namê no albûmî Miraz na pa ke o suro ke tarîh ra yeno, o mîraso bingehin ke dewamiye dano heyatî, her tim vîrî ma de bimano".

Mîkaîl aslan sey ê her di albumanî xo yê bînan, no albûm de zi tarîh û tasawuf piya alawito, ci ra yew sentez viraşto. Albûmî Mîkaîl de çend deyirî êy bi xo nuştî û ê bîn mintiqayî Dêrsim ra dayî ariye. Mîkaîl Aslan bi yew koma zaf qelabalixa, bi metodanî modern û hetî akustîk û muzîka yew albumo zaf bi kalîte veto. Hozanî sey Zelemele û Aynur zi Mîkaîl Aslan re solo Vokal virazenî.

No albûm de bi nameyî „ Connection – Remayişe Munzurî" yew parçeyo senfonîk zi ca geno. No parçe 25 deqa rûmeno. Mîkaîl Aslan no parçe aşmê Nîsan 2005 de bajarî Almanya Mainz de bi okestrayî Senfonî ê Konservatuarî Peter Cornelius peşkeşî gueşdaran kerdib.

## Bê Mîraz heyat domnêkeno

Albûmî " Miraz" sey felsefe, sey konsept dewamî albûmanî " Agerayiş" û " Kilîtê Kou" no. Mîkaîl Aslan derheqî albûmî " Miraz" de îna vûno: " Wext ke ez geraya ke kilîte Kou vînî, mi miyanî yew fotografo kûhûn de tiye kişt de di derwîş diy. Ez rik menda ewmniyaya destanî înan ra. Nê her di derwêşan destî yew bînan tepiştib û o qede mehsûn vindertên ke çimanî înan de huznî heme deman nimitebi. Înan piyerê nîşananî vînbiyayê ê yew qomo perçebiyaye zerrê çengî xo de kiriştên. Mi îta fam kerd ke kilîte koyan ke vînbiyaye yo , ho destî înan de o.

Ez biya derg mi waşt ke ez o kilîto vînbiyaye înan ra bigirî, yew ber abi, ez no ber ra şiya zerre. Kiştê yew çemî de kulsiyî vengî bî û yew zi yew cemaato vilabiye, tarûmar biyaye re tayê çîkî tepiya mendî û qalî ke awe seri amê nuştiş, bî.

Wicaxanî hunaşiyayan de , adir ke xo unto binî wel gereka yew çî îfade bikerdiyen.

Ez kilîtî koyan gerayni, la mi zerrê yew tepsiya sîmin de yew gudê mîraz diy.

Mehnay nê çi bî? Miraz îşaretî çi bi?

Mîraz semedî raameyişî mîra yeno karardiş. Bê mîraz mîr nîno ra, nêbeno û kî nêşkeno nan poco. Bê mîraz orteameyişî ganîyan temam nêbeno. Mîraz o çîko ke nesil ra nesil dom keno. Bê mîraz ê neslî ke yenî nêşkenî verniyê xo vînî. Ê rayerî xo şaş kenî. Mi zi mîrasî kokimanî xo girot, bê nê mîrasî ez kêm mendiyenî. 60 serriyo ke welat ma de yew asîmîlasyono zaf pît rûmeno. No 60 serr de îna bi ke nika neslî newê kalikanî xo fam nêkenî. O kes ke mîraz geno sey mîr hedî hedî beno kamîl û no qede eşkeno eseran biyaro meydan.

Kokî mîraz, mîras ra yeno. Semed ke no mîraso bingehîn her tim ma vîr de bimano, ma name nê albûmî "Mîraz" na pa".

No albûmî Mîkaîl Aslan de bi name yî mîraz yew deyiri esta, na deyiri 4 beytan ra yena meydan. Beyit1: Însano Naçar, Beyit2: Însano Kêm, Beyit3: Însano Kamîl, Beyit4 :Enstrumental o. Xercî kirdkî (Kirmanckî) no albûmî de 2 parçeyî tirkî zi estî. Înan re yew şîîrê Elî Şêr a, a bîn şîîrê Aşik Vîrani ya.

## Albûmî Mîraz de nê deyirî ca genî:




1 ) Xatunê, Qal û muzîk: Mikaîl Aslan

2 ) Elqajiye, Qal û muzîk: Anonim (Dêrsim/Ovacixe)

3 ) Aşkin Şarabi, Qal û muzîk: Elî Şêr

4 ) Miraz (Beyt 1) - Insano Neçar , Qal û muzîk: Mikaîl Aslan

5 ) Miraz (Beyt 2) - Insano Kêm, Qal û muzîk: Mikaîl Aslan

6 ) Miraz (Beyt 3) - Insano Kamîl, Qal û muzîk: Mikaîl Aslan

7 ) Miraz (Beyt 4) - Enstrümental , muzîk: Mikaîl Aslan

8 ) Le Dezawo , Qal û muzîk: Anonim (Çewlig)

9 ) Direga Zerrê Mi, Qal û muzîk: Hüseyin Ayrilmaz

10 ) Canim Efendim, Qal: Aşik Vîranî, muzîk: Firik Dede

11 ) Mi rê Çike, Qal: Kamer Söylemez, muzîk: Mikaîl Aslan

12 ) Dara Goze , Qal: Doğan Munzuroğlu, muzîk: Mikail Aslan

13 ) Connections - Remayişe Munzuri, muzîk: Mikaîl Aslan & Gerhard Fischer-Münster

## Mîkaîl Aslan kam o ?

Mîkaîl Aslan 1972 de navçeyî Dêrsim Xozat de ameyo dinya. Mîkaîl Aslan hêverî tirkiye de bi koma Munzur û Almanya de bi koma Tohûm a piya xebitiya. Ey albûmî xo yo verîn 1999 de vet. Nameyî no album " Agerayiş" bi, albûmo didin zi 2003 de bi nameyî " Kilîtê Kou" vet. Mîraz albûmî Mîkaîl ê hîrêyin o.

Mîkaîl Aslan Almanya de Konservatuarî Peter Cornelius de muzîk ser wend. O hêna zaf mintiqay Dêrsim ra deyiran dano ariye, hêna zaf kulturî Dêrsim ser vindeno, la o bi xo zi semedî deyiranî xo ya qalan nuseno. Albûmanî Mîkaîl Aslan de tarîh, mîtolojî û muzîk piya tiyeman de alawiyayî. Mîkaîl Aslan deyiranî Dêrsim bi hacetanî modern û okestra cîneno û hewl dano ke muzikî Dêrsim senfonîze bikero.



# بە "ڕۆبۆت" کردنی مرۆڤ

مستەفا چوارتایی



شانبەشانی پێشکەوتنی تەکنۆلۆژی، ژیان ئالۆزتر دەبێ و پێویستییەکانیش زیاتر دەبن. ڕۆبۆتیش وەک هەر داهێنانێکی دیکە، ڕۆڵێکی گرنگ لە ژۆربەی بوارە پیشەسازییەکاندا دەبینێت. سەرەڕای هەموو ئەو جۆرە ڕۆبۆتانەی کە جێگەی دەستی کاریان گرتووەتەوە و بوونەتە هۆکاری بێکاریی ژمارەیەکی زۆری کارگەران، بەردەوام جۆرەها ڕۆبۆتی دی بۆ خزمەتگوزاری مرۆڤ دروست دەکرێن وەک؛ یارمەتیدان لە هەڵگرتنەوەی مین، دۆزینەوەی مرۆڤی زیندوو لە ژێر دار و پەردووی شوێنە ڕووخاوەکاندا، یارمەتیدانی کەسی پەککەوتە و زۆر بواری دیکە، ئەمانە هەمووی ئاسایین و پێشکەوتنی تەکنۆلۆژی، سنووری زەوی و چینی هەوا و هەسارەکانیش تێدەپەڕێنێت. ئەوەی ترسناکە، نائاساییە، لە وڵاتانی دواکەوتووی ئیسلامیدا؛ مرۆڤی گیاندار بکرێتە ڕۆبۆت! بە جۆرێک هەموو ئیرادە و هەست و سۆز و ویژدان و ڕەوشتی مرۆڤایەتی لێ بسەندرێتەوە، وەک ڕۆبۆتێکی لە ئاسن و تەل دروستکراو و پڕۆگرامکراو، بێ هەستکردن بە پەشیمانی و ئازاردانی ویژدان، فەرمانەکان جێبەجێ بکات، ئەمە ستراتیژییەتی ئیسلامی سیاسییە بە جۆرێک لە جیاتی "لا اله الا الله" - "الغاية تبرر الوسيلة"ی کردووەتە دروشمی خۆی.

ماوەیەکە خەڵکی کوردستان سەرقاڵ و سەرسامی بینینی دانپیانانەکانی گرووپی "شێخ زانا"ن، بە بینین و بیستنی ئەم دانپیانانە، خەڵکی تووشی شۆک هاتوون، من بۆ خۆم، بە دڕێژایی دوو شەو نەمتوانی بنووم، لەو کاتەشەوە دەزگاکانی ڕاگەیاندن، سیاسییەکان، بەڕەسان خۆیان بەو مەلایانەوە سەرقاڵ کردووە کە بە "زانایانی ئایین" ناویان دەبەن، لە ڕاستیدا ئەو داماوانە خۆشیان خۆیان بە زانا نازانن و لە هەموو گوتارەکانیشیاندا، لە گوتنەوەی چیرۆکەکانی بەدر و ئوحد و پێویستی ڕۆژووگرتن و دانی زەکات و سەرفترە زیاتر، هیچ نازانن. بەشی تەفسیرکردنی جیهاد، خۆشەویستی نیشتیمان، چەوساندنەوەی کورد، خەباتکردن دژی ستەمکار و داگیرکەر لە گوتارەکانیاندا، نییە؛ بۆیە ئاساییە کە گەنجێکی زۆری بنەماڵە هەژار و ئایین پەروەرەکان گوێ بۆ ڕابەرانی ئیسلامی سیاسی بگرن، ئەوانیش بە گوێرەی زانستی سیاسی، خەڵک دەخوێننەوە و دەزانن چۆنیان پەروەردە بکەن.

حکومەتی هەرێم گورزێکی باشی لە ناو و ناوبانگی ئیسلامی سیاسی وەشاند بەڵام کۆشندە نەبوو، نەیتوانی و ناشتوانێ هەموو ڕاستییەکان بۆ خەڵک ڕوون بکاتەوە، لەوانەش ئەم خاڵانە:

یەکەم: ئەگەر ئەم گرووپە لە ساڵی ١٩٩٥ەوە تا ساڵی ٢٠٠٥ واتە بە دڕێژایی ١٠ ساڵ، خەڵکیان سەربڕیبێت، تیرۆر کردبێت، ئەوا تەنیا ١٠ مرۆڤ نەبوون وەک لە دانپیانانەکاندا دەگوترێت، بگرە دەیان و سەدانیشە.

دووهەم: ئەو سەربڕین و نێربازییەی "شێخ زانا" لەگەڵ گرووپەکەی و قوربانییەکانی کردوویەتی؛ گرووپەکەی ئەبوو تەبارەک لە موسڵ و سەید عەباس لە بەعقوبە و فەلوجە، شێخ ئیبراهیم لە کوت و حللە هەمان شتیان کردووە، تەنانەت هەندێ گرووپی ئیسلا می کە هەبوون وەک" نەهێشتنی جیاوازی چین و نەتەوە و ڕەنگ - برایەتی"، بێتە مەیدانەوە، بۆیە ناتوانیت لەمەودوا، لە جیهاندا هێزیکی ئیسلامی ببینیت کە میانڕەو بێت و تەنیا لە ڕێگەی وتووێژ و لێکتێگەیشتنەوە بانگەشە بۆ ئیسلام بکات، ڕاستە لە کوردستاندا هەندێ لایەنی ئیسلامی خۆیان بە نەرم نیشان دەدەن بەڵام ئەمە مەسەلەی کاتە و داکۆکی کردنیشیان لە "شێخ زانی" و پاساوهێنانەوە بۆی، سەلمێتەری ئەم بۆچوونەیە.

پێنجەم: کاتێک ئیسلام لە نیمچە دورگەی عەرەبەوە پەیدا بوو، عەرەب بتیان دەپەرست، لەشی ئافرەتەکانی خۆیان بە پارە دەفرۆشت، یەکتریان تالان دەکرد و دەکوشت، بۆ چەسپاندنی ئەم ئایینە نوێیە، لەو کاتەدا؛ پێویست بە شەڕی بەرگریکردن و بە پێی توانا هێرشکردنیش بوو کە لە دواییدا بە "جیهاد" ناونرا بەڵام کاتێک ئەم ئایینە نوێیە لە دورگەی عەرەبدا جێگەی خۆی گرت و بوو بە سیستەمی بەڕێوەبردن ئیتر جیهاد و زیادەڕۆیی شەڕ، هیچ واتایەکی نەما، ئایەتی" الیوم أكملت لكم دينكم وأتممت عليكم نعمتي و رضيت لكم الاسلام دينا" واتە ئەمڕۆ ئاینەکەتانم تەواو کرد و گەیاندمە ئامانج، نیعمەتی خۆم بەسەردا بەخشین، لێتان ڕازیم کە ئیسلامتان کردووە بە ئایینی خۆتان". تەواو ئایین چەسپا و گەیشتە ئامنجی خۆی، کەموکوڕی تیا نەماوە، ئیتر هەموو کەس خۆی چاکە و خراپە دەزانێ، کێ دەخوازێت با باوەڕ بهێنێت، کێ کفر دەکات با بیکات؛ بەڵام دواتر خەلیفەکانی ئیسلام هەر دوای کۆچی پەیامبەر، بۆ فراوانکردنی دەسەڵات؛ کەوتنە کوشت و بری یەکتری و تا ڕووخانی دواهەمین خەلافەتی ئیسلامیش، کۆڵەکەی هەرە بەهێزی ئەو خەلافەتە، شەڕ بوو.

شەشەم: لایەنگرانی هەر ئایینێک تێدەکۆشن بۆ ئەوەی ئەم بیر و باوەڕە نوێیە بە دەوری خۆیاندا بڵاوبکەنەوە کاتێک جیاواز بێت، بەڵام ئەمڕۆ دەبینین لەناو خودی کۆمەڵگەئیسلامییەکاندا کە هەموو موسوڵمانن؛ کۆمەڵی جیهاد، ئیسلام، دەعوە، نەهزە دادەمەزرێن. یەکەم کاری ئەم کۆمەڵانەش، بە کافرکردنی دەوڵەت و کۆمەڵگە و هەموو شێوازیکی شارستانییەتە، سڵ لە هیچ تاوانێکیش ناکەنەوە و خودا و فەرمانەکانی لە خواست و خەیاڵ و داواکارییەکانی خۆیاندا بەرجەستە دەکەن. پێش چەند ساڵێک، بڕوای زۆرینەی خەڵک وابوو کە ئەو قەتڵ و عام و سەربڕینەی جەزائیر؛ هێزە ئەمنییەکانی دەوڵەت بوون و ئیسلامییەکان نەبوون، بەڵام ڕووداوەکانی چیچان و سعودییە و عێراق تەمی ئەو گومانەی ڕەواندەوە و ئەوەی سەلماند کە ئیسلامی سیاسی هەموو کارێک دەکات.

حەوتەم: سەرچاوە دارایییەکانی تیرۆر لە جیهاندا، بە شێوەی ڕاستەوخۆ یان ناڕاستەوخۆ ، سەران و دەوڵەتانی "کەنداو"ن، ئەم دەوڵەتزکانە لە ڕووی پێشکەوتنی کۆمەڵایەتییەوە دواکەوتووترین کۆمەڵگەی مرۆڤایەتین.

دەتوانرێت لە ڕێی گوشاری سیاسییەوە، سەرچاوە دارایییەکانی تیرۆریستانی ئیسلامی وشک بکرێت بەڵام ئەستەمە بگەیتە سەرچاوەکانی نەخشەدانان و ئەوانەی لە پشت ئیسلامی سیاسییەوەن، نازانیت خودی"سی ئای ئەی"ە یان "مۆساد"ە چونکە بڕەو پەیداکردنی ئەم جۆرە ئیسلامە، ڕاستەوخۆ لە بەرژەوەندی ئەواندایە. ■■■

میسریش بۆ بە چۆکداهێنانی قیپتییەکان و ئیسلامکردنیان، بێهۆشکردن و فیلمیان بەکارهێناوە.

سێیەم: ئەمە عەقڵی "شێخ زانا" نییە خەڵک بۆ ماوەی دوور و درێژ و داهاتوو، ئامادە بکات، قوتابی بنێرێتە کۆلێژی پۆلیس و دوای دەرچوونی بیخزێنێتە دەزگای ئاساییشەوە، مامۆستای زانکۆ و قوتابی و فەرمانبەر بۆ پارچەپارچە کردنی مرۆڤ تەسخیر بکات. ئەمە عەقڵێک و نەخشەیەکی مخابەراتی گەورەی لە پشتەوەیە، ڕاستییەکەش لێرەدایە؛ خودی "شێخ زانا" پێش گرووپەکەی بە هەر شێوازێک بێت، کاری سێکسی لەگەڵدا کراوە و بە هەموو شێوازەکان لە هەست و وێژدانی مرۆڤانە دایانماڵیوە و کردوویانەتە ڕۆبۆت، ئینجا وانەشیان داداوە کە چۆن خەڵکی خۆی ئاسا پەروەردە بکات. هەموو توانایەکی دارایی و لۆجیستیشیان خستووەتە بەردەستی، بە هۆی ئەو توانا دارایییەشەوە؛ بە کەسێکی خاوەن کەسایەتی و بەرچاوی کۆمەڵگە، نیشانیان داوە.

چوارەم: ئەوەی لە پشتی پەردەوە کار دەکات و ئەم جۆرە ڕۆبۆتانە بەرهەم دەهێنێ، ناهێڵێت جارێکی دیکە هیچ هێزێکی ئیسلامی لەسەر لایەنی ئەو چەمکە باشانە

# پێکەنینەکانی زاهیر ڕۆژبەیانی!

ئەردەڵان جەمال

هەر لە منداڵییەوە خوویەکم بە خۆمگرتووە و، تا ئیستاش نەمتوانیوە خۆمی لێ ڕزگاربکەم. لەوەتەی لە بیرمە حەزم لە ناوگۆڕین یان وەرگێڕانی ناوێک لە زمانێکەوە بۆ زمانێکی دیکە، هەڵبەتە چەندین جار لەسەر ئەم خووە، تووشی سەرئێشە و گیروگرفت بوومەتەوە، بەڵام هەر وازم نەهێنا! هەر لەم ڕووەوە، ساڵانێک لە ڕۆژنامەی"برایەتی" لە هەولێر کارم دەکرد و، هەر لە پۆلیسی دەرگاکەی دەرەوە بیگرە تا دەگات بە بەرپرسی دەزگا ناوی هەموویانم گۆڕیبوو و، لە ناو ئەو کەسانەی کە نزیکبوون لێمەوە ئەو ناوانەمان دەگوتەوە بۆ خۆشی و کات بردنەسەر، بۆ نموونە ناوی نەبەز ڕۆستەمم بۆ"لاشحم" و ناوی دڵشاد وەسانی بۆ"قلب فرحان" و ناوی عیزەدین ڕەزا بۆ"سەروەری ئایین" و ناوی فەرهاد محەمەد بۆ"کۆلن پاول" گۆڕیبوو. بەڵام هاوڕێی خۆشەویست"نورەدین سەعید وەیسی"، کە ناویم بۆ"تریفەی ئایینی بەختەوەر"گۆڕیبوو. کاتێک بەم ناوانەی زانی خۆی پێ نەگیرا و، لە یەکێک لە ساڵیادەکانی دەرچوونی"برایەتی"دا، ئاشکرایکرد. ئیدی وەک باران براوەڕانی نووسەر و ڕۆژنامەنووس و کارمەندانی برایەتی داباڕین و، هەر یەکێک و، داوای ناوی خۆی لە من دەکرد! هەرچەندە دەبێت ئەوەش بڵیم کە هەندێک لەو ناوانە ڕووی مەجلیسیان نییە! بۆیە ناچاربووم وەڵامی ئەو جۆرە کەسانە نەدەمەوە. لەو کاتەدا، کاک "زاهیر ڕۆژبەیانی"، سەرنووسەری برایەتی بوو. کاتێک ئەم بەزمەی بیست زۆر پێکەنی و وایزانی خۆی و، بەرپرسی دەزگا بەدوورن لەم ناولێنانە. هەر بۆیە خێرا خێرا دەینارد بە دوای ئەم و ئەودا تا ناوەکانیان ببیستێت و، تێر بە دڵی خۆی پێبکەنێت. تا ناردبووی بە دوای هاوڕێی نزیکم"عیزەدین ڕەزا" و، بەدەم پێکەنینەوە پێی وتبوو: ناوی تۆ چییە عیزەدین؟ بەڵام کاک عیزەدین لە بری ئەوەی ناوەکەی خۆی پێ بڵێت پێی وتبوو: ئەی تۆش ناوەکەی خۆت دەزانیت؟ لێرەدا زاهیر ڕۆژبەیانی حەپەساو وتی: بۆچی ئەو قورمساغە ناوی منیشی گۆڕیوە؟ عیزەدین لە وەڵامدا پێی وتبوو: ئەی بۆ تۆ چیت لەم خەڵکە زیاترە؟ ئینجا ناوەکەی پێ وتبوو کە"ڕووالەت"بوو و، هیچ کەسێک لە برایەتی بەو ناوە نەبوایە کاک زاهیر ڕۆژبەیانی نەدەناسی! ■■■

## پەیامی کورد ئامادەی بڵاوکردنەوەی ریکلامەی بازرگانی و بروسکەی پیرۆزبایی و پرسەنامەیە بەنرخێکی گونجاو

### کاوڕ ٣.٢١ تا ٤.٢٠



ئەم هەفتەیە زۆر چالاک و گورج و گۆڵیت و، بەو هۆیەشەوە، دەوروبەرەکەت هەست بە بەختەوەری دەکەن، بەرپرسیاری تازە دەگرێتە ئەستۆت دوو دڵ مەبە.

### گا ٤.٢١ تا ٥.٢٠



پارەت زێتر دەبێت و خەونەکانت بەر لە کۆتایی هەفتە جێبەجێ دەبن، بارودۆخ هێشتا گونجاوە بۆ تۆ، شتی تازە دەکڕیت.

### دوانە(جمک) ٥.٢١ تا ٦.٢١



دەوروبەرەکەت ئەوەندە بایەخت پێ نادەن و، هەر بۆ خۆت خەریکی چارەسەرکردنی گیروگرفتەکانت دەبێت، هەوڵ بدە کەسانێکی دڵسۆڕ ڕاوێژکارت بن.

### قژاڵ ٦.٢٢ تا ٧.٢٢



هەندێ لە هاوڕێکانت چارەسەری هەندێ کێشەی تۆ دەکەن، بایەخ بە پەیوەندییە کۆمەڵایەتییەکان زێتر بدە.

### شێر ٧.٢٣ تا ٨.٢٢



ئەوەندە بە توانای خۆت مەنازە و، تۆزێکیش ئارام بە لە هەڵس و کەوتدا، چونکە ئەم پەلە پەلەت تووشی ئەنجامێکی خراپت دەکات.

### فەریک ٨.٢٣ تا ٩.٢٢



ئەوەندە خۆت بە ڕابردووەوە مەبەستەوە و، بیرێک لە داهاتوو بکەرەوە، لەم ماوەدا، کەسانێکی تازە دەناسیت و، سوودیان لێ وەردەگریت.

### تەرازو ٩.٢٣ تا ١٠.٢٢



زۆر بە قوڵی بیر بکەرەوە و، شتەکان ئەم دیو و ئەو دیو بکە، ئینجا بڕیار بدە، تۆ زۆر باوەڕت بە خۆت هەیە و، هەر بەو هۆیەشەوە پەلە دەکەیت لە کارەکانتدا.

### دوو پشک ١٠.٢٣ تا ١١.٢١



پەیوەندییەکی سوزداری گرنگ بە ڕێگاوەیە بۆ ئەوانەی هاوسەریان نییە، باری دارایێتان بەرەو باشتر دەڕوات. ئەوەندە گوێ لە قسە و قسەلۆک مەگرە.

### کەوان ١١.٢٢ تا ١٢.٢١



بەختت لە منداڵەکانتدا وەک بەختی ئەو کەسانەیە کە هەمیشە شووتییەکانیان سپی دەردەچێت، ناوچاوانت وای هێناوە ، بایەخ بە خۆت بدە.

### گیسک ١٢.٢٢ تا ١.١٩



ئەوەندە ڕەق مەبە لە گفتوگۆ و ماسەلەکردنی جیاوازدا، بەخت یاوەرتە و ئەگەری ئەوە هەیە دەرفەتێکی خۆشەویستی تازەت بۆ بڕەخسێنێت.

### سەتڵ ١.٢٠ تا ٢.١٨



لە بواری خێزانیدا زۆر شادمان دەبیت، لە بواری کاریشدا، هەندێ گرفت بە ڕێوەیە بەڵام زاڵ دەبیت بەسەریاندا.

### نەهەنگ ٢.١٩ تا ٣.٢٠



ئەوەی کە لەم ماوەیەدا دەستت دەکەوێت، شتێکی کاتییە و، تا سەر بەردەوام نابێت، چاکتر وایە ژیرانە بیر لە ژیانی خۆت بکەیتەوە.

# فیلمێکی دۆکۆمێنتاری لەسەر تاوانەکانی رژێمی بەعسی عێراق دژی گەلی کورد لە جەنگی بەناو ئەنفال




دەرهێنەری کوردستانی مانۆ خەلیل، کاری وێنەیی و دەنگی تەواوکردوە بۆ فیلمە دۆکۆمێنتارەکەی (ئەنفال، بەناوی الله، بەعس و سەدام) دوای هەوڵ و کارێکی زۆر، کە بەدواگەڕان و کاردنی ئەم بەرهەمە کە ئەبێتە دۆکۆمێنتێکی مێژوویی دربارەی تاوانی ڕێکخراوەیی و ئیرهابی دەوڵەتی ڕەسمی، نزیکەی دوسااڵ و زیاد لە سێ هەزار سەعات کاری بەردەوامی خایاند.

فیلمەکە لە بەرهەمهێنانی هاوبەشی دەرهێنەر و تەلەفزیۆنی سویسری کەناڵی ئەڵمانیە، ماوی فیلمەکە سەعاتێکە و وەرگێڕاوەتە سەر زمانەکانی ئەڵمانی و فەرەنسی و ئینگلیزی.

فیلمی ئەنفال باس لەو جەنگە ئەکات کە سەدام لە دوای شکستی لە جەنگی یەکەمی کەنداو دژ بە گەلی کورد رایگەیاند کە کۆرە مامەکەی عەلی حەسەن مەجید سەرپەرشتی جەنگەکەی دەکرد، کە لە ناو کوردستان و جیهاندا بە عەلی کیمیاوی ناسراوە، زۆر بەسووکی ناوی سوورەتی هەشتی لە قورئان بە ناوی ئەنفال هەڵبژارد بۆ ناوی جەنگەکەی ناوی نا "جەنگی ئەنفال"، ئەنفال سوورەتێکە کە بۆ پەیامبەری موسوڵمانان و عەرەبی محەمەد دابەزیوە، سەرتە باس لە دابەشکردن و بە تاڵانبردنی غەنیمەی جەنگ لەلایەن ئەسحابە یان ئیماندارانەوە دەکات.

سەدام حسین لە کۆتایی هەشتاکاندا فەرمانی دامەزراندنی عەلی کیمیاوی خوێنڕێژ بە حاکمی موتلەق بۆ ناوچەی کوردستان، دەرکرد، ئەم خوێنڕێژە سادیە علی کیمیاوی و عەسابەکانی موخابەرات وسوپا، توند و تیژترین ڕەفتاریان بەکارهێنا دژ بەگەلی کورد کە نتوانرێت وەسف بکرێ، منااڵیان و پیر و پیوانیان کوشت و ژنانیان ئیغتیساب کرد و پیاوانیان بەزیندوویی خستە گۆڕی بەکۆمەڵەوە.

خێزان و گوندییەکانیان بەتەواوی ڕاپێچی قەاڵ سەربازیەکان کردن، بەتایبەتی بۆ ناوچەی بیابانی نوگرە سەلمان، کە لەوێ سەگەکان گۆشتی مردوەکانیان ئەخوارد بەبەرچاوی کەسوکاریانەوە،منااڵن لەبرسا و تینواندا لە باوەشی دایکیاندا ئەمردن، ئەو تاوانانە بەربەرچاوی رژێمە عەرەبیەکانەوە بەشدارە لە تاوانەکانی سەدام و ئەیەوێ ئەو بەشداریە داپۆشێ.

لەناو فیلمەکەدا کۆمەڵێ دۆکۆمێنت و دەلیلی ترسناکی تێدایە لەسەر پیادەکردنی و پیلاندانان بۆ کوشتنی عەمدی و ڕەسمی لەلایەن بەعس و موخابەراتەکەیەوە، کە ئەوە بەسە (ئەگەر ڕۆژێ دەلیلەکان بڵێم) کە ملی سەدام حسینی تکریتی و دارو دەستەکەی بخرێتە بە سێدارەدان، فیلمەکە ئیدانەی ڕژێمی بەعس و دەزگا ئەمنیەکانی دەکات.

ئەگەرچی فیلمەکە بە شێوەیەکی سەرەکی باسی ئەنفال ئەکات، بەاڵم ئەوەی لەبیر نەکردوە کە باسی جێبەجێکردنی تاوانەکانی تری ڕژێمی بەعس ئەکات لە زیندانەکاندا لە ئازاردانی زیندانیە سیاسیەکان وتاوانی کیمیاباران‌کردنی هەڵەبجە، کە ئاساوارەکانی ئەو کیمیاوییە ئا ئەمڕۆ ماوە و تاچەند قەرنێکی تریش دەمێنێ.

فیلمەکە تیشک ئەخاتە سەر ئەو جەنگەی کە قوربانییەکانی زیاد ١٨٢٠٠٠مرۆڤی کوردە و وێرانکردنی ٤٥٠٠گوندی کوردستان و بەشدارە لە تاوانەکانی سەدام و ئەیەوێ ئەو بەشداریە داپۆشێ.

لەناو فیلمەکەدا کۆمەڵێ دۆکۆمێنت و دەلیلی ترسناکی تێدایە لەسەر پیادەکردنی و پیلاندانان بۆ کوشتنی عەمدی و ڕەسمی لەلایەن بەعس و موخابەراتەکەیەوە، کە ئەوە بەسە (ئەگەر ڕۆژێ دەلیلەکان بڵێم) کە ملی سەدام حسینی تکریتی و دارو دەستەکەی بخرێتە بە سێدارەدان، فیلمەکە ئیدانەی ڕژێمی بەعس و دەزگا ئەمنیەکانی دەکات.

ئەگەرچی فیلمەکە بە شێوەیەکی سەرەکی باسی ئەنفال ئەکات، بەاڵم ئەوەی لەبیر نەکردوە کە باسی جێبەجێکردنی تاوانەکانی تری ڕژێمی بەعس ئەکات لە زیندانەکاندا لە ئازاردانی زیندانیە سیاسیەکان وتاوانی کیمیاباران‌کردنی هەڵەبجە، کە ئاساوارەکانی ئەو کیمیاوییە ئا ئەمڕۆ ماوە و تاچەند قەرنێکی تریش دەمێنێ.

فیلمەکە تیشک ئەخاتە سەر ئەو جەنگەی کە قوربانییەکانی زیاد ١٨٢٠٠٠مرۆڤی کوردە و وێرانکردنی ٤٥٠٠گوندی کوردستان و

**دڕێژەی ئەسعەد عەدۆ....**

کوردەواری، ئەرکی سەرشانی هەموو کوردێکە لە دەوروبەری سەرۆکایەتی هەرێم کۆببینەوە بۆ گەیشتن بە مەبەست لە هەموو ڕوویکەوە، تاوانباری ئەوکەسەی پشتگیری ئەو تاقیکردنەوەیە ناکات، هەروەها ئومێدی ئەوەش دەکەم هێزا بارزانی دەوری سەرۆک و براگەورەی نەتەوەی کورد بگێڕێ، پێشەکی حەز بەوە دەکەم گەورەترین بیناسازی کۆشک و تەاڵرێکی یەکجار گەورە و بەنرخ بۆ سەرۆکی هەرێم بکرێ تاکوو ببێتە مێژوو لە نێومێژووی کورد، واتە ئەگەر منداڵێک لەم کاتەدا لە دایک بوو، بڵێین کاتی تەاڵری سەرۆکایەتی هەرێم دامەزرا لەدایک بوو، حەز بەوە دەکەم کارمەندانی نێو ئەو تەاڵرە هەموو چین و تۆیژێک لە خۆبگرێت تا پڕ بە پێست ببێتە مااڵی کورد، هەرمیللەتێک براگەورە یان دەمراستێکی نەبێت میللەتانی دیکە ڕێزی میللەتی بێ برا گەورەناگرن، واتە پێویستە هەموو کورد ڕێز لە تەاڵر و مااڵی کورد و بڕیارەکانی ئەو سەرۆکە بگرن، جا هەر یەکێک بێت.

وابزانم پێویست ناکات لەم بارەیەوە قسە بکەین چونکە هەڵبژاردنی سەرۆکی هەرێم گۆمی مەندی گۆڕەپانی کوردستانی گەورەی هەژاند.

**پ: هۆکاری دواخستنی بریاری ٥٨ دەگەڕێتیەوە بۆچی؟**

**و:** بمانەوێ و نەمانەوێ، ئێمە لە شەڕداین، شەڕی پیرۆزی گەیشتن بە مافی کورد، شەڕ بە مانای دیپلۆماسیەت.

گەورە و بچووکی کورد حەز بەوە دەکات ئەو پێکهاتنانەی نێوان ئێمە و خەڵکانی دیکەی عێراق بێ گیروگرفت جێبەجێ بکرێ، پاشەکشەکردن لە الیەن تەرەفی دیکە کارەسات و مااڵوێرانی بۆ کورد دێنن.

تا بۆمان دەکرێ تا سیاسەت ڕێگەمان دەدات دەبێ پێ داگرین لە نێوان ئەم و ئەو ڕێککەوتن و حیواری دیکە دێتەمەیدان، واتە بە هەرشێوەیەک بێت، کەرکوک و شوێنەکانی دیکە مواڵکی کوردە بۆ خاتری کەرکوک بارزانی نەمر سەری بەرزی لە غوربەت نایەوە.

**پ: لەگەڵ هەنگاونانمان بەرەو فیدراڵی، بوونمان بەعێراقی دەسەڵمێنێ ؟**

**و:** ڕاستە ئێمە و مانان، لێرەوڵەوێ گوێ لە بیروبۆچوونی جیاجیا دەگرین دەربارەی دواڕۆژی کوردستان، من لێرە تەنیا دەست بۆ سیاسەتی حەکیمی کورد مەسعود بارزانی ڕادەکێشم دەربارەی ئومێد و ئاواتی کورد لە ئەمڕۆ و دواڕۆژدا.

**پ: تاچەند گەشبینی بە پاراستنی دەسکەوتەکانمان لە عێراقێکی فیدراڵدا ؟**

**و:** سیاسەتی ئەمڕۆ وەک سیاسەتی ڕابرردوو نییە، هەر ڕێککەوتنێک لە نێوان ئێمە و بەشەکانی عێراقی بە ئامادە بوونی وڵاتان و ڕێکخراوی جیهانی دەبێت، هەروەها نووسینەوەی دەستوور لە هەر وڵاتێکدا زەمانەتی ژیان و دواڕۆژی ملەتی ئەووڵاتەیە.

**پ: دوای شەهیدکردنی شوان سەید قادر ئاڵۆزی وتوندوتیژی زیاتر بەرامبەر کوردانی پارچەکانی تری کوردستان کرایەوە، پێت وا نییە ئەمە سەرەتایەک بێت بۆ ڕاپەڕینێکی سەرتاسەری کوردان؟**

**و:** من بە پێچەوانەی دەزانم، چار نییە ئەمڕۆش نەبێ پێویستە ئەو ئاگرەش بکاتە کوردستانیەکانی تر، لەکاتی خۆیدا بازرگان هەرقازانجێکی بکردایە تەنیا خۆی دەیخوارد، ڕۆژگاری ئێستا گۆڕاوە قازانج پێویستە لە سەر زۆر الیەن دابەش بکرێت، ئەم سەدەیە،سەدەی کوردە (انشاالله).

**پ: دوا وتەت بۆ هەفتەنامەی پەیامی کورد چییە؟**

**و:** ئومێد دەکەم پەیامی کورد بە هەموو مانایەک پەیام بێت، کات ماوە قسەی لەسەربکرێ ،چونکەسەرەتای ژیانەتی. ■■■

بەتاڵانبردنی سەروەت و سامانیان.

(لە ڕابردودا سەدام حسین دەستی هێندە درێژ بوو کە گەیشتبووە بینەقاقامان ،هەرچی بویستایە بەرامبەر بە ژنانمان و منااڵمان و سەروماڵمان ئەیکرد و ئێمەش دەسەاڵتمان نەبوو و بێهیوابووین، بەاڵم ئەمرۆ ئازادین و قەدەرمان لەدەستی خۆماندایە و ئامادەین پارێزگاری لە شەرەف و خاکمان بکەین، سەد پیاومان ئامادەی قوربانیە بۆ پاراستنی ژنێکمان ئەگەر کەسێک بیەوێ ئەتکی بکات .. ڕێگە نادەین جارێکی تر هیچ کەسێک دەستمان بۆ درێژ بکات...) وتەی برای یەکێک لەو کچانەی کە ڕەوانی میسریان کردووە.

فیلمەکە تەنها باس لە ئازار و ڕابردووی مەینەتیەکانی گەلی کورد ناکات بۆ ئەوەی قەرەبوو بکرێتەوە، بەڵکو هەوڵ ئەدات ئاگاداری جیهانی ئازاد بکات کە نازیەیەتی ئەڵمانی لەڕیشە هەڵکێشراو کرایە ڕێکخراوێکی ئیرهابی قەدەغە و ترسناک دژ بەمرۆڤایەتی، بەاڵم هەمان نازیەت سەری هەڵداوتەوە لە عێراق و سوریا بەناوێکی ترەوە بەناوی حیزبی بەعسی عەرەبی سۆسیالیستی، لەگەڵ ئەوەی کە بەعسی عێراق بوو بەڕابردوو بەاڵم ئەو حیزبە تیرۆریستە ئێستا لەسوریا دەسەاڵتی بەدەستە؛ هاوشێوەی دەسەاڵتی سەدامە و ڕۆژێک سڵ لەوە ناکاتەوە کە جەنگێکی تر دووبارە بکاتەوە و ناوی بنێت ئەنفال.

ئەم فیلمە لەدوای پشوی هاوین ئەچێتە قۆناغی پێشاندان و پێشکەشکردنەوە ،هەروەها بەشداری ئەکات لە فێستیڤاڵە سینەماییە جیهانیەکان و لە کەناڵە تەلەفزیۆنەکانیش پێشان ئەدرێت. ■■■

**کاتی نیشاندانی فیلم: ڕۆژی یەک شەممە 25/9/2005 کاتژمێر 20:00 لە شاری بێرن - سویسرا**

Schlachthaus Theater
Rathhausgasse.22
Bern - Schweiz



## پەیڤ...

نووسینی: شیرەس عایەن

### سیستمی کۆتا و مافی سیاسی ژن

بە پێی هەواڵەکانی ناوەوەی عێراق بەم دواییە شیعە پێشنیارێکیان پێشکەش کردووە بۆ پەرلەمانی عێراقی گوایا ئەوان داوا دەکەن تەنها دوو خولی پەرلەمانی کار بە سیستمی کۆتا بکرێت کە تایبەتە بە بەشداری سیاسی ژنان و نوێنەرایەتیان لە پەرلەمانی عێراقیدا بە شێوەیەک ژنان بە ڕێژەی ٢٥٪ بەشداری حوکم بکەن لە حکومەتی عێراقیدا، لەگەڵ دەستپێکردنی خولی پەرلەمانی سێیەم کار بەو سیستمە نەکرێت. هەتا ئێزە ئەوەی ئەو هەواڵە بخوێنێتەوە ڕێک دەڵێ : شیعە داوا دەکات سیستمی کۆتا لابرێت و یەکسان بێت بە پیاو، بەڵام بەداخەوە زۆر بە پێچەوانەوە ، بەم سەدەی بیستوویەکە شیعە داوای سەدانەوەی هەموو مافەکانی ژن دەکات و کۆشش دەکات لە پێناو گێرانەوەی ژن بۆناو ماڵ و تەنها خەرێک بێت بە منداڵ بەخێوکردن و کارو باری ناو ماڵ، ئەو داواکارییەی شیعە نەک تەنها ماف لە ژن ئەسەندێتەوە بەڵکە مەترسی هەیە بۆ سەر دوارۆژی کورد و کەمە نەتەوەکانی تری ناو پەرلەمان، چونکە شیعە بەبانگی ئاشکرا بانگەشە بۆ سیستمێکی تری شمووڵی دیکتاتۆری تر دەکات، تا بتوانێت ڕێگە لە هەموو سەربەستی و ئازادیەکان بگرێت بەڵام ئەمجارەیان بەناوی ئایینەوە، تەنانەت ئەو ژنانەشی دایناون لەناو پەرلەماندا و پێچراوتەوە لە عەبای ڕەشەوە هیچی گوزارشت لە مافی ژنان ناکەن بە هێندی ئەوەندەی گوزارشت لە مەزهەبەکەی خۆیان ئەکەن، شیعە توندڕەوەکان هەموو تواناکانی خۆیان خستوتە گەڕ بە مەبەستی ئەوەی نەک هەموو مافەکانی ژن پێشێل بکەن، بەڵکە هەموومافەکانی کوردیش پێشێل بکەن و هەموو ئەو دەستکەوتانەی کورد لەو ١٤ ساڵەی ڕابردوو لە سەربەستی و ئازادی دەستی کەوتوون هەرهەمووی لەدەست بدات، بەڵام ئەوەی لە بیری شیعەدا نیە ئەوەیە کورد نەمرۆ میللەتێکی بەهێزە مومکین نیە جارێکی تر مافی پێشێل بکرێت، هەرگیز باوەڕم وانیە جارێکی کیمیایی بکرێ بە کوردا یان ئەنفال بکرێ، مەگەر ئێستا هەموو جیهان ئەمرۆ دۆستی کورد نەبێت..

یەکێ لەو کەسایەتیە بەناوبانگانەی ناوەندەکانی شیعە ئەیاد جەمال الدین، لێکۆڵەرەوە و سیاسەتمەداری ئیسلامی، ئەو ڕاتە ناسراوە بە بۆچوونە ئازاد و سەربەستەکانی ئەوەی پەیوەندی هەبێت بە سیستمی دەسەڵاتی نوێ لە عێراقدا، ئەو باوەڕی وایە سیستمی فیدرالی گونجاوترین و پێشکەوتووترین سیستمە لە جیهاندا کە زۆر لە وڵاتانی دونیا پەیڕوی ئەکەن، چونکە تەنها سیستمە لە دونیای سیاسەتی ئەمڕۆدا هەموو جۆرەکانی سەربەستیەکان زامن ئەکان، یەکێ لەو سەربەستی و ئازادیانە سەربەستی و ئازادی ژنە، ئەو ڕاتە لێکۆڵەرەوە ئایینیە هەرچەندە بە ڕووکەش و بە عەبا ڕەشەکەی شانیەوە لە پیاوێکی ئایینی تووندڕەو ئەکات، کەچی باوەڕی وایە ژن هیچی لە پیاو کەمتر نیە، ئیتر بۆچی بە ڕێژە بەشداری بکات لە دەسەڵاتی سیاسیدا ،ئەیاد جەمال الدین داوا دەکات ئەو ڕێژەیەی هەڵگیرێت و کاری پێتەکرێت چونکە ژن هیچی لە پیاو کەمتر نیە لەبەری کاری سیاسیەوە، ئەو باوەڕیشی وایە ئایینی ئیسلام مافی سیاسی داوە بەژن بەڵام ئەوانەی ئەمڕۆ لە عیراقدا ئایینیان بە سیاسەت تێکەڵ کردووە ئەوانە بە ئیجتیهادی خۆیان ژنیان دوور دەخەنەوە لە دەسەڵاتی حکومی و زۆربەی سەربەستی و ئازادیەکانیان لێ زەوت کردووە .

ئەو کاتەی لەگەڵ ئەو ڕاتە دانیشتم پێش ئەوەی بگەومە قسە لەگەڵی بە بیرمدا هات لەوانەیە ئێستا بکەوێتە مەوعیزە و سەرنەزەنشت کردنم بڕچی لەچک ناکەم و بڕچی نوێژ ناکەم و بڕچی پایەندی بنەما و ئەرکەکانی ئایینی ئیسلام نیم، کەچی ئەوەی سەرسامی کردم ئەوەبوو ئەو هەموو ئەوانەی من بیرم لێدەکردنەوە بە سەربەستی و ئازادی تاکەکەسی لەقەڵەم دەدات و وتی: من ژن بوم هەیە سەربەست بم لەو ڕیگەیەی بۆخۆمم هەڵبژاردووە، نۆش و هەموو کەس بزیان هەیە ئازاد بن لەوەی ئازادیە تاکە کەسیەکان بەرجەستە بکەن وەک ئەو ڕیگەیەی بۆ خۆتان هەڵبژاردووە، هیچ شتێک نابێت بە زۆرملێ بێت دەنا دەبمە دیکتاتۆر، و مفیش ئەمرۆ زیاد لە هەموو کاتێکی تر بانگەشەی سیستمێکی عیلمانی دەکەم بۆ عێراق بۆ ئەوەی هەموو کەس بە ئازادی سەربەستیەکانی بەرجەستە بکات، وەک سەربەستی ئەتەوەیی، فیکری، ئایینی و مەزهەبی، و تەنانەت ئاستی ژن لە عێراقدا بکاتە ئاستی ژنانی کوردستان و ژنانی جیهانی پێشکەوتووی دونیا. ■■■

# ئەسعەد عەدۆ
# لە بناری "زوورگەزراو"ەوە و هەواری هەڵدەداتەوە



**ساسان دەروێش - هەڵەدا** - پێم وانیە هیچ کەس، لە کوردستاندا گوێ بیستی قسە خۆشەکانی ئەسعەدعەدۆ نەبووبێ بە تایبەتی لە بەرنامەی کەلەپوورەوە یان بەرنامەی بەرئاگردانی ئیزگەی دەنگی کوردستانی عیراق کە دەنگ وسەدایەکی گەورەی هەبوو سەرنجی هەموو چین وتوێژەکانی کۆمەڵی کوردەواری بۆ تەلەفزیۆن وئیزگەڕاکێش کردبوو. کەسێکی هەڵقوڵاوی نێوکۆمەڵگەی کوردەواری بوو لە بەرهەدێ ئاشنایەتی پتەوی لە نێوان خۆی وخەڵکەکەیدا دروست کردبوو، لە دوای ڕاپەڕینیشەوە لە نێوەندی سیاسەت وراگەیاند ندا دەوڕێکی چالاکی گێڕا لە ڕۆژنامەکانی کوردستاندا بەتایبەتی (ڕۆژنامەی برایەتی) بەکۆمەڵێک وتاری سیاسی وکۆمەڵایەتی وگۆشەی خۆزگە ڕووپەڕی ڕۆژنامەکانی گەش دەکردەوە بۆ هەواداران، لە دوای لە چاپدانی کتێبێک بۆ شەهید (عومەراغا دۆڵەمەڕی) خۆی و خانەوادەکەی ئاوارەی هەندەران بوون.

لە دوای چەند ساڵ ژیانی تاراوگە و دوور لە کوردستان، سەرقاڵی کار و چالاکی پەناهەندە بوو، سەرەڕای چاپکردنی چوار کتێب ( لاوک وحەیران - لێکۆڵینەوە، شۆڕشی گوڵان، خۆزگەوشتی تر، لە کەلەپوورەوە، بیرەوەری تاڵ وسوێری دەربەدەریم )، هەرچەندە بەداخەوە لەو چوارساڵەی دواییدا جموجوڵێکی بەرچاوی نەبوو، لە بەرئەوەی گوێ بیست بووین دەیەوێ لە دوای سەقامگیری بارودۆخی کوردستان و هەڵبژاردنی سەرۆکی کوردستان، بە یەکجاری بگەڕێتەوە کوردستان، وەک جاران لە پیرە هەوڵێری پایتەخت لەگەڵ خەڵکی کوردستان، گوزەران بکا و خزمەت بە وشەی پیرۆزی کوردی و ڕۆشنبیریی وسیاسەتی وعبدالواحد"م هێنایە ستافی نووسینگە، تامانگی یەکی ١٩٩٣کە نووسینگە تێکەڵ بە ڕاگەیاندن بووە بۆ قۆناغێکی تر، هەر لەو مانگەدا ئێمە کاک زاهیر ڕۆژبەیانی و ئەسعەد عەدۆ و زادوق ئادەم بە سەرپەرشتی مامۆستا "حەبیب محەمەدکەریم" بناغەی ڕۆژنامەی ڕۆژنامەمان لە هەوڵێر دامەزراند، لە ١٩٩٣/٣/١خولی نوێ دەستی پێکردەوە، من وەک بەڕێوبەری نووسین دەست بەکاربووم تا لە دوای سوتاندنی ڕۆژنامەی برایەتی لە مانگی ١٩٩٤/١٢ ڕفێندرام، لە هەمان مانگدا لە ناخەوە تووشی نەهامەتی بوو م بۆیە لە١٩٩٥/١٠/٥ ڕێکەی هات و نەهاتم گرتەبەر نزیکەی ١٠ساڵە بە نائومێدی لە هەڵەدا دەژیم، بڕیار بوو لە ساڵی ٢٠٠١ بە یەکجاری بگەڕێمەوە کوردستان، بەڵام جارێکی دیکە تووشی کۆسپێکی یەکجار گەورەبووم لێرە، دەربارەی مەسەلەی دیکۆمێنتی پەناهەندەیی.

سوپاس بۆ خوا ئەوەتە لە دوای چوار ساڵ کارەکە جێبەجێ بوو، بۆیە بڕیارم دا بۆ هەتاهەتایی بگەڕێمەوە کوردستان هەر لەبەر ئەم گیروگرفتە بۆ چوارساڵ دەچێت هیچ جموجوڵێکم نەبووە!!!

**پ: ج هۆکارێک پاڵی پێوەنای بۆ گەڕانەوەی یەکجاریی بۆ باوەشی کوردستان ؟**

**و:** من دەمێکە بڕیاری گەڕانەوەم داوە، هەر وەکوو پێشتر باسم کردووە، بەڵام مەسەلەی دیکۆمێنتی پەناهەندەیی چوارساڵە گیروگرفتی بۆ دروست کردووم، دوابەدوای دامەزراندنی کابینەی خزمەتگوزاری دەبوایە ئێمەومانان بەشداربین و لەمەیدان ئامادەبووینایە، کەچی لە بەدبەختی خۆمدا کابینەی چواریش دامەزرا ئێمە لێی بێ بەش بووین، خوا یار بێ لە کابینەی یەکگرتوو لە کوردستان دەبین، ئومێد دەکەم ئەوەی بڵێی بتوانێ بەردێک لە سەر دیواری ئاوەدانکردنەوەی کوردستاندابنێ، هەروەها ئومێدیش دەکەم لەوێ بیروکراتیەت گیروگرفت بۆ پەناهەندە گەڕاوەکان دروست نەکات، هەروەکوو ئێستا لێرە و لەوێ گوێ بیست دەبین.

**پ: ژیانی تاراوگەچۆن هەڵسەنگێتی و دوارۆژیان چۆن دەبینی؟**

**و:** بەمەزندەی من تائێستاژیانی پەناهەندەیی بۆ ئێمەی کورد، ناخۆشە بە تایبەتی تەمەندارەکان، من دڵی ئەوەنیم کە بەشێکی زۆر لە کورد لە دەرەوەن، دەتوانێ ئەگەر ڕێکبخرێن سوود بەکێشەی کورد بگەیەنن، چونکە هەبوونی ڕەوەندێکی بزێو لە سەر خاکی ڕۆژئاوا لە نزیک مەڵبەندی قەرارگەی سیاسەتی جیهان بەهێزبێنن ! ئێمە نابێ گلەیی لەسیاسەتی حکومەتەکانی ڕۆژئاوا بکەین لەو کاتەی کەئێمە نەمان توانیوە ئازاری خۆمانیان پێ بگەیەنین، هەرکاتێک لە وڵاتێکی ڕۆژئاوا ڕەوەندێکی پتەو هەبوو دڵنیام حکومەتی ئەووڵاتە زیاتر دەتوانێ خزمەت بەکێشەی میللەتەکەمان بگەینێ" تەنیا بۆ زانیاری، کورد لە خەڵکی دیکە باشترن ئومێدی زیاتردەخوازین.

**پ: لەم هەل ومەرجەی ئێستادا، هەڵبژاردنی سەرۆکی کوردستان چۆن دەبینی؟**

**و:** دەربارەی هەڵبژاردنی سەرۆکی هەرێمی کوردستان، ئەوە خەونێکی دێرینەی هەموو ڕۆڵەیەکی کوردە، دەبوایە لە هەڵبژاردنی ١٩٩٢ بەئەنجام بگەیشتایە، ئێستاش نەچوە بچێ، ئەوەی ئەمڕۆ بۆ کورد ڕێکەوتووە تەنیا و تەنیا سوپاسگوزاری دەوێ، سەرەڕای بیر و بۆچوونی جیاجیا لەنێو کزمەڵگەی

**بۆ لاپەڕەی ٧**

کۆبکەینەوە!!!

لەدوای مۆرکردنی ڕێککەوتنی پارتی و یەکێتی لەساڵی١٩٩٨ زۆر لە برادەران دەزانن گوتم" لە نێو خاڵەکانی ڕێککەوتنەکەدا نەنووسراوە تەتبیعکردنی نێوان ڕەوەندی کورد بۆیە بە کمووکورتی دەزانم ئەگەر ئێمەی کورد ئاقڵ بین یەکگرییەن دەتوانین بڕژێینە سەرشەقامەکان مەڵبەندی قەرارگەی سیاسەتی جیهان بهەژێنین !

ئێمە نابێ گلەیی لەسیاسەتی حکومەتەکانی ڕۆژئاوا بکەین لەو کاتەی کەئێمە نەمان توانیوە ئازاری خۆمانیان پێ بگەیەنین، هەرکاتێک لە وڵاتێکی ڕۆژئاوا ڕەوەندێکی پتەو هەبوو دڵنیام حکومەتی ئەووڵاتە زیاتر دەتوانێ خزمەت بەکێشەی میللەتەکەمان بگەینێ" تەنیا بۆ زانیاری، کورد لە خەڵکی دیکە باشترن ئومێدی زیاتردەخوازین.

**پ: لەم هەل ومەرجەی ئێستادا، هەڵبژاردنی سەرۆکی کوردستان چۆن دەبینی؟**

**و:** دەربارەی هەڵبژاردنی سەرۆکی هەرێمی کوردستان، ئەوە خەونێکی دێرینەی هەموو ڕۆڵەیەکی کوردە، دەبوایە لە هەڵبژاردنی ١٩٩٢ بەئەنجام بگەیشتایە، ئێستاش نەچوە بچێ، ئەوەی ئەمڕۆ بۆ کورد ڕێکەوتووە تەنیا و تەنیا سوپاسگوزاری دەوێ، سەرەڕای بیر و بۆچوونی جیاجیا لەنێو کزمەڵگەی

**بۆ لاپەڕەی ٧**

**بەکوردی بدوێ، بەکوردی بخوێنە، بەکوردی بنووسە، بەکوردی بیربکەرەوە!**

## دیداری هەڵکەوت زاهیر لەگەڵ:

# هونەرمەند بەلچیم بیلگن



بەلچیم بیلگن یەکەم ئەکتەرێ کورد کە بەشداری ڤیستڤالّی (کان)ی کرد

**هەڵکەوت: ئەم کاتەت باش بەلچیم، خۆشحاڵم بە دیداری بەڕێزتان، پێم خۆشە لە نزیکەوە چەند پرسیارێک ئاراستەی بەڕێزتان بکەم بۆ ئاشنابوون بەکارە هونەرییەکانی تۆی ئازیز.**

**بەلچیم:** زۆر سوپاس بۆ تۆ هەڵکەوت، منیش خۆشحاڵم بە دیمانە لەگەڵ بەڕێزتان، دیارە بۆ خۆتان هونەرمەندن و کاری هونەری دەکەن، پێم وایە زیاتر دەتوانین لەزمانی یەکتری تێ بگەین، وەخۆشحاڵم بتوانم لە رێی بەڕێزتانەوە دەنگ و هەواڵم بگاتە بەر دەستی خۆێنەران.

**هەڵکەوت: بەشداربوونتان وەک ئەکتەرێک بۆ یەکەم جار لە سینەما چۆن هەڵدەسەنگێنیت؟**

**بەلچیم:** بەکارێکی گرنگی دەبینم بۆ خۆم و بۆ نەتەوەکەم و هیوادارم کەسی زۆر بێنە مەیدانەوە بۆ خزمەتکردنی هونەری کوردی، زۆر خۆشحاڵ بووم کارێکی وەک( کیلۆمەتر زیرۆ) بوو بە سەرەتام بۆ چوونە ناو دنیای هونەرەوە بە گشتی.

**هەڵکەوت: چۆن پاڵێوراوی بۆ "کیلۆ مەتر زیرۆ"؟**

**بەلچیم:** من لە ئەستەنبوڵ بووم لە شەریکەیەکی هونەری بە مەبستی کارکردن لە شانۆگەری، هونەرمەند "هونەر سەلیم" بۆ هەڵبژاردنی ئەکتەرێک هاتبوو، بۆ (کیلۆ مەتر زیرۆ)، بۆ ئەم مەبەستە وەک تاقیکردنەوە، نمایشی بەشێک لە نواندنی (بێ دەنگ)ی پێ کردم، خۆش بەختانە توانیم بە سەرکەوتووی نمایشی بکەم، لێرەدا هونەر سەلیم بۆ "کیلۆ مەتر زیرۆ" منی پەسەند کرد.

**هەڵکەوت: کاتێک پاڵێورای بۆ ئەم فیلمە هەست بەچی دەکرد؟**

**بەلچیم:** دیارە زۆر خۆش حاڵ بووم و پاشان "هونەر سەلیم" پێ ڕاگەیاندم که دەچینە کوردستان، بۆ من زۆر خۆش بوو کەتوانیم لە رێی ئەم فیلمەوە چاوم بە کوردستان بکەوێ.

هەڵکەوت: پاش تەواوبوونی کارەکەتان، ڕۆشتن بۆ ڤیستڤالّی (کان)، هەستت بە چی کرد؟

بەلچیم: سەرکەوتن لە دوای سەرکەوتن، بە هۆی یەکەم جارم بوو بەشداری فیلمێکی سینەمایی بیم، فیلمەکە کوردییە، پاشان ڕۆشتنی بۆ ڤیستڤالّی (کان) بۆ یەکەم جارە هونەری سینەمای کوردی بەشداری (کان ) بکات.

**هەڵکەوت: جگە لە دەرهێنەری کورد، بۆ کاری هونەری تر پێت ووتراوە کار بکەیت وەک ئەکتەرێک؟**

**بەلچیم:** بەڵێ بۆ چەند کارێک پێم وتراوە، من تائێستا بڕیارم نەداوە، لەوانە دەرهێنەرێکی(تورک)ە.

**هەڵکەوت: بیرت نەکردۆتەوە بەشداری زنجیرە دراماى تەلەڤزیۆنی بکەت ؟**

**بەلچیم:** تا ئێستا نەخێر، پێم خۆشە زیاتر لە سینەما بمێنمەوە.

**هەڵکەوت : وەک بیستومە دەنگت خۆشە، پێت خۆش نییە لە بەرهەمی داهاتووتدا گۆرانی بڵێیت؟**

**بەلچیم:** بەپێکەنینەوە، زۆر سوپاس، ڕاستی پێم خۆشە ئێمەش وەک میللەتانی دنیا دەوڵەمەند بین لە کارە هونەرییەکانمان، فیلمی جۆراوجۆر بکەین، بەڵام گەر کارێکی وەها ئامادە بێت، کاک هەڵکەوت بەڵێتم پێ بدەیت ئاوازی گۆرانیەکانم بۆ دابنێت.

**هەڵکەوت: بەو پەری خۆشحاڵیەوە ئامادەی هەموو هاوکارییەکم، ئێستا بەچی سەرقاڵی و پرۆژەت چییە؟**

**بەلچیم:** من سەرقاڵی خۆێندنم و بەنیازم گەر بوار هەبێت لە فەرەنسا بەڵێنێکی وام پێدراوە ،هیوادارم بتوانم.

**هەڵکەوت : زۆر خۆشحاڵ بووم بەلچیم گیان بۆ ئەم دیمانەیە.**

**بەلچیم:** سوپاس بۆ تۆ هەڵکەوت گیان و بۆ زەحمەتکێشانت و بەسەرکردنەوەمان چ بۆ من چ بۆ گشت هونەرمەندان. ■■■

## دراماتووسانی جیهان

مەهدی مجید جاف



### ٤٢ـ ئەلبێر کامۆ Alber Camus

ئەلبێر کامۆ، لە حەوتی مانگی نۆڤەمبەری١٩١٣دا، لە گوندی موندۆڤی لە ولاتی ئەلجەزائیر، لەدایکبووە. "لوسین کامۆ"ی باوکی لە بنچینەدا لە خەڵکانی"ئالزاس"ی فەرەنسا دەبێت. باوکی یەکێک دەبێت لە سەربازانی فەرەنسا و، لە شەڕی"مارن"دا، بە خستی بریندار دەبێت و دەمرێت. دایکیشی زەحمەتکێش و نەخوێندەوار و لە بنچینەدا ئیسپانی دەبێت. هەژاری ڕوویان تێ دەکات و دایکی بە ناچاری ژیانی منداڵەکانی و نەنکیان بە خزمەتکاری مسۆگەر دەکات و، کامۆ دەرواتە قوتابخانە و زۆر زیرەکانە دەست بە خوێندن دەکات، پاشان بە یارمەتی یەکێک لە مامۆستا دڵسۆزەکانی لە قوتابخانەی ناوەندی شاری ئەلجەزائیردا، دەست بە خوێندن دەکات. کامۆ لە تەمەنی سیازدە ساڵییەوە، دەست بە خوێندنەوەی بەرهەمەکانی"ئاندرێی ژید" و "مۆنتلان" و"ئەندرێی مالرۆ"دەکات، لە تەمەنی حەفدە ساڵیدا تووشی نەخۆشی سیل دەبێت. پاش دوو ساڵ حاڵی باشتر دەبێت و دەست بە خوێندن لە زانکۆی ئەلجەزائیر لە شاری ئەلجەزائیر دەکات. زۆڵم و زۆری فەرمانییە داگیرکەرەکان لە گەڵی جەزائیر و سەرهەڵدانی نازییەکان لە ئەورووپا دەبێتە هۆی دروستبوونی بزووتنەوەیەکی ڕۆشنبیری بۆ دژ بە فاشیزم کە لە لایەن هونەرمەندان"هێنری باربوس" و "ڕۆمین ڕۆلان"ەوە دروست کرابوو. ئەلبێر کامۆی پر هەست لە ساڵی١٩٣٢دا، پەیوەندییان پێوە دەکات و، دەبێتە هاوەڵنیگان. لە ساڵی١٩٣٤دا، ژن دەهێنێت و هەر پاش چەند مانگێک لە یەکتر جیادەبنەوە. لە کۆتایی هەمان ساڵدا، دەبێتە ئەندامی پارتی کۆمۆنیست و، دەبێتە لایەنگری شۆڕشگێڕە عەرەبەکان و پاشان دەبێتە سەرۆکی یانەی ڕۆشنبیری لە شاری ئەلجەزائیر. لە ساڵی١٩٣٧دا، واز لە پارتی کۆمۆنیست دەهێنێت و بۆ ماوەیەک لە زانکۆی ئەلجەزائیردا دەست بە خوێندنی فەلسەفە دەکات. لە دوایدا تیی شانۆی "تەگیپ" دروست دەکات و، شانۆنامەی "برایانی کارامازۆف" کە لە ڕومانە بەناوبانگەکەی دیستۆفسکییەوە ئامادەی کردبوو، لەسەر شانۆ نمایش دەکرێت. کامۆ ئەرکی ڕێژەسۆر و وەک ئەکتەریش ڕۆڵی ئیڤانیش لە شانۆگەرییەکەدا دەبینێت. پاشان لەگەڵ گروپی گەرۆکی ئەکتەرانی ڕادیۆی ئەلجەزائیر، دەست بەکار دەبێت و، پاش ماوەیەکی کەم لە ڕۆژنامەی"کۆماری ئەلجەزائیر"دا، دەست بەکار دەبێت. لە ساڵی١٩٣٧دا، کۆمەڵێک لە وتارەکانی بە ناوی"ژن و میرداریەتی"لە دوو تۆپی کتێبێکدا بڵاودەکاتەوە. لە ساڵی١٩٣٨دا، شانۆنامەی بەناوبانگی "کالیگوڵا"، دەنووسێت و، دەست بە نووسینی چەند وتارێک سەبارەت بە بزچوونی ڕێبازی "نیهودمیی"لە ئەدەبیاتدا دەکات و لە دواییشدا بە ناوی "ئەفسانەی سیزیف"ەوە بڵاوی دەکاتەوە. بەناوبانگترین بەرهەمی کامۆی مەزن ڕۆمانی "نامۆ"یە کە بە ڕاسپاردەی ئەندرێی مالرۆ لە ساڵی١٩٤٢دا، لەو کاتە کە فەرەنسا داگیرکراو دەبێت، بڵاودەکاتەوە و، پێشوازییەکی گەرمی لە لایەن خوێنەرانەوە لێ دەکرێت. لە پاش ئازادکردنی فەرەنسا، دەبێتە سەرنووسەری ڕۆژنامەی "ئەبەرد"، ئەلبێر کامۆ، هەمیشە دەیویست وەک فەرەنسییەکی جەزائیری بێت. لە ساڵی١٩٤٣دا، بە نووسەر و فەیلەسوفی بەناوبانگی فەرەنسی ژان پۆڵ سارتەر، ئاشنا دەبێت و، دەبنە هاوبیر و هاوپێشە یەکتر. ئەم ئاشنایەتییە تا ساڵی١٩٤٨، دڕێژە دەکێشێت. پاشان جیاوازی فەلسەفی و فکری لە نێوانیاندا پەیدا دەبێت. بەتایبەتی لە ساڵی١٩٥١دا، کاتێک کامۆ کتێبی "مرۆڤی ستەمکار"بڵاودەکاتەوە، سارتەر لە گۆڤاری "سەردەمە نوێیەکان"دا، ڕەخنەی زۆری لێ دەگرێت. ئەم بڕچوونە فەلسەفییە جیاوازەی نێوانیان تا ماوەیەک دەبێتە هۆی گفتوگۆی فەلسەفی و مشتومڕێکی زۆر. لە ساڵی١٩٤٤دا، شانۆنامەی "یە هەڵە نێگەیشتن" و لە ساڵی١٩٤٨دا، شانۆنامەی "دادپەروەرەکان"بڵاودەکاتەوە. شانۆنامەی "حکومەتی سەربازی"ناوبانگی کامۆ فرەتر بە جیهاندا بڵاودەکاتەوە و، ئەکادیمیای سویدی لە ساڵی١٩٥٧دا، خەڵاتی نۆبڵ لە ئەدەبیاتدا بە کامۆ دەبەخشێت. کامۆ جگە لەوەی شانۆنامە، چیرۆکیش دەنووسێت وەک "پشت و ڕوو" و "جەژنەکان" و "ڕیالیستەکان" و "تاعون" و "ڕووخان" و "هاوین". کامۆی نەمر لە تەمەنی٤٧ ساڵیدا، لە چواری مانگی ژانیوەری١٩٦٠دا، بە ڕووداوی ئۆتۆمبیل لە فەرەنسا گیانی لە دەست دەدات و ماڵئاوایی لە ژیان و هونەر دەکات. ■■■

**دڕێژەی ڕاپەڕینی ڕۆژهەڵاتی کوردستان....**

لاوانی کورد، چوار ئەفسەری هێزەکانی کۆماری ئیسلامی ئێرانیان کوشت.

لە لایەکی دیکەوە، کۆماری ئیسلامی ئێران لە ڕێی گۆڤاری "پرتو سخن"ەوە ئاگادارییەکی بۆ خەڵک بلاو کردووەتەوە تێیدا هاتووە کە:

کۆماری ئیسلامی بۆ پاراستنی خۆی، لەشکرێکی ئیستشهادی واتە خۆکوژی پێک دەهێنێ و هەر کەس دەخوازێت لەو لەشکرەدا بەشداربێت دەتوانێت خۆی ناونووس بکات، هەروەها لە ڕۆژی ٢٠٠٥/٨/٣دا سەرۆکی نوێی ئێران "ئەحمەدی نەژاد بە شێوەیەکی فەرمی دەست بەکار بوو، ئەمیش بۆی هەیە بێتە سەردەمێکی دیکەی بارگرژی نێوان کوردستان و کۆماری ئیسلامی چونکە ئەحمەدی نەژاد بەرواڵەت بە دیالۆگ و گفتوگۆ نییە و بە دوژمنێکی سەرسەختی دۆزی کورد ناسراوە.

بە پێی هەواڵی نێردراو لە بۆکان، دوای ئەوە کە لە شاری سەقز خۆپێشاندان بۆ پشتیوانی لە شارەکانی کوردستان وەڕێخرا وکاربەدەستانی ڕێژیم زەربەی گورچوو بڕیان لە لایان خەڵکەوە بەرکەوت، کاربەدەستانی ڕێژیم لە شاری بۆکان داوای هێزی یارمەتیدەریان کردوە و لەوە دەترسن سەرهەڵدان و خۆپێشاندان لەو شارە زۆر توندتر لە شارەکانی دیکە دەست پێبکات، هەر بۆیە ڕێژیم بە هێزێکی زۆرەوە لە میاندواو و ورمێ هاتوون و لە پاڵ هێزە سەرکوتکەرەکانی دیکەی دەوری بۆکان نیشتەجێ بوون و هەموو شوێنە گشتییەکانی ناو شار و دەوری شاریان گرتووە و ئیجازە بە خەڵک نادەن کە تەنانەت دوو کەسیش پێکەوە هاتووچۆ بکەن و لە ئاپۆرای خەڵک دەترسن و بە هێزێکی زۆرەوە لە شوێنە گشتییەکاندا گەشت و مانۆر دەدەن،

لە دڕێژەی ئەو بزووتنەوە ناڕەزایەتییەی کە شارەکانی کوردستانی گرتۆتەوە، ڕۆژی ٢٠٠٥/٨/٢ بازاڕییەکانی شاری مەیوان بۆ پشتیوانی لە شارەکانی دیکە، یەک پارچە دووکانو بازاڕیان داخست و بەم چەشنە هاوەردی و هاوپێوەندیی خۆیان لەگەڵ شارەکانی دیکەی کوردستان بۆ جارێکی دیکە ڕاگەیاند. ڕێژیم بە فشارهێنان بۆ یەکێتیی ئەسناف و خاوەن پاسارەکان زۆری هەوڵدا تا خەڵک دووکانەکانیان بکەنەوە، بەڵام نەیتوانی ئیرادەی لێبڕاوانەی بازاڕیەکانی ئەم شارە تێک بشکێنێ.

بە هۆی ئەم ڕووداوانەوە، کۆمیتەی ناوەندی کۆمەڵەی زەحمەتکێشانی کوردستان، داوا لە هەموو پارت و ڕێکخراو و خەڵکی بە شەرەفی کوردستان دەکات کە لە ڕۆژی یەک شەممە ڕێکەوتی ٢٠٠٥/٨/٧دا، پێکەوە مانگرتنێکی سەرتاسەری ئەنجام بدەن و خەلکیش دوکان و بازاڕەکان و کارگە و قوتابخانەکان دابخەن و کەس نەچێتە سەر کار. ■■■


## ڤیزای ئێران لە ماوەی یەک هەفتەدا

**ئاژانسی تۆریستی NEW PLAN**

ئێمە ئامادەی خزمەت کردنی هاوڵاتیانی کوردی عێراقین

**کوردستان لە ڕێگای تارانەوە**

**ڤیزای ئێران بۆ خێزانی پتر لە سێ کەس ١٢٠ € /کەس**

بلیت بۆ سەرتاسەری جیهان

حەجی "عمرە"

گەشتی توریستی بۆ سەرتاسەری جیهان

تاران لە ٣٢٠€وە

Thomas-Mann Str, 24
53111 Bonn
Germany
Tel.: 0049 (228) 180 24 34
Fax: 0049 (228) 180 24 38
E.Mail: info@newplan-travel.de
www.newplan-travel.de

# لەبەرامبەر کرانەوەکاندا، کە مەترسی لەپشتەوەیە.. ئیدارەی سلێمانی ناڕاستەوخۆ ڕێگە لە کاری سێسکی کراوە و لەشفرۆشی دەگرێت

## هەفتەنامەی هاوڵاتی:
## گردەکان وەک جاران بازاڕیان نەماوە..
## ئازادیە تایبەتییەکانی گەنجانی سلێمانی وردە وردە پێشێل دەکرێت.

لە بەرواجەوە ژمارەیەک ئۆتێل و ماڵی شەو لە سلێمانی کرانەتەوە و ژمارەیان گەیشتۆتە ٢٠ ماڵ. ئەمەش وایکردووە کە ژمارەی ئەو کچانەی کە بە شەو کار دەکەن زیاتر بێت. ئەو کچانەی کە لە ماڵەکان کار دەکەن، بەشێکیان لە ژێر فشاری خێزانەکانیانەوە کار دەکەن و بەشێکیشیان بە هۆی ئەوەی کە ئەو کارە بە قازانجترە لە کارکردن لە ئۆتێل و ماڵەکانی تر.

# ئەگەرەکانی جێبەجێ نەکردنی مادەی ٥٨

## لە دیدی نووسەرانی کەرکوکەوە

**چارەنووسی کەرکوکییەکان بەندە بە جێبەجێکردنی ماددەی ٥٨مەوە، هەر لە گەڕانەوەی ئاوارەکان و قەرەبووکردنەوەی زەرەرو زیانەکانیان و گێڕانەوەی زەوییە داگیرکراوەکانیان و گێڕانەوەی کەرکووک بۆ سەر حکومەتی کوردستان و سڕینەوەی ئاسەوارەکانی تەعریب و ساردکردنی برینەکانی خەڵکی کەرکوک لە هەر جێگایەک بن و ئاسوودەبوونی رۆحی پیرۆزی شەهیدان.**

**جێ بەجێ کردنی ماددەی ٥٨یش درێژەی کێشا و دەبوو نێستا هەموو برگەکانیشی جێبەجێ بکرابانا. بەڵام سەرباری ئەوەی کە تا ئێستا جێبەجێ نەکراوە ئەوتا باس لە دواخستنی دەکرێ بۆ دوای دەستوور، بۆیە بەپێویستمان زانی رای شەقامی کوردی لە کەرکوک وەربگرین. لەو بارەیەوەو بزانین خەڵکی ئاوارە و کەرکوکییەکان ئەگەر مادەی ٥٨ جێبەجێ نەکرێ چی دەکەن یا ئامادەن چی بکەن؟**

**ئەحمەد عەلی:**

ئەگەر مادەی ٥٨ جێبەجێ نەکرێ و هەقی ئێمەی کەرکوکی نەدرێ ئەوا هەر وەکو چۆن باوک و باپیری ئێمە خوێنیان لە پێناوی کەرکوکدا رژا با خوێنی منیش لەو پێناوەدا بڕوا. داوا لە سەرکردایەتی کورد دەکەم ئەگەر کەرکوکیان نەدایەوە واز لە بەغدا بێنن بەغدا دەرمانی دەردی ئێمە نییە ئێمە دەبێ لەکەرکوک دابنیشین.

**کاروان نوری:**

کەرکوک هەر هی کورد بووە و هەر دەبێ بۆ کوردیش بێت من هەر ئەوەندە دەڵێم با حکومەتی بەغدای ئێستا سەیری سەدام بکەن ئەگەر ئەو وەکو چۆن باوک و باپیری سەدام بکەن ئەگەر ئەو ئەنفالی کرێدین و بە کیمیا لێی دابن بەڵام ئەوا روخا و کەرکوکییەکان مانەوەو ئەوەتا ئاوارەکان گەڕاونەتەوە بۆیە با ئەوانیش بزانن گەر مادەی ٥٨ جێبەجێ نەکەن ئەمجارە ئەوان لەسەدام خراپتریان لێ دێ و ئەم جارە کەرکوکیان لێ دەکەین بە گۆڕستان.

**جەپسە نادر:**

رۆڵە گیان من دوو کورم بۆ کەرکوک و کوردستان شەهید بووە، ئەمجارە ئەگەر کەرکوکمان لێ بسێنن ئەوا خۆم چەک هەڵدەگرم و منیش با بەقوربانی کەرکوک بم.

**ڕێباز مەحمود:**

ئەگەر مادەی ٥٨ جێبەجێ نەکرێ منیش وەک باوکم چەک هەڵدەگرم و چی تیایە لەپێناو کەرکوکدا با منیش وەک باوکم شەهید بم، چەند سەربەرزم کە پێم دەڵێن کوڕە شەهید باو ئەوکات بە منداڵەکانیش منیش بڵێن کوڕە شەهید، بەڵام ئەوەندە دەڵێم حەق نییە سەرکردەکانمان ئەوەندە نەرم بن و هەموو شتێکیان لێ قبوڵ بکەن، ئەوان با ئەوە بزانن ئێمە هەموو کورد لەپشتیانین و خۆمان بەکوشت دەدەین لەپێناو سەربەستی.

**ئەوین خان:**

من ئەگەر چی ئێستاقوتابیم بەڵام ئامادەم چەک هەڵبگرم و لەپێناو کەرکوکدا خوێنی خۆم بەخت بکەم، بەڵام ئەگەر ئێمەی کورد پێ لەسەر جێبەجێ کردنی مادەی ٥٨ دابگرین بێگومان ئەوانیش جێبەجێی دەکەن..

بۆیە داوا لە هەموو کورد دەکەم هیچ حیسابێک بۆ عەرەب نەکەن و پێیان بڵێن ئەگەر مادەی ٥٨ جێبەجێ نەکەن ئەوا ئێمە بە خوێن جێبەجێی دەکەین، ئەندامانی پارێزگای کەرکوکیش تا رادەیەک کەمتەرخەم بوونە بۆ جێبەجێکردنی ئەو ماددەیە و تا ئێستا شتێکی وایان نەکردووە.

**هەڤۆ ناسر:**

هەرچەندە منداڵم بەڵام هەروەکو چۆن لەکاتی هەڵبژاردنەکەدا وێنەی لیستی برایەتی و ئاڵای کوردستانم بە پاسکیلەکەمدا کردبوو بە ناو کۆڵان و بازارەکانی کەرکوکدا دەسووڕامەوە ئەم جارەیان بۆ جێبەجێکردنی ٥٨ کۆڵان و بازارەکانی کەرکوک بەخوێنی خۆم ئاو دەدەم. من خاڵێکم و میمکزایەکم شەهیدن.

**ڕەفیق فەتاح:**

با سەرکردەکانمان بزانن کێ دۆستیانە و کێ دوژمن، ئاوارەکانی کەرکوک نان نەبوو بیخۆن بەڵام ئەوانەی ئێستا لەبەردەم جێبەجێکردنی مادەی ٥٨ ڕێگرن و نایەڵن جێبەجێ بکرێت و باوەڕیان پێی نییە، لەلایەن حزبە کوردییەکانەوە پارەو خانوو سەیارەو هەموو شتێکیان وەردەگرت..

بۆیە دەڵێم حزبە کوردییەکان نەچووە بچێت ئەمجارە بەکەس بڕوا مەکەن چونکە تۆبەی گورگ مەرگە بۆ ئێمە هەموو ئەوانە سەدامن. گەر دەستیان بروات لە ئەو گۆڕبەگۆڕ خراپتر دەکەن.

**نازدار شەماڵ:**

باوکەکەم من دوو برام بە ژن و منداڵەکانیانەوە ئەنفالە و تا ئێستاش نازانم ماون یان مردون. مێردەکەشم شەهیدە خۆمن لەوان زیاتر نیم با منیش بمرم بەڵام سەرکردەکانمان باش نین تا ئێستا هیچ یارمەتییەکیان نەداوم ئەگەر ئەوان باش بن عەرەب و تورکمانیش نا توانێ وامان لێ بکات. ■■■

**ڕیپۆرتاژ: یوسف لەتیف ـ کاردۆ کەرکوکی**

# ئاوڕێک بەسەر ڕاپەڕینی جەماوەری ڕۆژهەڵاتی کوردستان

**تەیمور ئەلیاسی سەرزەلی ـ سویس**

دوا بە دوای شەهیدکردن و بێ حورمەتی کردن بە تەرمی ڕۆڵەیەکی کورد لە شاری مهاباد، لە ڕۆژانی١٩ی پووشپەڕ شەڕ و پێکدادان لە نێوان خەڵکی شارەکانی کوردستان و هێزەکانی داگیرکەر بەردەوامە. گومان لەوەدا نییە کە ڕژێمی کۆنەپەرستی ئاخوندی, پاش هاتنە سەرکاری توندڕەوێکی وەک ئەحمەدی نژاد، هەموو جۆرە توندوتیژی و سەرکوتکردنێک لە دژی گەلەکەمان بەکاربێنێ. دیارە ئەحمەدی نژاد لە سەرەتای هاتنە سەر دەسەڵاتی ئاخوندەکان تا ئێستا خەریکی سەرکوتکردنی ناڕازیانی کۆماری ئیسلامییە و، یەکێکە لە هاوبیرانی خاڵخاڵی گۆڕبەگۆڕ کە شامی شەوی بە خوێنی خەڵکی نێ تاوان و بێ دیفاعی کوردستان دەخواردەوە. "ئەحمەدی نژاد" کە لە گەلاڵە و تیرۆرکردنی سەرکردەکانی ئێمە نەخشی سەرەکی بینیوە و، ئێستاش بە فەرمانی وی بەکرێگیراو و جاش و هێزەکانی ڕژێم خەریکی سەرکوت و تۆقاندن و کوشتنی خەڵکی بەشەرەفی کوردستانن.

خۆشبەختانە، سەرەڕای تێپەڕبوونی ٢٥ ساڵ دەسەڵاتداری کۆنەپەرستە ڕەگەزپەرستەکان و بەرهەڵستکاری ڕژێمی شۆڤێنیەتی فارس، لە دژی گەلەکەمان بۆ گۆڕاندنی فەرهەنگ و زمانی کوردی و وشککردن و لە ریشەدەرهێنانی بیرۆکەی نەتەوایەتی، ئاکامێکی پێچەوانەی بۆ دەسەڵاتدارانی کۆنەپەرستی ئاخوندی لێ کەوتۆتەوە، ڕۆژ لە دوای ڕۆژ گەلەکەمان زیاتر و زیاتر سوورە لەسەر دابینکردنی مافی نەتەوایەتی کە ئەمەش چەندین هۆکاری ناوخۆیی و ناوچەیی و نێونەتەوەیی هەیە.

سەرەکیترین و یەکەمین هۆکار: ئەو ئاڵ و گۆرانەن کە لەو دیوی سنوور لە کوردستانی باشوور لە ئارادایە، کە بووەتە هۆی ئەو سەرهەڵدانانە و چ لە ڕووی سیاسی و چ لە ڕووی تێڕوانینەوە کارێکی وای کردووە کە بیری نەتەوە خوازی گەشەبکات و پەرەبستێنێ لەبەر ئەوەی هەر ئاڵ و گۆڕێک لە هەر پارچەیەکی کوردستان ڕووبدا ڕاستەوخۆ کاردەکاتە سەر باقی پارچەکانی تر.

خاڵی دووەم: دەستپێکردنی ڕاپەڕینێکی سەردەمی زانستی تەکنۆلۆجیایە، کە هەواڵەکان، لە چرکەیەک لە گۆشەیەکی دونیا بۆ ئەو گۆشەکەی تر لە ڕێگای سەتەلایت و ڕادیۆکانەوە دەگوێزرێنەوە.

خاڵی سێیەم، تێڕوانینی خەڵک لە چارەنووسی ڕەشی دیکتاتۆرەکانی سەردەمە، دیکتاتۆرێکی وەک سەدام، بەو هەموو دام و دەزگا داپڵۆسێنەرەی کە هەیبوو، لە پاش گۆڕ بە گۆڕ بوونی ڕژێمەکەی لە نێو کونە مشکێک دەریان هێنا، سەرانی تالیبان هەموو لە کونە تاریکەکان خۆیان حەشاردابوو، سەرۆکی پێشووی یۆگسلافیا چەندین ساڵە لە زیندانە و، چەندین بار ڕەوانەی دادگای لاهای کراوە.

خاڵی چوارەم: بە زاڵەهاتنی خەڵکی کوردستان لە ژێر دەستی زوڵم و زۆری نەتەوایەتی و ئابووری، کە لە یەکەمین هەنگاو خەڵکی بەشەرەفی کوردستانە، بە پێوانەیەکی بەرچاو بەشداریان لە هەڵبژاردنی سەرۆکایەتی ئێران نەکرد، ئیتر نەخەڵکی کوردستان و نە گەلانی ئێران تاقەتی ئەو ڕژێمەیان ماوە و نە لە نێو کۆمەڵگای دیموکراسی و مۆدێرنی ئەورۆ جێگایەک بۆ کۆنەپەرستی هەیە.

حیزبی دیموکراتی کوردستان و باقی هێزەکانی تر، دەبێ پشتی خەڵکی ڕاپەڕیوی کوردستان بگرن و کۆمیتەکانی حیزب دەبێ هەوڵی خۆیان بخەنە گەڕ بۆ ڕێپێوان و پشتیوانیکردنی خەڵک لە دەرەوەی وڵات و ناوخۆی کوردستان. پێویستیشە میدیا کوردییەکان لە باشووری کوردستان هەواڵەکان ڕاستەوخۆ بڵاوبکەنەوە و لە چوارچێوەی ڕاگەیاندراوە هەواڵدەریەکان، پشتیوانی خۆیان لە ڕاپەڕینەکانی ڕۆژهەڵاتی کوردستان ڕابگەیەنن. ■■■

# جووڵانەوەی مەدەنی کوردان لە مەترسی دایە

## بڵاوکۆی ژمارە ١٢ی ڕێکخراوی پاراستنی مافی مرۆڤی کوردستان



بۆ خەڵکی خاوەن شەرەفی ئێران

بۆ گەلی وشیاری کورد

هەر وەک ئاگادارن ، ڕووداوەکانی تۆند و تیژی ئەم ڕۆژانەی دوایی لە ناوچەی هەورگریان و باکووری کوردستانی ئێران کە بوو بە هۆی کۆژرانی ناقەنیک لە هاوشاریان و جەماوەری مەدەنی کورد ، لە ڕوانگەی ویژدانەکانی وشیارەوە جێگەی داخە .

خەڵکی ئەم ناوچانە لە ڕۆژان و حەفتەکانی ڕابوردوو دا ، بە کۆ بوونەوەکانی ناڕەزایی ، خۆازیاری کۆتایی هاتنی پێشێلکردنی ڕۆژانە و بێ هەژماری مافەکانی مرۆڤ و کۆتایی هێنان بە سەرکوتکاری تووند و تیژ و نامرۆڤانەی سەرهەڵدانەکانی خەڵک لە لایەن هێزەکانی ئینتیزامی و ئاسایش لەم ناوچەیە دا بوون. بەڵام دەربڕینی ناڕەزایی هێمنانەی ئەوان ، نەک بە شێوەیەکی مەدەنی و دێموکراتیک ، بەلکوو بە سەرکوت کردن و هێرشگەری وەڵام درایەوە لەم پێناوە دا تاقمی سەرکوتکار هەوڵ دەدات جووڵانەوەی ناڕەزایی، مەدەنی و ئاشتی خوازانەی خەڵک لە کوردستانی ئێران بە هێندێک جووڵانەوەی دەستکرد ، تۆند و تیژ ، نامەدەنی و هێرشگەرانە گرێ بدات تا بەم شێوەیە هەل و مەرج و بەهانەی پێویستی بۆ سەرکوت کردنی جووڵانەوەی تازە پێک هاتووی مەدەنی خەڵکی کوردستان وەدەست بهێنێت . ئەم شەرخوازانە لەم ڕۆژانەی دوایی دا لە ڕێگەی میدیاکانی گرووپی و هەواڵنێری و ژمارەیەک ڕۆژنامە و ماڵپەڕی ناوخۆیی ، پەرەیان بەم هەل و مەرجە ساختەچییانەیە داوە و لە پێناو چەواشە کردنی ڕای گشتی خەڵک لە نێو خۆ دا لە مەڕ ئەم شتانەی ڕوویان داوە ، ئێچگار بێ ئینسافانە هەڵس و کەوتیان کردووە..

ڕێکخراوی پاراستنی مافی مرۆڤی کوردستان، وێڕای ڕاگەیشتنی سەرنجی تەواوی خەڵکی ئێران و نەتەوەی کورد بۆ ڕاستی ڕووداوەکان و بوویەرەکانی دڵتەزێنی ئەم دواییە لە کوردستانی ئێران ، لە بابەت بەرهەم و ئامانجەکانی شەرخوازان وشیاری دەداتە هەر لایەک و خوازیاری ئاگادری هەر چی زووترەی خەڵکە لەم بوارەوە ، چوونکە سەرکردەکان پێداگرن لە سەر ئەوەی کە جووڵانەوەی مەدەنی گەلی کورد بۆ شەڕ و کێشەی چەکداری رابکێشن و بەم جۆرە دەرفەتی خێراتر بۆ سەرکوتکردنی ئەم جووڵانەوەیە وەدەست بێنن. لە سەر ئەم ئەساسە ، لە تەواوی پارت و ڕێکخراو و گرووپەکانی سیاسی کوردستان داوا دەکەین کە لەم قۆناغە هەستیارە دا ، لە هەر جۆرە کار و کردەوەیەکی کە بیێتە هۆی کەلک وەرگرتنی تاقمی شەرخواز لەم بوارە دا ، خۆیان بپارێزن

تاران: ٢٠جولای٢٠٠٥

**ڕێکخراوی پاراستنی مافی مرۆڤی کوردستان**

شماره تلفن دبیر: 0098 9125014785

http://www.rmmk.org

info@rmmk.org

تهران: صندوق پستي 188/13465

# پێکهاتنی کۆمیتەی هاوکاری هێز و کەسایەتییە سیاسییەکانی ڕۆژهەڵاتی کوردستان لە ئەڵمانیا

ڕۆژی ٢٠٠٥/٧/٢٤ لە شاری بۆن ـ ئاڵمان، بە مەبەستی هاوکاری هاوبەش لە نێوان هێز و کەسایەتییە سیاسییەکانی ڕۆژهەڵاتی کوردستان، کۆمیتەیەک بە ناوی "هاودەنگ"، پێکهاتنی خۆی ڕاگەیاند.

لە یەکەم بەیاننامەی "هاودەنگ"دا، دوای ئاماژەکردن بە هەل ومەرجی سیاسیی ناوچەکە هاتبوو:

" ئێمە کۆمیتەی کۆمەڵەی شۆڕشگێڕی زەحمەتکێشانی کوردستانی ئێران لە ئەڵمان، یەکێتی شۆڕشگێڕانی کوردستان لە ئەورووپا، کۆمیتەی حیزبی دیموکراتی کوردستانی ئێران لە ئاڵمان و بەشێک لە کەسایەتییە سیاسیی و نیشتمانپەروەرەکان لە ئاڵمان، پاش باس و ڕاوێژێکی زۆر هاتینە سەر ئەو بڕوایە کە پێویستە بۆ بەهێزکردنی بزووتنەوەی کۆمەڵانی خەڵک دژی ڕژێمی کۆماری ئیسلامی و هەروەها پشتیوانی و ڕێکخستنی بزووتنەوەی سیاسیی ـ ڕۆشنبیری ڕۆژهەڵاتی کوردستان چ لە ناوەوە و چ لە دەرەوەی وڵات، ڕیزەکانی خۆمان یەکخەین و لەسەر بنەمای سیاسی و یەکێتی کردەوە بۆ چەسپاندنی ئەو خاڵە هاوبەشانەی خوارەوە کە لە سەریان ساخ بوونەتەوە، هەوڵی هاوبەشی بدەین....

خاڵە هاوبەشەکان:

• کوردستان وڵاتێکی داگیرکراوە و نەتەوەی کورد نەتەوەیەکی بە زۆر دابەشکراوە و لە دامەزراندنی دەوڵەتی نەتەوەیی خۆی بێبەش کراوە. کورد مافی خایەتی کە لە باری سیاسی و جوگرافیاییەوە یەک بگرێتەوە و دەوڵەتی سەربەخۆی خۆی دامەزرێنێ.

• لە هەل و مەرجی ئێستادا، سیستەمی فیدرالی لەسەر بنەمای نەتەوەیی جوگرافی بۆ نەتەوەکانی ئێران و بەشداری دیموکراتیکی هەموان لە دەسەلاتی گشتیدا شیوەیەکی گونجاوە.

• خەباتی یەکگرتووی هەموو حیزب و ڕێکخراوە سیاسیی و کەسایەتییەکان لە ناوەوە و دەرەوەی وڵات بە پێی پرۆگرامێکی هاوبەشەوە، نە تەنیا گونجاوە بەڵکوو ئەرکێکی مێژوویی و نەتەوایەتییە.

• ئازادییە دیموکراتییەکان لە ئێران و داخوازییەکانی نەتەوەی کورد لە چوارچێوەی سیستمی کۆماری ئیسلامی ئێراندا، نایەتە دی، دامەزراندنی حکومەتێکی دیموکراتی فیدرال لە ئایندەی نەتەوەکەماندا چارەنووسسازە..."

لە بەشێکی دیکەی بەیاننامەکەدا هاتووە:

" ئێمە دەستی هاوکاری بۆ هەموو تێکۆشەرانی ڕۆژهەڵاتی کوردستان چ لە ناوەوە و چ لەدەرەوەی وڵات دێژ دەکەین و داواکارین بۆ دەوڵەمەندکردنی ئەم گەلاڵە پێشنیارییە، یارمەتیمان بدەن و بەشداری ئەو هەنگاوە بن."

هاودەنگ لە یەکەم کردەوەی سیاسی خۆیدا، بەشداری لە خۆنیشاندانەکانی ڕۆژی سێ شەممە ڕێکەوتی ٢٠٠٥/٧/٢٦ لە بەرانبەر دەفتەری "UN" لە شاری بۆنی کرد. ئەو خۆنیشاندانە بۆ پشتیوانیکردن لە ڕاپەڕینەکەی شارەکانی ڕۆژهەڵاتی کوردستان و مەحکوم کردنی کردەوەکانی ڕژیمی ئیسلامی ئێران بوو.

"هاودەنگ" هەروەها ماڵپەڕیکی ئینتەرنێتی لە ژێر ناونیشانی: www.hawdang.com ئاوا کردووە. ■■■

# Kurd û Şia: le diwa satda kê gol le kê dekat?!

*Nizar Caf*

Diwa derbirînekanî serokî Kurdistan sebaret be bangeşekirdinewey lîstî hawpeymaniyetî Kurdistan le perlemanî îraq, serincî çawdêranî nawçeke û cîhanî belayî xoyda rakêşa.
Kak Mesûd ke be yawerî kak Newşîrwan Mistefa diwabediway kobûneweyekî giringî herdû mektebî siyasî Partî Dîmokratî Kurdistan û Yekêtî Nîştimanî Kurdistan, qisey bo mîdiyakan dekird, ew rastiyeyî selmand ke core ciyawaziyekî zeq le boçûnekanî Kurd û Şîa da heye.
Hellbete serdanekey em diwayiyeî Donald Ramisfêld bo Bexda û kobûnewey legel bale Kurdiyekanda, be core fişarêkî siyasî na rastewxo bo ser Kurd danra.
Hendê nawendî siyasîş ew serdaneyan be serkewtinêkî katî bo lîstî îtilaf le qelemda, lêreşewe, dekrêt ew kobûnewey herdu mektebî siyasî bew arasteye lêk bidrêtewe ke çirkirdineweyekî pitirî boçûn û helwêstî Kurde lemer gorankariye siyasiye xêrakanî îraq û nawçeke û cîhan. Her lem rûwangeşewe, kak Newşîrwan Mistefa be raşkawane rûnî kirdewe ke Kurd le naw Îraq û hel û mercî rojhelatî nawerastda dejî û pêwîste hezar û yek hîsab bo weziî xo û dirawsê û dewrûpiştî bikat.
Le dûtoêy em qisaney kak Newşîrwanda, metirsî herdu hêzî siyasî serekî le pêşhatekan be ciwanî bedî dekrêt.
Le layekî dîkeûewe, ew reqiyeyî ke le derbirînekanî em diwayiyeî kak Mesûd Barzanîda berceste debû, be boçûnî jimareyekî zor le ravekaranî siyasî, bêzarî Kurd nîşan dedat le berengarîkirdin û seretayekî tazeş dest nîşan dekat bo destpêkî hêrişî siyasî Kurd berew nawendekanî biryar le paytextî Îraqda. Lêreşda nabêt ew cole siyasiyaney îbrahîm Caferî be arastey êran û turkiya û suriya be kem bigrîn û dîwe ûarawekanî nexwênînewe. Serbarî ewey ke Caferî le jêr fişarêkî tundî bale siyasiye ciyawazekanî êraqdaye û hewlî ewe dedat ke le tonêlî danûstan legel Kurda be serkewtûyî derbiçêt.
Caferî çak dezanêt ke Kurd le hemû katêkî tir zêtir çawî kirawetewe û zor sûre le ser daxwaziyekanî û hergîz be îareserkirdinî nîweçilî qayil nabêt. Cêyî amaje pêdane ke hêze siyasiyekanî Erebe şia û sinnekanîş, lem barudoxey êstada sergermî ewen be her şêweyek bêt, Kurd pelkêş bikrêt bo çareseriyekî katî ta dam û dezgakanî dewlet cêgîr û behêztir debin û ew kateş be wurdî bîr le hemû babete helpesêrawekan legel Kurda dekrêt, belam Kurd hemîşe bote qurbanî hawkêşeyekî seyr û serinc rakêş, ewîş her katêk dam û dezgakanî dewletî îraq behêz û seqamgîrbin, ewa Kurd xirawete jêr fişar û dawakariyekanî pişt giwê xirawin û le beramber eweşda, her katêk ew dam û dezgakane lawaz û bê hêz bin, ewa core nerm û niyaniyek ke leberamber daxwaziyekanî Kurda nîşan dirawe, emroş le katêkda ke êraq be hestiyartirîn qonaxî mêjûyî û siyasîda têdeperêt, hemû layene nawxoyî û derekiyekan û bigre ta nêw dewletiyekanîş çawyan birîwte Kurd û çend layenêk dexwazêt daxwaziyekanî Kurd be kospêk le berdem asodeyî û seqamgîrbûnî êraqda dabinêt. Her çende karî ew layenane niye ke awrêk le rabirdûyekî nizîk bidenewe û le hokarî em helwêste reqey Kurd bikolnewe, belko eme karî dîplomasiyete Kurde ke nawerokî ew helwêste tundey Kurd bo hemû cîhan rûn û şibikatewe. Şerî emroy Kurd, şerêkî siyasiye ke le birî gulle û çek sûd le karîgerî wuşe û hejmûnî midya le ser hizrî miroyî werbigîrêt. Legel eweşî ke serdanekey ramisfêld bo Bexda be core nexwêndineweyekî Kurd le qelem dira, belam le heman katîşda nakrêt be gorzêkî karîgerî dabinêyn ke arastey Kurd kirabêt, ewe tenha fişarêk bûwe le derencamî dije fişarêk, Kurdîş be yek helwêstî wutar û boçûnî detwanêt bibête nawendî rasteqîne û karay fişar bo ser nawendekanî biryar le waşington. Le rastîşda, ger komelêk axondî şia bitwanin be palpiştî aşkira û rûnî êran, emrîka milkeî biken core fişarêk le dijî Kurda bekar bihênît, ewa debêt le nehametî û negbetî gelî kurd bêt ke serkirdeyek şik nebat le beramber ew cole siyasye goman lêkirawaneda, kardaneweyekî pêwîst nîşan bidat û ew axondane le çiwarçêwey "mizgewt" û huseyniyekan î şia da qayim bikat. Lêreşda mayey geşbînî û bawer be xobûne katêk ke helwêstî bwêraney wek ew helwêstey kak Mesûd Barzanî ke beramber be daxwazî emrêkiyekan nîşanî da sebaret be retkirdnewey helkirdinî alayî êraq le ahengî serbexoyî emrîka ke niyazbû le hewlêr bigêrdirêt.
Em core helwêstane helwêst û tiwanay gelêk le xo degrn û katêkîş daxwazî gel û helwêstî siyasîda reng dedatewe, ewa giringî û bayexî ew helwêste karîgeriyekî ewtoy bo ser hemû layek debêt û ber le hemûşyan bo ser xodî waşîngton debêt.
Ew dengoyaneşî ke delên giwaye şia amadeye bo cêbecêkirdinî daxwaziyekanî kurd le beramber qayilbûnî Kurd be sîstemî fidralîzmî îslamî da xoy le xoyda retkirdineweyekî narastewxoy naweroki dawakariye neteweyiyekanî Kurde. Helbete hewalekan hemû bas lewe deken, ke araste siyasiyekan berew asteng deron, her lem bareşewe dikrot Munzir Elfezil rûnîkirdewe ke Kurd hergîz reûnûsî destûrêk pesend nakat ke derbirî û dabînkerî mafekanyan nebêt be pêy zemanatî destûrî nêw dewletî, herweha be heman araste dktor Fuad Masum raygeyand le haletêkda eger hatû serokî firakisyone siyasiyekan neyantiwanî babetî ciyawazekan çareser biken, ewa perleman û hikumetî êstay êraq heldeweşênewe, û geranewe bo sereta le helbijardinî hikumetêkî katî nwêda.. çawdêrekan pêyan waye ke çareserî em astengey êsta tenha le gorînî helwêstî serok firakisyonekanda berceste debêt, ewîş be kemkirdinewey astî dawakariyekanyan û em qiseş pitir arastey kurde dekrêt, gelî kurd cige le sûrbûn le ser daxwaziye serekiyekanî hîç rêgeyekî dîkey le berdemda niye û eger karîş geyşte nek helweşandinewey perleman û hikumetî êraq, belko dabiranîş le nawend, ewa karî nawede ke mamehemeyî bo kurd bikat!.

■■■

# راپەڕینی ڕۆژهەڵاتی کوردستان بەردەوامە و پەرەدەستێنێ!








**سلێمان ئەلیخانی** - وا بۆ مانگێک دەچێت گەلی کورد لە ڕۆژهەڵاتی کوردستاندا، ڕاپەڕیوە. کۆماری ئیسلامی ئێرانیش، ناخوازێت کۆتایی بە چەوسانەوە و کارە نامرۆڤانەکانی بهێنێت، بۆیە لەگەڵ هەڵهاتنی هەر ڕۆژێکی نوێدا، دەنگی ناڕەزایی لە شارەکانی ڕۆژهەڵاتی کوردستاندا زیاتر بەرز دەبێتەوە و خۆپیشاندان ساز دەکرێت.
لە ڕۆژی ٢٠٠٥/٧/٣٠دا، لە بەرانبەر نووسینگەی ئوستانداری شاری سنەدا، نزیکی ٥٠٠ کەس لە دانیشتوانی شاری سنە کۆبوونەوە، هێزەکانی ڕژێم هەوڵیان دا ئەم خەڵکە لە بینای ئوستاندار دوور بخەنەوە، بەڵام خەڵکەکە کەوتنە بەرزکردنەوەی دروشمی سیاسی و پشتیوانی خۆیان بۆ خەڵکی ڕاپەڕیوی شاری مەهاباد و شارەکانی تر ڕاگەیاند، پاشان چەند کەسێک لەو خۆپیشاندەرانە ڕێگەیان پی درا کە لەگەڵ ئوستاندار دابنیشن و داخوازییەکانیان بخەنە ڕوو، گرنگترین داخوازیشیان، ئازادکردنی زیندانییەکان بوو، هەروەها بە ئوستانداریشیان ڕاگەیاند کە ئەگەر بەپیر ئەم داخوازییانەوە نەیەت، ئەوا ئەوان بە ڕێگای جۆربەجۆر دریژە بە خۆپیشاندان و ناڕەزایی دەدەن، ڕۆژی دواتر ڕاپەڕینی خەڵکی سنە بەردەوام بوو، لە ئەنجامیشدا تێکهەڵچوون لە نێوان خەڵک و هێزەکانی ڕژێمی کۆماری ئیسلامیدا ڕووی دا، بە دەیان کەس ڕاپێچی بەندیخانە کران لەناو گیراوەکانیشدا" ڕوئیا تەلوعی، مادە ئەحمەدی، ئیجلال قەوامی، ئازاد زەمانی" کە هەموویان لە بەرگریکەرانی مافی مرۆڤ و کۆمەڵگەی مەدەنین، سەرەڕای بریندارببوونی چەندین کەسی سڤیل کە زۆربەیان لەناو ماڵەکانی خۆیاندا ماون و لە ترسی لێپێچینەوە ناتوانن بچنە نەخۆشخانە. لەو تێکهەڵچوونەشدا چەند سەربازێکیش بریندار بوون و چەند ئۆتۆمبێلێک سووتێنران.
لە شاری "بانە"ش دوای ئەوەی کە خەڵکی " سی دی" شەهیدکردنی "شوانە سەیدقادر"یان بینی کە چۆن و بە چ شێوەیەکی دڕندانە شەهیدکرابوو، لە ڕۆژی ٢٠٠٥/٧/٣٠دا هەزاران کەسیان ڕژانە سەر جادەو کۆڵانەکانی شار و بە گوتنەوەی سروودی نیشتمانی"ئەی ڕەقیب" و بەرزکردنەوەی ئالای پیرۆزی کوردستان، پشتیوانی خۆیان بۆ خەڵکی ڕاپەڕیوی شارەکانی دیکەی کوردستان دەربڕی، هەروەها تاوانەکانی کۆماری ئیسلامی ئێرانیشیان پرۆتستۆ کرد. لە ڕۆژ شوێندا تێکهەڵچوون لە نێوان خەڵکی خۆپیشاندەر و هێزەکانی کۆماری ئیسلامیدا ڕووی دا و چەند کەسێک لە هێزەکانی ڕژێم بریندار بوون و لە هاوڵاتیانی ڕاپەڕیویش ٤ کەس شەهید بوون و ١٠٠ کەسیش گیران، هاوکات لەگەڵ ئەم ڕووداوانە کۆماری ئیسلامی هێزەکانی خۆی بەسەر چیاکانی دەور وبەری شارەکانی کوردستاندا بڵاوکردەوە، هەر لەگەڵ ئەم ڕووداوانەدا، دانیشتوانی شاری دیواندەرە خۆپیشاندانیان دەستپێ کرد، لەوێش کۆمەڵێک بریندار بوون و هەندێکیش بەرەو زیندان ڕاپێچ کران.
لە ڕۆژی ٢٠٠٥/٨/٢ خەڵکی کوردپەروەری شاری مەریوان بۆ جاری چەندەمین دوکان و بازارەکانیان داخست و ناڕەزایی خۆیان نیشاندا، شەقام و کۆڵانەکانی شاریش جگە لە هێزەکانی ڕژێم کەسی دیکەی تێدا نەدەبینران لە هەمان کاتدا هەلیکۆپتەرەکانی ڕژێم بەردەوام بە ئاسمانی شارەکەدا دەسورانەوە.
لە ڕۆژی ٢٠٠٥/٨/٢دا بۆ پشتیوانیکردنی شارە ڕاپەڕیوەکانی کوردستان، خەڵکی ڕاپەڕیوی شاری سەقز، ڕژانە سەر جادە و لەگەڵ هێزەکانی کۆماری ئیسلامیدا بە گڕ یەکدا چوون و بە گوێرەی دواهەمین هەواڵ ١١ کەس شەهید بوون و سەدکەسیش بریندار بوون و زۆر لە بریندارەکانیش دیار نین کە بۆ چ جێگەیەک گواستراونەوە. لەم پێکدادانەدا ڕژێم لە فرۆکەی هەلیکۆپتەر و شەستیر کەڵکی وەرگرتووە، سەدان کەسیش زیندانی کراون، لە شەهیدەکانیش ناوی سێ کەسمان بەدەست گەیشتووە کە ئەمانەن" عەباس ڕەمەزان زادە، مامۆستا شەریعەتی کە مامۆستای قوتابخانەیە، عەباس کەلەیی"ە، هەروەها لە هەفتەی ڕابردوودا، لە ناوچەی "ناویخان"ی سەر بە شاری شنۆ، بۆ تۆڵە سەندنەوەی شەهیدبوونی "شوانە سەید قادر" گرووپێکی قارەمان لە بۆ لاپەڕەی ٥

PEYAMÎ
# kurd

Jimare 48 | Salli 1 | 05.08.2005

Rojnameyekî heftaney gistiye



Laparrey 2

# Raparînî Rojhelatî Kurdistan berdewame û peredestênê !




# Kurd û Şia:
# Le diwa satda kê gol le kê dekat ?!

Laparey 2

تەیمور نەلیاسی سەرزەنی

## ئاوڕێک بەسەر ڕاپەڕینی جەماوەری ڕۆژهەڵاتی کوردستان

لاپەڕەی ٣

## ئەگەرەکانی جێبەجێ نەکردنی مادەی ٥٨ لە دیدی نووسەرانی کەرکوکەوە

لاپەڕەی ٣

## لە کوشتنی کوڕەکەم پەشیمانم!

لاپەڕەی ٤

## ئەنفال

فیلمێکی دۆکۆمێنتاری لەسەر تاوانەکانی ڕژێمی بەعسی عێراق دژی گەلی کورد لە جەنگی بەناو ئەنفال

لاپەڕەی ٧

دیداری هەڵگەوت زاهیر لەگەڵ:

## هونەرمەند بەڵچیم بیلگن



لاپەڕەی ٧